



Kurdiyat



e-ISSN 2717-8315

Yıl/Sal/Year: 2021 Sayı/Hejmar/Issue: 3

e-Ağ/Web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat>



Kurdiyât



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Yayıncı/Weşanger/Publisher
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü
Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages
Sahibi/Xwedî/Owner
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına/
Li Ser Navê Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü yê/
On Behalf of Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages
Doç. Dr./Assoc. Prof. Abdulhadi TİMURTAŞ

Editör | Edîtor
Doç. Dr./Assoc. Prof. Abdulhadi TİMURTAŞ
(Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University)

Sayı Editörü | Edîtorê Hejmarê | Issue Editor
Dr. Zafer AÇAR
(Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey)

Kurdiyât - Yıl/Sal/Year: 2021 Sayı/Hejmar/Issue: 3

Lijneya Weşanê/Yayın Kurulu/Editorial Board

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Ayhan TEK	Muş Alparslan Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Hayrullah ACAR	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Haşim ÖZDAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Ramazan TURGUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Zafer AÇAR	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey

Lijneya Şêwrê/Danışma Kurulu/Advisory Board

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Ayhan TEK	Muş Alparslan Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Hayrullah ACAR	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Kemal KAYA	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Bingöl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Mardin Artuklu Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Kenan BULUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey
Dr. Öğr. Üyesi Ramazan TURGUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University/Türkiye/Turkey

Sekreteryâ/Secretary

Öğr. Gör./ Instructor. Hacı YILMAZ (Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi/University)

Dizgi/Rûpelsazî/Design

Erdal YILDIZ

İletişim/Têkilî/Contact Details

e-posta/e-Mail: kurdiyat@yyu.edu.tr / yde@yyu.edu.tr

e-Ağ/Web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/Kurdiyat>

Tel /Phone: 0432 225 14 52

Faks / Fax: 0432 225 12 28

Adres/Navnîşan/Address: Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü, 65080, Zeve Kampüsü, Tuşba/Van

Yayın Tarihi/Tarîxa Weşanê/Publication Date

Haziran/Hezîran/June 2021

“

Dergide yayımlanan makalelerin tüm sorumluluğu yazarlarına; yayın hakları ise Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü'ne aittir. Yayıncının izni olmadan kısmen veya tamamen herhangi bir şekilde basılamaz ve çoğaltılamaz. Dergi Yayın Kurulu gönderilen yazıları yayımlayıp yayımlamama konusunda serbesttir. Dergiye gönderilen makaleler iade edilmez. Yayın Kurulu ve editöryal ekip makalelerle ilgili herhangi bir yasal yükümlülük kabul etmez.

Berpirsiyariya meqaleyên ku di kovarê de têne weşandinê ya nivîskarên wan bi xwe ye. Mafê weşana gotaran jî aydê Enstîtuya Zimanên Zîndî ya Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê ye. Qîsmen yan jî bi tevahî, bêyî destûra weşanger tu gotar nayê çapkirin û zêdekirin. Lijneya Weşanê ya Kovarê di biryara xwe ya weşandin yan jî neweşandina gotarê de azad e. Gotarên ku ji bo kovarê hatine şandin bi şûn de cardî nayên îadekirin. Lijneya kovarê û Komîteya Edîtorî derbarê gotaran da mesûliyeta qanûnî qebûl nake.

All responsibility of the articles published in the journal belongs to the authors and the publication rights belong to the Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages. It may not be reproduced or reproduced in any form, in whole or in part, without the permission of the publisher. Editorial board of the Journal is free to publish and publish the articles. Articles submitted to the journal are not returned. Editorial board does not accept any legal liability for articles.

”

İçindekiler / Naverok / Contents

Editörlerden/Ji Edîtoran/From The Editors—————7

“LI GELİYÊ ÇATÊ TAV DIZIRIQÎ”: TOPOGENY Û NEXŞEYA DEVKÎ DI KILAMA ELÎ XARZA DE————11

“Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî”: ‘Elî Xarza’ Kîlamında Sözlü Harita ve Topogeny

“Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî”: Topogeny and Verbal Maps in the Kilam of ‘Elî Xarza’

Ömer DELİKAYA - M. Zahir ERTEKİN

UMUT VE YEİS ARASINDA BİR KİLİSE: UMUT VE YEİS ARASINDA BİR KİLİSE:

MOĞOLLAR (İLHANLILAR) DÖNEMİNDE (1258-1335) DOĞU (NESTURİ)

KİLİSESİ’NİN SERENCAMI—————27

Kenîseyek Di Navbera Hêvî Û Bedbînîyê Da: Di Serdema Moxolan (Îlhanîyan) Da (1258-1335) Serencama Kenîsa Rojhilatê (Nesturî)

A Church Between Hope And Despair: The Consequence Of The Church Of The East (Nestorian) During The Mongol (Ilkhanid) Period (1258-1335)

Yaşar KAPLAN

4

QESÎDEYA ŞÊX MIHEMED SELÎMÊ HEZANÎ—————41

Şêx Mihemed Selîmê Hezanî’in Kasidesi

The Eulogy Of Sheikh Mihemed Selîmê Hezanî

M. Zana KARAK

BİBLİYOGRAFYAYA TEZÊN MASTER Û DOKTORAYÊ YÊN BEŞÊN ZIMAN Û EDEBİYATA KURDÎ Û ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ (2012-2020)—————71

The Bibliography of Masters and Doctoral Theses in the Departments of Kurdish Language and Literature and Kurdish Language and Culture (2012-2020)

Kürt Dili ve Edebiyatı ile Kürt Dili ve Kültürü Bölümleri Yüksek Lisans ve Doktora Tezleri Bibliyografyası (2012-2020)

Ziyattin YILDIRIMÇAKAR - Sinan ÇAKAR - Şerif GÜZEL

BERAWIRDA ŞİRETÊN KU DI HELBESTÊN MELAYÊ CİZİRÎ Û

EHMEDÊ XANÎ DA DERBAS DIBIN—————101

Comparison of advice in the poems of Melayê Cizîrî and Ehmedê Xanî

Melayê Cizîrî ve Ehmedê Xanî’nin Şiirlerinde Geçen Öğütlerin Karşılaştırılması

Yasin DURAN

ARİSTOKRAT KÜRT AİLELER: ARVASİLER —————119

Aristocratic Kurdish Families: Arvasi

Malbatên Kurd yên Arîstokrat: Arwasî

İsmail KIRAN

MIJARA RU'YETA JINAN LI BIHIŞTÊ: MÎNAKA ÎBN TEYMIYE Û CELALEDÎNÊ SUYÛTÎ —————145

Cognisance Issue of Women's in Paradise: The Specific to Ibn Taymiyyah and Djalâl al-Dîn al-Suyûtî.

Cennette Kadınların Ru'yeti Meselesi: İbn-i Teymiyye ve Suyuti Örneği

Sevda Aktulga GÜRBÜZ

الکرد والمذهب الشافعي —————157

Kurd Û Mezhebê Şafî'î

The Kurds and the Shafii Sect

Abdulbari Aziz Othman

تاريخ ماردين الاجتماعي في سجل المحكمة الشرعية العثمانية المرقم ٢٣٨ لسنة ١٨٦٥م دراسة وتحليل —————173

Analizê li ser Dîroka Civakî ya Mêrdînê di Tomarên Dadgeha Osmanî ya Şer'î ya bi Dîroka 1865'a û bi Hejmarê 238'a

Review And Investigation Of Mardin Social History In The Ottoman Sheriat Court Registry In No. 238 And Date 1865

Majed Muhammad Younis

کردستان في المشاريع الإصلاحية العثمانية المبكرة(قانوننامه سلطاني لعزیز أفندي في القرن السابع عشر(نموذجاً —————201

Di Projeyên Reformên Destpêkê yên Osmanî de Kurdîstan (Mînaka Ezîz Efendî Qanûnnameya Sultanî ya Sedsala 17-an)

Kurdistan in the Early Ottoman Reform Projects Qanunnamah Sultani by Aziz Effendi in the Seventeenth Century as an Example

Nizar Eyyoub Hasan

Hekemên vê Hejmarê/ Bu Sayının Hakemleri/ Reviewers of The This Issue

Prof. Dr. Suvat PARİN	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Doç. Dr. Abdulcebbar KAVAK	Karabük Üniversitesi
Doç. Dr. Hayreddin KIZIL (2)	Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN (2)	Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Metin YILDIZ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. Rahmi TEKİN	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Ahmet KIRKAN	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY	Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD	Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Hüseyin ALİ (2)	Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Ramazan TURGUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Shawish MURAD	Hakkari Üniversitesi
Dr. Kenan Subaşı	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Mehmet Şirin FİLİZ (2)	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Yakup AYKAÇ (2)	Mardin Artuklu Üniversitesi
Öğr. Gör. Şerif GÜZEL	Bingöl Üniversitesi
İbrahim TARDUŞ	Mardin Artuklu Üniversitesi

Merheba Kurdiyat

Kurdiyat bi jimara xwe ya sêyem bi sê zimanan û deh meqaleyan silav li xwendar û lêkolîneran dike.

Di vê hejmarê da li ser mijarên cûredar ji sehayên ciyawaz deh meqale têne pêşkêşkirin ku ji van meqaleyan pênc heb kurdî, sê meqale bi erebî û du meqale jî bi tirkî hatine nivîsandin.

Meqaleya yekem ya kovarê ji aliyê M. Zahir Ertekin û Ömer Delikaya ve hatîye amadekirin ku ew li dor navê cihan behsa Topojenî û Nexşeya Devkî di Kilama Eliyê Xarza de dikan.

Yaşar Kaplan ku meqaleya duyem ya hejmarê ya wî ye, cih daye mijareke dîrokî ku tê de behsa serhatiya Dêra Rojhilat ya serdema Mongoliyan (Îlhani) (1258-1335) dike.

Di meqaleya sêyem de, M. Zana Karak şairekî kurdan yê ji Edebiyata Klasîk û qesîdeyêke wî bi me dide nasîn ku heta niha xebat li ser vê qesîdeyê çênebibûn. Bi vê meqaleyê em nûnerekî edebiyata xwe ya dewlemend û şîreke wî ya qîmetberz nas dikan.

Hersê lêkolîner Ziyattin Yıldırımçakar, Sinan Çakar û Şerîf Güzel bîbliyografyayeke tezên mastir û doktorayê yên beşên kurdî yên di navbera salên 2012 û 2020an amade kirine ku bi vê meqaleyê xizmeteke baş kirine ji bo lêkolîneran ku wan li gorî mijar û sehayên wan ew tez tesnîf û rêz kirine.

Di rêza pêncan de meqaleya Yasin Duran şîretên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî berawird dike ku bi vê em hem agahiyan di derbarê şîretnameyan de werdigirin hem jî em mijara şîretan û girîngiya wan ji bo xwendaran fêm dikan.

Meqaleya şeşemîn aîdî İsmail Kıran e ku ew jî malbateke girîng ya kurdan “Arwasiyan” bi me dide nasandin, dîrok û serhatiya malbatê û tesîra wan ya li Tirkiyeyê bi nêrîneke civaknasî lédikole.

Meqaleya heftem mijareke sehaya îlahiyatê vedigire. Ev mijar behsa Rûyetê dike ka gelo di cînetê de mijara Rûyetê têkilî jinan ew ê bi çi şeweyî be, bi nimûneyên ji İbnî Teymiye û Suyûtî nivîskar Sevda Aktulga Gürbüz lêkolîna xwe pêşkêş dike. Em hêvî dikan ku di hemû biwarên zanistê de lêkolînen kurdî bêne kirin û ew têkevin nava lîteratura kurdî ya zanistî bi taybetî nêrînen zanyarên kurd.

Di meqaleya heştêmîn de em lêkolînekê li ser kurdan û mezhebê wan Şafîtiyê dibînin ku Abdulbari Aziz Othman li dor van pirsan digere: “Çima ji mezhebên fiqhî yên Sunnî mezhebê Şafîî di nav Kurdan de pirtir belav bûye, rola Kurdan di belavbûna vî mezhebî çî ye, her wiha çima Kurd ji bilî mezhebên din bi piranî ketine vî mezhebî?”

Meqaleya nehem ya Majid Younis e ku ew di sicîleke Dadgeha Şerîî ya Osmanî de jiyana dîrokî û civakî ya Mêrdînê lédikole û ji me re pêşkêş dike.

Di meqaleya dawî ya dehemîn ya Kovarê de jî li ser nimûneya Qanûnnameya Siltanî ya Ezîz Efendî ya sedsala 17em Nizar Hasan behsa rewşa Kurdistanê dike di projeyên îslahetê de.

Wekî ji mijarên meqaleyan jî diyar dibe ji sehayên ziman, edebiyat, sosyoloji, îlahiyat û dîrokê meqaleyên ciyawaz, bi sê zimanan di hejmara sêyem ya Kovara Kurdiyatê de cih girtine. Hêvî heye di jimarên bê de hem jimarên nivîsan hem jî seha û mijarên ji wan sehayên zêdetir û dewlementtir bin.

Heta jimara çaran di nava xweşî û geşiyê de bin...

Dr. Zafer AÇAR
Edîtorê Jimarê

Merhaba Kurdiyat

Kurdiyat, üç dil ve on makaleden oluşan üçüncü sayısıyla siz okuyucu ve araştırmacıları selamlamaktadır.

Bu sayıda değişik konu ve farklı alanlarda hazırlanan on makale bulunmaktadır. Bu makalelerden beşi Kürtçe, üçü Arapça, iki tanesi de Türkçe dilinde yazılmıştır.

Sayının birinci makalesi, M. Zahir Ertekin ile Ömer Delikaya tarafından hazırlanmıştır. Makalede, Eliyê Xarza'nın Türküsü bağlamında yer isimleri ve bunun sözlü haritası konusu ele alınmıştır.

Sayının ikinci makalesi, Yaşar Kaplan tarafından hazırlanmıştır. Bu çalışmada Moğollar dönemi Süryani Doğu Kilisesinin tarihi (1258-1335) seyrinden bahsedilmiştir.

Üçüncü makale M. Zana Karak'a aittir. Karak, Klasik Kürt Edebiyattan -daha önce incelenmeyen- bir şairi ve onun bir kasidesini bizlere tanıtmaktadır. Bu makale sayesinde zengin edebiyatımızın bir temsilcisini ve değerli bir şairi tanıma fırsatını elde etmekteyiz.

Araştırmacı Ziyattin Yıldırımçakar, Sinan Çakar ve Şerif Güzel'in yaptıkları ortak bir çalışmada, Kürt Dili ve Edebiyatı/Kültürü alanında 2012-2020 yılları arasında hazırlanan yüksek lisans ve doktora çalışmaları üzerine bir bibliyografya hazırlamışlardır. Araştırmacıların istifade etmesi için hazırlanan bu çalışmada, tezler konu ve alanlarına göre tasnif edilmiştir.

Beşinci sıradaki makale, Yasin Duran'a aittir. İlgili çalışmada Melayê Cizirî ile Ehmedê Xanî'nin verdikleri öğütler karşılaştırmalı olarak ele alınmıştır. Bu çalışma sayesinde okuyucular olarak öğütlerin kaynakları hakkında bilgi edindiğimiz gibi öğütlerin konusu ve önemini de kavramış olmaktadır.

Altıncı makale, İsmail Kıran tarafından hazırlanmıştır. Büyük bir Kürt ailesi olan "Arvasiler"i bizlere tanıtan bu çalışmada, ailenin tarihi ve Türkiye toplumuna olan etkileri sosyolojik bir bakış açısıyla incelenmiştir.

Yedinci makalede, ilahiyat alanına dair bir konu ele alınmaktadır. Ru'yetü'l-Lah'ın konu edildiği bu çalışmada Sevda Aktulga Gürbüz tarafından hazırlanmıştır. Çalışmada İbn Teymiyye ile Suyûtî görüşleri çerçevesinde kadınların cennette Allah'ı görmelerinin nasıl olacağı konusu incelenmiştir. Bütün bilimsel alanlarda özellikle de Kürt âlimlerinin görüşlerine dair Kürtçe araştırmaların yapıp Kürtçe literatüre kazandırılmasını ümit etmekteyiz.

Sekizinci makale, Kürtler ve Kürtlerle özdeşleşen Şafii mezhebine dairdir. Abdulbari Aziz Othman tarafından hazırlanan bu çalışmada şu sorulara cevaplar aranmaktadır: "Uygulamaya dair sunni mezheplerden neden Şafii mezhebi Kürtler arasında yayılmıştır, bu mezhebin yayılmasında Kürtlerin rolü nedir, Kürtler neden diğer mezheplere değil de ağırlıklı olarak Şafii mezhebini benimsemişlerdir?"

Dokuzuncu makale, Majid Younis'a aittir. Yazar çalışmada, Osmanlı Şer'î Mahkeme sicillerinden hareketle dönemin Mardin'deki sosyal yaşamını bizlere sunmaktadır.

Bu sayının son makalesinde Nizar Hasan, 17. yüzyılda Aziz Efendi'nin Sultan Kanunnamesi örneğini esas alarak ıslahat projesi çerçevesinde Kürdistan'ın durumunu ele almıştır.

Makalelerin konularında da görüldüğü üzere Kurdiyat Dergisinin üçüncü sayısında üç dile olmak üzere dil, edebiyat, sosyoloji, ilahiyat ve tarih alanlarından değişik makaleler yer almaktadır. Daha sonraki sayılarda hem makale sayısı hem de konu ve alan bakımından daha fazla ve daha zengin çalışmaların gelmesini ümit etmekteyiz.

Dördüncü sayıya kadar sıhhat ve esenlik içinde olunuz...

Dr. Zafer AÇAR
Sayı Editörü

Hello Kurdiyat

Here again the Kurdiyat is greeting you readers and researchers with ten articles in three different languages.

Of these articles which are on different areas and topics, five ones are in kurdish while other three are in arabic and two have been written in turkish.

The first article is by M. Zahir Ertekin and Ömer Delikaya that is about the places in the ballad named Eliyê Xerza.

Yaşar Kaplan who has written the second article is mentioning about a historical subject which is related to Eastern Church during Mongolian times (1258-1335).

In the third article, a classic kurdish poet who is unknown has been researched by M. Zana Karak. Karak has studied about one of that poet's qasidas.

Three searchers named Ziyattin Yıldırımçakar, Sinan Çakar and Şerif Güzel have prepared a detailed and classified bibliography about kurdish master and doctorate theses which presented between 2012 û 2020 years.

The fifth article is by Yasin Duran. It is about Melayê Cizîrî and Ehmedê Xanî's advices in a way of comparative.

İsmail Karan has written the sixth journal which is about a crucial family among kurds named Arwasians. The article is discussing this family in the view of sociologist after introduction.

The seventh journal is connected with theology area. Rûyet is its topic which is about the relation to women in heaven. This work is by Sevda Aktulga Gürbüz who is presenting samples about this matter from İbnî Teymiye û Suyûtî. We think it is a great pleasure to see such different works in kurdish in a scientific way by kurd wises.

In the eighth article which is by Abdulbari Aziz Othman, we are coming into a search about kurds and their cult shafii. The article is replying why that cult is common among kurds and what the kurds's roll is about its distributing.

The ninth article is by Majid Younis in which he is searching Mardin's historical and social cases in a register of Ottoman Law Court.

The final article is about Kurdistan case in a code of law of Sultani whis has written by Eziz Efendî in 17th century. This article is by Nizar Hasan.

As you see, the journal articles are about different areas and matters such as literature, theology, sociology, history and other topics. We hope the number of articles will be more in coming volumes of Kurdiyat.

Have enjoyable readings.

Dr. Zafer AÇAR
Editor of the Volume



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2021
Sayı/Hejmar/Issue: 3
e-ISSN 2717-8315
Rûpel/Sayfa Page: 11-25



Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article

Dema Hatînê/Makale Geliş Tarihi/Received:
02.06.2021

Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/:
12.06.2021

Ömer Delikaya. MEB, Xwendekarê Doktorayê,
Ziman û Edebiyata Kurdî, Zanîngeha Bîngolê,
omerdelikayaa@gmail.com.
Orcid: 0000-0001-6505-5107

M. Zahir Ertekin. Doç. Dr., Zanîngeha Bîngolê,
Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, zahirertekin@
hotmail.com
Orcid: 0000-0003-3519-9892

Atf/Citation: Delikaya Ö, Ertekin, M. Z. (2021).
“Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî: Topogeny û Nexşeya
Devkî di Kilama Elî Xarza de”, Kurdiyât, 3, 11-25.

“LI GELİYÊ ÇATÊ TAV DIZIRIQÎ”: TOPOGENY Û NEXŞEYA DEVKÎ DI KILAMA ELÎ XARZA DE

Ömer DELİKAYA - M. Zahir ERTEKİN

Kurte

Navê cihan, bi wateyên xwe yê sosyo-çandî û sembolîk ve, bi fonksiyona xwe ya bîranîna raborî û veguhastina çanda devkî ve parçeyekî bi qîmetê mîrasa çandî ne. Nav tenê bi taybetmendiyên xwe yê dewlemend ên bîbîxistinê ve di jiyana rojane de ji bo merivan bi rola xwe ya civakî ranabin, herwiha ew di dewamdariya nasnameya çandî de jî roleke giring digêrin.

Têgeha ‘topogeny’yê ku ji aliyê James Fox ve hatiye dariştin, ji bo wan cure vegêranan tê bikaranîn ku bi rengekî seredorî navê cihan tê de rêz dibin û vegêranên wihareng di hin kilamên kurdî de jî tên dîtin. Ev vegêranên topojenîk ku di çanda devkî ya kurdî de tên dîtin, zanînen çandî û dîrokî destedewrî nifşên nû dikin û wan li ser erdê dineqîşînin. Di vê çarçoveyê de, ev xebat ku cextê dibe ser vegêranên dîrokî û topojenîk ên ku bi rêya navan li ser erdê tên kodkirin û wekî nimûne kilama dirêj a bi navê “Elî Xarza” dinirxîne. Ev kilam li ser qewimîneke dawîya sed-sala 19an hatiye gotin ku tê de Hemze Beg (xal) lê dixebite Elî (xwarzî) ji destê eskeran xelas bike ku wê demê mehkûm/girtî bûye. Rev û rêwitiya di kilamê de ya ku ji Makûyê heta Erziromê bi awayekî seredorî tê vegêrandin û strandina navê gund, bajar, çem û zozanan pêk tê, nimûneyeke wê diyardeyê pêk tîne ku Fox wekî “topogeny”yê bi nav kiriye.

Peyvên Serekî: Topogeny, Toponîm, Navê Cihan, Dengbêj, Kilam, Kurdî, Nexşeyên Devkî

* Ev nivîsar xwe dispêre beşeke teza doktorayê ya Ömer Delikaya ku wekî “Venavandina Cihûwaran li Komara Tirkiyeyê: Mînaka Agiriyê” hatiye amadekirin.

“Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî”: ‘Elî Xarza’ Kılıamında Sözlü Harita ve Topogeny

Özet

Yer isimleri; sahip oldukları sosyo-kültürel ve sembolik anlamları, geçmişi hatırlatma ve sözlü kültürü taşıma işlevi ile kültürel mirasın değerli bir parçasıdır. İsimler, insanlar için günlük hayatta sadece zengin çağrışımsal özellikleriyle sosyal rollerini sürdürmekle kalmaz; aynı zamanda kültürel kimliğin devam etmesinde de önemli bir rol oynar.

Kürt sözlü anlatılarında, özellikle de *kılam*larda yeradları önemli bir yere sahiptir. Kürtçe kılıamlarda yeradlarıyla oluşan sözlü haritalar ve anlatı biçimleri yer almaktadır. Bu çalışmanın amacı Kürt sözlü kültüründe yeradlarının üstlendikleri rol ve fonksiyonları ortaya çıkarmaktır. Yeradlarının hikayenin mekansal akışına göre ard arda dizilmesi ile oluşan, James Fox’un *topogeny* olarak adlandırdığı icra biçimi bazı Kürtçe *kılam*larda da görülmektedir. Kürt sözlü anlatılarında ortaya çıkan bu topojenik anlatı formları kültürel ve tarihsel öneme sahip bilginin aktarılması ve mekana kodlanması işlevi görür. İsimler yoluyla mekâna işlenen tarihsel ve topojenik anlatıların önemine vurgu yapan bu çalışma, 19. yüzyılın sonlarında cereyan eden Elî adlı mahkumun kaçırılmasını konu edinen “Elî Xarza” (Yeğen Ali) adlı uzun *kılamı* incelemektedir. Kılıamda İran’ın Makü kentinden Erzurum’a kadar uzanan yolculuğun sırayla dizilen köy, kasaba, nehir ve yayla adlarıyla anlatıma katkı sunması Fox’un Avustralya dillerinde yer alan bazı anlatı formları için oluşturduğu *topogeny* kavramıyla açıklanmaktadır.

Anahtar Sözcükler: Topogeny, Toponim, Yeradi, Dengbêj, Kılıam, Kürtçe, Sözlü Harita

“Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî”: Topogeny and Verbal Maps in the Kilam of ‘Elî Xarza’

Abstract

Place names are a valuable part of cultural heritage with their sociocultural and symbolic meanings, the function of reminding the past, and carrying oral culture. Names not only maintain their social roles for people in daily life with their rich associative features, but also play an important role in the maintenance of cultural identity.

Place names have a significant place in Kurdish oral narratives, especially in *kilams* (a kind of Kurdish folkloric song). Kurdish *kilams* involve ‘oral maps’ and narrative forms created by place names. This study aims to reveal the roles and functions of the place names in the Kurdish oral culture. ‘Topogeny’, the term coined by James Fox to refer an ordered succession of place names in regard to spatial flow of the story, is seen in some Kurdish kilams. Topogenic narrative forms emerged in Kurdish oral narrations function as transmitting the knowledge that has cultural and historical importance, and encoding that knowledge on the space. This study, which emphasizes on the importance of historical and topogenic narrations treated through the names, examines the long *kilam* «Eli Xarza» (Eli the Nephew, include 160 place names) whose topic is on the breaking out of prisoner Eli in the later 19th century. The travel from Maku city of Iran to Erzurum through which the names of the villages, towns, rivers and highlands are sung and narrated in an ordered sequence is an example of what Fox has named a ‘topogeny’.

Keywords: Topogeny, Toponyms, Place names, Dengbêj, Kilam, Kurdish, Oral Map

Destpêk

Navê cihan an jî toponîm¹ xwedî gelek wateyên sosyo-çandî û sembolîk in. Ew li milekî wekî mîrîsa çandî ya merivan bi taybetmendiyên xwe yê bibîrxistinê ve di jiyana rojane de rola xwe ya civakî digêrin, li milekî din erka dewamdariya nasnameya çandî digirin ser xwe. Cihênav derheqê şûn û şopa dîrokî ya paşxaneyê cihêkî û gelên wir ên xwecih de dikare agahiyên bikêr pêşkêş bike ji ber ku ew ji aliyê zanyariyên çandî yê li ser cografya, dîrok, danûstandin û nîrxên çandî ve dewlemend e. Ji ber girêdana wan a necudabar a bi hin pêgehên diyar heye, navê cihan dikarin gelek bibîrxistinên zihnî û hestî binin bîra meriv; bibîrxistinên dem û mekan, ên dîrok û qewimînan ên meriv û çalakiyên civatî ên takekesî û merhaleyên di jiyana kesekî de.² Cihênav an jî toponîm ji ber van taybetmendiyên xwe yê neteweyî û nasnameyî ji aliyê desthilatê ve dibe armanc û rastî destwerdanê tê. Herwiha nav û binavkirin di destê desthilatê de dibe ew amraza ku pê dawaya xwedîtiyê (*claiming ownership*) tê kirin.³ Bi qewlê Michel de Certeau “her desthilat toponîmîk e û lê dixebite bi binavkirinê ve pergala xwe ya cih ava bike”⁴

Rast e cihênav hem ji bo civakê giring e hem jî ji ber wateyên xwe yê nasnameyî, neteweyî û civakî bala desthilatê dikişîne ser xwe û car caran rastî guhertinan tê. Ji bilî van, cihênav ji bo vegêranên devkî (*oral narration*) jî rola xwe ya estetîk, stîlistîk û sembolîk digêre. Ew bi tecrîbe, cihanbînî û feraseta gel re çêdibin û bi demê re dibin xwedî çîrok û serhatî. Bi taybetî pabendî û têkiliya ku folklorê kurdî bi cografya û navên cografîk re çêkiriye, dikare bi nêrîneke mekanî, navnasî, civatî, etno-ekolojîk ve bê ron û eşkerekirin. Çawa ku tê zanîn bi deng û kilamên xwe ve dengbêjan, bi sedan salan tevkarîyeke mezin li çanda kurdî kirine û guhê xwe dane ber hemû qewamên ku bo civata wan girîng in û bîra raboriyê veguhastine dema me ya îroyîn. Ji ber ku dengbêj tim li ser rê û dirban e û cografya û toponîmên herêma xwe ya lokal hîn dibe. Ew ne tenê zanîneke toponîmîk a xurt bi dest dixê, di heman demê de vê zanîna xwe tev li vegêranên xwe yê hunerî dike û wan (ve)digerîne. Ji ber hindê, gelek kilamên kurdî ji aliyê toponîman ve dewlemend in û hin taybetmendiyên xweser nîşan didin ku hêjayî lêhûrbûnê ne. Li dor çarçoveya li jor diyarkirî ya li ser giringiya nava, ev xebat dixwaze hin form û wateyên navê cihan di nav kilamên dengbêjan de destnîşan bike û nîrxê wan ên ji bo çanda devkî ya kurdî raxe ber çavan. Bi vê armancê, ev xebat li ser kilama bi navê “Elî Xarza” hûr dibe û di vê kilamê de nexşeyên devkî û “topogeny”yê vedikole. Şaxa kilamê ya ku di vê xebatê de tê nîrxandin ji aliyê Nihat Gültekin ve hatiye berhevkirin.⁵

1. Navê Cihan û Nîrxê Wan ji bo Zanîna Gelêrî

Xebatên li ser navê cihan (toponîm) li gelek welatên cihanê bi pêş ketine. Navê cih û erdan

- 1 Toponîm an jî navê cihan, bi îngilîzî *placename / toponym*, bi tirkî wekî *yeradı / toponim* tê bikaranîn ku meriv bi kurdî dikare wekî “cihênav” jî bi nav bike. Toponîm wekî çemkekê ji peyvên yewnanî *tópos* (cih) û *ónoma* (nav) pêk tê. Wekî ku ji wateya peyvê ve jî dertê holê navên cihan babeta serekî ya toponîmiyê ye. Toponîmî an jî cihênavnasî, zanista navên cihan e ku bi îngilîzî wekî *toponymy* an jî *toponomastics*, bi tirkî wekî *yeradbilim* tê zanîn. Ew binbeşeke onomastîkê ye ku bi giştî hemû navên cihan (toponîm) vedikole. Onomastîk jî binbeşeke zimannasiyê ye ku tê de hemû cure serênava (*proper names*) û toponîm –serênava ku têkildarî erdê ne – tên vekolîn.
- 2 Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996), 76.
- 3 Lawrence D. Berg - Robin A. Kearns. “Naming as norming: “Race”, gender and the identity politics of naming places in Aotearoa/New Zealand”, ed. Lawrence D. Berg -Jani Vuolteenaho *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming* (Aldershot: Ashgate, 2009), 19; Keith Basso, “‘Speaking with Names’: Language and Landscape among the Western Apache”, *Cultural Anthropology* 3/2 (1988), 99–130.
- 4 Michel de Certeau. *The Practice of Everyday Life*. trans. Steven Rendall, (Berkeley: University of California Press, 1984), 130.
- 5 Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan* (Stenbol: Avesta, 2013), 215-226.

heta niha hem ji aliyê nîrxê xwe yê etnografîk ve hatine vekolîn hem jî cihê wan ê di nav nerîta devkî de hatine hilsengandin.⁶ Herwiha, bi rengêkî dîrokî xebatên etnografîk ên ku wekî parçeyê-ke çanda civatî bala xwe didin ser navan, vedigere heta destpêka sedsala 20an. Xebatên ewil ên di vê qadê de ji aliyê Franz Boas ve hatine kirin ku ew wekî "bavê antropolojiya Amerîkayê" bi nav û deng bûye.⁷ Boas piştî ku li ser navê cihan ên di nav xwecihên Amerîkayê de xebatên xwe yên ewil⁸ dike kartêkeriyê mezîna çêdike li ser peyrevên xwe ku qismek ji wan xwendekarên wî bûn. Yek ji wan kesên herî giring ê hevçerx Keith Basso ye⁹ ku balê dikişîne ser rehendê etnografîk û antropolojîk ê navan. Basso bi gelek xebatên xwe¹⁰ yê li ser têkiliya navên cihan û çanda xwecihan, vekolînên sehayî meşandine û rehendê çandî yê navan di nav xwecihên Amerîkayê de nîşan daye. Dîsan, pey Basso re eleqeyê berçav di nav zimannasên antropolog de, bi taybetî di nav xwendekarên wî de belav bûye. Bi taybetî cihetên sembolîk ên navê cihan, rola navan di veguhastina çand û baweriyê de, fêrkirina rabûn-rûniştinên li gorî exlaqê û hin adetên gelêrî yê bi vî warî re têkildar hatine vekolîn. Keith Basso di kitaba xwe de ya bi navê *Wisdom Sits in Places* [Ferasetê li Erdê Hêwir Daniye]¹¹ qedera sî salî di nav xwecihên amerîkî –apaçî– de li ser nexşekirina navê cihan dixebite û ji gelek cihetan ve di wê lêgerînê de ye bê ka navê cihan bi çi rengî di nav wî gelî de hatine saz kirin û binyada zimanê wan çendî bandora xwe heye li ser beşkeririna wan a ji erdê. Piştî van xebatên navbirî yê pêşeng, ev qad bi beşdariya gelek xebat û vekolînên din, bi pêş ketiyê û lîteratureke xurt li ser vê qadê ava bûye. Li ser navê cihan ango toponîman û li ser têgihiştina merivan ji erdê bi rêya navan, gelek xebat li vê qadê zêde bûne di nav gelên cuda de.¹² Ev xebat destnîşan dikin bê ka fêmarî û têgihiştina li ser navan ji bo her gelekî bi çi rengî diguhere û vegêranên devkî çawa têkilî û pabendiyê bi erdê re saz dikin. Lewma, pêdivî pê heye cihên nav di nav xebatên vê qadê de bi rengêkî pir-rehendî bê vekolandin. Gelek xebatên vê qadê bi rengêkî eşkere nîşan didin ku kom û cewawerê diqewime ku li ser erdê xwe û bi navê wî erdî re wateyê xweser ava bikin. Di vê pêwendê de, Basso radigihîne ku navê cihan di ferhenga hemû zimanên nasyar de, birîtî ye ji milkên wateyî (*semantic domain*) ên cuda û taybetmendiyên fermî yê sîstema navê cihan bi tevî girêdanên mekanî û etîmolojiyên dema borî, ji mêt ve bûye babeta lêgerînên antropolojîk. Lêbelê li gorî wî, çalakiya gişgir a cihnavandinê

6 W. F. Nicolaisen, gelek xebat kiriye li ser navan û wateyên wan. Wî bi taybetî rol û fonksiyona navan vekole di vegêranên devkî û nivîskî. Ji bo xebatên wî, bin. W. F. H. Nicolaisen, "Field-work in place-name research", *Studia Hibernica* 1 (1961), 74–88; W. F. H. Nicolaisen, "Place-names in traditional ballads", *Folklore* 84 (1973), 299–312; W. F. H. Nicolaisen, "Names as Verbal Icons", *Names* 22/3 (1974), 104–110.

7 Ji bo rol û pêşengiya wî di xebatên li ser navan de, bin. Thomas Thornton, "Anthropological Studies of Native American Place Naming", *American Indian Quarterly* 21/2 (1997), 209–228.

8 Franz Boas, *Geographical names of the Kwakiutl Indians* (New York: Columbia University Press, 1934).

9 Thomas Thornton, "Anthropological Studies of Native American Place Naming", 209.

10 Keith Basso, "Speaking with Names": Language and Landscape among the Western Apache", *Cultural Anthropology* 3/2 (1988), 99–130; Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996).

11 Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996).

12 Bo nimûne, bin. Keith Basso, "Speaking with Names": Language and Landscape among the Western Apache", *Cultural Anthropology* 3/2 (1988), 99–130; Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996); Julie Cruikshank, "Getting the Words Right: Perspectives on Naming and Places in Athapaskan Oral History", *Arctic Anthropology* 27/1 (1990a), 52–65; Julie Cruikshank, *Life lived like a story: Life stories of three Yukon native elders* (Vancouver: University of British Columbia Press, 1990b); Thomas Thornton, "Anthropological Studies of Native American Place Naming", *American Indian Quarterly* 21/2 (1997), 209–228; Thomas Thornton, *Being and place among the Tlingit* (Seattle: University of Washington Press, 2008); Eugene Hunn, "Columbia Plateau Indian Place Names: What Can They Teach Us?" *Journal of Linguistic Anthropology* 6/1 (1996), 3–26; James Kari - James A. Fall ed. *Shem Pete's Alaska: The Territory of the Upper Cook Inlet Dena'ina* (Fairbanks, AK: Alaska Native Language Center, University of Alaska, 2003); Steven Feld. "Waterfalls of Song: An Acoustemology of Place Resounding in Bosavi, Papua New Guinea", ed. Steven Feld - Keith Basso *Senses of Place*. pp. 91–135. Santa Fe, NM: School of American Research Press, 1996.

(*placenaming*) –bikaranînên navê cihan di nimûneyên berçav ên xeberdana rojane de– gelek bi kêmî bala zimannas û etnografan kişandiye.¹³

Navên cihan ku ji bo civatekê nisbeten bi rengekî kêmîtir giring bê dîtin jî, bi pêçevane, ji bo civateke din dikare bibe werçerxa bibîrxistina dîrok, efsane û vegêranên din ên devkî. Wate, navê cihan ji bo her civatê wateyeke xwe ya xweserî xwe heye û diqewime ku hin taybetmendiyên resen nîşan bide. Ji ber vê yekê ye ku xebatên li ser navê cihan, derheq çand, dîn, dîrok û folklorê gelekî de dikarin bi xwe re teferûatên balkêş û kêmpêyda bînin ber zanîna merivan.

2. Dengbêj(i) û Gera Wan a Daimî

Dengbêjî bi terîf û şiroveya navê xwe ve cextê dibe li ser deng û bêj(i)yê. *Deng*, îşaretê bi wê deqa devkî ya hunerî dike ku bi *bêjê* ve dibe meqamê ku tê vegêrandin. Bi vî awayî, îcrakirina performansa dengbêj a vegêraneke hunerî li ser du tiştên esasî ava dibe: çîrok (*deng*) û performansa wê ya hunerî ya vegêranê (*bêj*). Bi taybetî ev du deheyên dawî dengbêjî dibe mijara gelek xebatên akademîk û berhevkarîyê ku tê de li ser jiyan û kilamên wan agahî tînin dayîn¹⁴. Ji ber hindê, li ser dengbêjî û vegêranên wan ên hunerî li vir hewce nake ku babet dirêj bibe. Lê ji ber ku xebata berdest li ser navê cihan radiweste, pêdivî pê heye ku meriv li ser wan taybetmendiyên kesê dengbêj raweste ku bi xêra wan dibin xwedî zanîneke xurt a toponîmîk.

Dengbêj bi gerokbûna xwe ve mînanî mêşa hingiv ji gelek der û deveran qiset û çîrok, serhatî û qal û qewimînan hîn dibe. Ew, bi van gerên xwe ve ku bi gelemperî wekî parçeyê karê wî bi xwe ye, -beşdariya li şahiyên, danîna kirîvatiyê û dawet- li ser cografyaya xwe ya fîzîkî û çandî gelek agahî û zanînen kûr bi dest dixê. Ji ber karên xwe dengbêj tim di nav civatê de li dawet û şahiyên digere û gund namîne ku ziyaret nekiribe.¹⁵ Dengbêj ji dawetekê ji bo yeke din, ji gundekî bo gundekî din tim rêwî ye û erdnîgariya xwe ya lokal bi tevî çiya, newal, gund, zozanan ve baş hîn dibe. Ew tenê nabe şarezayê nav û nîşanên cografyaya xwe, herwiha ew di çarçoveya devera xwe ya lokal de serdana gundan dike û li hin gundan çend rojan kilaman dibêje.¹⁶ Ew di van gerên xwe de, nîrx û normên civatî, kesayetên giring ên civatê nas dike. Çûnûhatina dengbêj tenê bi gundên derdorê re bi sînor nebû, hin dengbêjan bi malbatî koçî gund û navçeyên cuda dikirin û

13 Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache*, 76.

14 Salihê Kevirbirî, *Filîtê Quto* (Stenbol: Do, 2009a); Salihê Kevirbirî, *Sedsala Qêrînekê: Karapetê Xaço* (Stenbol: Do, 2009b); Metin Yüksel, *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival and Revival of the Kurdish Kurmanji Language in the Middle East, 1925-1960* (University of Chicago, Unpublished PhD Thesis, 2011); Metin Yüksel, “On the Borders of the Turkish and Iranian Nation-States: the Story of Ferzende and Besra”, *Middle Eastern Studies* 52/4 (2016), 656–676; Metin Yüksel, “Oral Poets in Conflict: Aşîk Veysel and Dengbêj Reso on the Rope”, *Journal of Folklore Research* 56/1 (2019), 71–103; Marlene Schäfers, “Being sick of politics: the production of dengbêj as Kurdish cultural heritage in contemporary Turkey”, *European Journal of Turkish Studies*, 20 (2015); Marlene Schäfers, “Archived Voices, Acoustic Traces, and the Reverberations of Kurdish History in Modern Turkey”, *Comparative Studies in Society and History* 61/2 (2019), 447–473; Wendelmoet Hamelink, *The sung home: narrative, morality, and the Kurdish nation* (Leiden: Brill, 2014); Clémence Scalbert-Yücel, “The Invention of a Tradition: Diyarbakır’s Dengbêj Project”, *European Journal of Turkish Studies* 10 (2009); Canser Kardeş, *Aşîğin Sazı Dengbêjin Sesi: Dengbêjlik ve Aşîklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme* (Ankara: Eğiten Kitap, 2017); Estelle Amy de la Bretèque, “Awazên (Dengên) Keserê: Axafînen Melodîkirî, Zêmar û Vegotinên Lehengî di Nav Êzidiyên Ermenistanê de”, wer. Sinan Gültekin, *Wêje û Rexne*, 9-10 (2018), 57–78; Mehmet Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan* (Stenbol: Avesta, 2013). Serdar Öztürk, *Di tradîsyona dengbêjiya Kurdî de Şakiro (Jiyan û Berhem)* (Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Mêrdîn, 2014).

15 Taybetmendiyên gerokbûna dengbêj ne ku bi tenê di nav dengbêjên Serhedê de heye, hin agahîderên li deverên kurdên elewî yên li Bazarcix û Depê diyar kirine ku berê dengbêjên ji Riha û Diyarbekirê bi ser piştên hespan deverên wan ziyaret kirine û li gundan ji wan re kilam gotine. Bin. Wendelmoet Hamelink, *The sung home: narrative, morality, and the Kurdish nation* (Leiden: Brill, 2014), 42.

16 Bo nimûne, Dengbêj Kazoyê Garîsyayê li gundên Deştê Elaşgirê ji bo dawet û şahiyên hatiye vexwendin. Li vê herêmê gundek nemaye ku Kazoyê Garîsyayê neçûbe lê nebibe mêvan û çend sevan ji wan re kilam negotibe. Heta ew ne tenê gundên Elaşgirê geriyaye, li gelek gund û navçeyên Qerekilîsê (Agirî) geriyaye û gundên Kaxizmanê jî geriyaye ku wekî Newala Kaxizmanê tînin zanîn.

heta dawiya emrê xwe wan her tim mala xwe bar dikir.¹⁷ Gelek sebebên van koçên dengbêj hene yên wekî ezimandina ji aliyê mezinekî ve, lihevnekirina bi gundiyan re, feqîrî û hwd. Helbet, ev koçberiya dengbêj bi rihetî pêk dihat ji ber ku dengbêj zêde bi karên çandiniyê re mijûl nedibû, gelemperî bi hunera xwe ve debara xwe dikir.

Dengbêj, di ger û geştên xwe de bi rêya danûstandinên bi dengbêjên din re repertuara xwe dadigire û kilaman di nav civatê de digerinê.¹⁸ Zanîna wan a cografîk, bi taybetî zanîna wan a li ser navê gund, newal, zozan û golan bi gera wan re di nav gel de jî belav dibin. Navê şexs û cihên ku di kilamê de derbas dibin, nîşan didin ku vegêr û kesê ku qewam¹⁹ bi xwe jiyaye çendî pabend in bi cografya û civata xwe re. Dengbêj ketine rêyên gundan ên gelek dûr da ku herin kilaman bi-bêjin û li ser wan rêyan gelek serhatiyên wan çêbûne û hin ji wan kirine kilam.²⁰ Ji ber ku wesayît tunebû dema ku dengbêj diçû cihekî gelek caran bi peyatî hin caran bi erebeyên ga an jî bi hespan diçûn. Di vê rewşa zehmet de, rêwîti dirêj dibû û dengbêj gund bi gund, çem bi çem topografya û toponîmên welatê xwe bi xwe tecrîbe dikir û hîn dibû bê ka çî gund hene li herêma wî ya nêzik û dûr û navê wan çî ne. Herwiha, zanîna dengbêjan a rê û bihurên di nav çiyayan de, çûyîna wan a li gund û mezreyên gelek dûr ên çiyayî nîşan dide ku wan di nav danûstandinên civatî yên xurt de hunera xwe îcra kirine. Bi taybetî, cografyaya lokal a ku dengbêj pê re girêdayî ye ji aliyê zanîna erdê ya fîzîkî û çandî ve ji teref dengbêj bi xwe ve tê bidestxistin. Ev tecrîbe û zanîn di afirîneriya kilam û mekanê kilamê de ji wan re dibe malzemeya vegêrana kilamê û dihêle ku ew qal û qewamê baştir nexşe bikin û bisêwirînin.

Dengbêj bi zanîneke xurt a toponîmîk ve kilamên xwe diafirîne û ew di heman wextê de, dema performansê xwe de, zanîna xwe ya toponîmîk vediguhêze cimaeta hazir û guhdar jî. Bi vî rengî zanîna berfireh ya li ser toponîmên dorhêla nêzik û dûr li dîwan û dawetan di nav gel de belav dibe. Kilam jî di devê dengbêj de dibe wekî amrazê nasyarkirin û xêzkirina nexşeya xeyalî ya kurdî û helbet ew dibe amraza fêrkirina toponîman û bi giştî jî topografyaya kurdî.

Dengbêj bîreke civatî ava dike û li hember xisara jibîrkirinê bi kilam û kelama xwe ve li ber xwe dide. Di nav kurdan de ji ber ku nivîs kêr bû, gelek qal, şer û qewam nedihatîn tomarkirin. Dengbêj li hember talûkeya jibîrbûnê bi sedan salan li ber xwe daye. Lewre dengbêj warê sewt û qefesa xwe wekî kitab dibîne ku tê de serboriya civakî hatiye nivîsandin û ev kitab ji dengbêjên din re dikare bibe "kaxiz", "qelem" û "defter" da ku ji ber bigirin û nedin jibîrkirin. Li vir, "çanda devkî" –dengbêjî– di asta vegêranê de bi rol û mayîndebûna "çanda nivîskî" –kitûk, kaxiz, qelem, defter– radibe; bi şewaz û stîla vê çandê ve kar dike û cextê dibe ser wê bîra hevpar ku bi ne-

17 Güneş û Şahin destnîşan dikin ku Dengbêj "Reso di 1951an de ji Gopala koç dike di rêzê de diçe Xêrgîs, Arincîk û Xoşgeldiyê û heta 1957an li van hersê gundên li ser navçeya Kopê dimîne. Di 1957an de dîsa vedigere Gopala û salekê lê dimîne. Paşê 1958an de li ser daxwazê mala xwe dibe gundê Koxakê ya li ser navçeya Kopê û heta 1963an li wir dimîne. Dîsa vedigere Gopala û sê salan lê dimîne. Di 1966an de mala xwe bar dike îcar diçe gundê Piyongê ya li ser navçeya Kopê, çar salan li wir dijî. 1970an de dîsa vedigere Gopala û heta 1972an li wir dimîne. 1972an de îcar koç gundê Qeraxlî ya li ser navçeya Kopê dike û çar salan li wir dijî. 1976an de ji ber sedemên aborî biryar dide biçê metropolên Tirkiyeyê. Reso bi tevî malbata xwe li bajaroka Golmarmarayê ya girêdayî navçeya Akhisar a Bajarê Manîsayê dimîne. (...) Piştê jî di sala 1980an de vedigerin Mûşê, gundê Pagê." Ji bo gerokbûna Dengbêj Reso, bin. Güneş - Şahin, Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso, 29-30.

18 Ew carcar dema ku salixê kilamekê hildidin, ji bo kilamekê diçin gundên dûr û ji wî kesî kilamê berdigirin ê ku bi xwe ne dengbêj e lê mesele li ser wî qewimiye. Di hevpeyvînê de destebirakê Dengbêj Kazoyê Garisya, Hecî Mihemedê Ferman (Çaçan) behsa çiroka kilama "Porsor"ê kir û beşek ji kilamê got. Li gorî wî, dema ku kilam li ser hatibû derxistin û li ser zarê dengbêjan belav bibû, keça bi navê Porsorê hê sax bû û kesê ku kilam li ser hezkiriyê xwe Porsorê derxistibû, Ûsivê Huso bû. Dengbêj Kazoyê Garisya kilam ji ber Ûsivê Huso hildabû. Keçika bi navê Porsorê ji gundê Gulîceyê ye ku li Kaxizmanê dimîne (Hecî Mihemedê Ferman, Hevpeyîna rûbirû, 22ê Îlonê, 2020).

19 Di vê nivîsarê de dewsa peyva "bûyer"ê peyvên wekî "qewimîn", "qal" û "qewam" hatine bikaranîn ku bi naveroka kilaman re li hev dikirin. Ev yek bi zanebûn hate terçîhkirin.

20 Gelek kilam di encama ger û geştên dengbêj bi xwe de derdikevin. Bi taybetî hin dengbêj dema ku diçine cihekî serhatiyên xwe yên rê an jî dengbêjê ku li ser rê pê re dikevin leçe, serhatiyên wisa, dikin nav kilama xwe.

qilkirina devkî ya dengbêjan ve tê parastin. Ev nîşan dide ku dengbêj çandî bi bîr û şîyanweriya jiberkirina xwe bi "guman" in. Bo nimûne, kilama Evdalê Zeynikê bi devê Dengbêj Reso²¹ wiha tê neqilkirin:

Ez Evdalê Zeynê Bavê Mihê me

Singê mi **kitûka dengbêjan** e

Zarê mi ji dengbêja ra **kaxiz û defter û qelem** e lo yeman"

Sing û bîra dengbêj dibe ew "kitab"a -kitûk- ku hemû qal û qewimînên giring tê de tîn tomar- kirin û ji bo dengbêjên din tîn neqilkirin. Qewimînên mezin lewma li ser zar û zimanê dengbêjan (ve)digerin û heyani dinya xweş ava be dengbêj wê dikin "kilam û meqam". Bi vî rengî zanîn û sermayeya çandî û dîrokî ya gel destedewrî nifşên bê dibe. Vansina ku li ser dînamîkên veguhastina "nerîta devkî" (*oral tradition*) ji nifşekî bo nifşeke din xebat kiriye, diyar dike ku nerîta devkî dikare hevterîb li gel çavkaniyên nivîskî kar bike û dîroka çandên nexwenda/bêsewad bide neqilkirin.²² Kilamên dengbêjan ku parçeyekî wan ê giring ji qewimînên dîrokî pêk tê, rola veguhastina nerîta devkî ya çanda kurdî hildigirin ser xwe û wan derbasî nifşên nû dikin. Ango, sermaye û zanîna çandî di bîra gel de bi rêya nerîta devkî ya kurdî winda nabe û tê neqilkirin. Dema meriv di çarçoveya pênaseya rola veguhastina nerîta devkî ya Vansina de li kilama li jêr dinêre, meriv dibîne ku tespîten Vansina rasterast ji aliyê dengbêj ve di nav kilamê de hatine gotin. Ji ber ku haya dengbêj jê heye û dizane ku qal û şerê ku li ser vegêranê tê avakirin wê ji mezinan derbasî biçûkan bibe û neyê jibîrkirin. Heta dengbêj vê fonksiyona "veguhastina çandî ya di navbera nifşan de" di nav kilama xwe de dibêje û yek ji armancên kilambêjiya xwe jî bi vî rengî destnîşan dike. Lewma meriv dikare bibêje ku dengbêj wekî veguhêzerê nerîta devkî, bi xwe di ferqa rola vegêrana xwe ya hunerî de ye. Bo nimûne, di kilama "Dêran-Kejik"²³ de taybetmendî û rola kilam û meqamên dengbêjan bi terza Dengbêj Reso wiha tê ziman:

heyani dinya xweş ava be dengbêjê bikin meqam û kilam

li hevdu vegefinin

Rast e, dengbêj gelek qewamên dîrokî dikin "kilam û meqam", bi saya afirîneriya wan pirên çandî di navbera nifşên berê û yên nû de tîn avakirin. Ew, demên ku dikevin navbera nifşan, bi veguhastina çandî û dîrokî digihin hevdu. Wate dengbêj di heman demê de qewimînên rastîn destedewrî nifşên nû dike ku meriv dikare bi çavkaniyên nivîskî jî piştrast bike. Têkildarî vê babetê Yüksel, bi xebata xwe ve hevgeriya vegêranên devkî bi qeydên nivîskî dipeyitîne û destnîşan dike ku di veguhastina dîroka kurdî de helbesta devkî (*oral poetry*) roleke giring werdigire²⁴ ji ber ku kilamên dengbêjan, ji aliyê mezinan ve ji bo biçûkan tîn neqilkirin anga pireke çandî û dîrokî ava dikin di navbera nifşên cuda de.²⁵

21 Ömer Güneş - İbrahim Şahin, *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso* (Nûbihar: İstanbul, 2019a), 258-259.

22 Jan Vansina, *Oral Tradition as History* (Wisconsin: University of Wisconsin Press, 1985)

23 Ömer Güneş - İbrahim Şahin, *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso*, 214.

24 Metin Yüksel, "On the Borders of the Turkish and Iranian Nation-States: the Story of Ferzende and Besra", *Middle Eastern Studies* 52/4 (2016), 663.

25 Bo nimûne, di kilama Filîtê Quto de, di versiyona Dengbêj Huseynê Muşî de, dema ku behsa kuştina Filîtê Quto tê kirin, li ser mirina wî wiha tê gotin: "Lo lo lawo ca derbekî bavê(je) Filîtê Quto êtîmê Şemê, siwarê pêşiyê ew ê ser bi şemla / Heta dinya ava be, bira mezinê wir rabin piçûkên wir ra gelo çêkin mesele berxêê". Mezinan rabûye ji biçûkan re şerê di navbera Filîtê Quto û Emê Etmankî de, kiriye mesele û meseleya dîrokî bi rêya kilam û meqamên dengbêj, ji nifşên berê heta nifşên nû hatiye neqilkirin. Ji bo deşîfrasyona heman kilamê bi hin ferqên biçûk, bin. Ömer Güneş - İbrahim Şahin, *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseynê* (İstanbul: Nûbihar, 2021), 273.

3. “Topogeny”: Bi Seredorî Vegêrandina Navê Cihan

Navê cihan bi rengêkî çalak li tev vegêranên kilaman dibin. Ew şekl û şêweza binyadî ya kilamê wekî kevîrê qorziyê kar dikin û dibin bingeh û palpişt a ku carcar ber û meyla vegêranê diyar dike û wê li ser mekan bi cih dike. Lewma, ew ne tenê pêgeh û lokasyona şer û qewimînê dabîn dike, lê herwiha ew wan cih û waran nîşan dike ku têkilî û kartêkeriyên merivan lê gelek xurt bûne. Lê divê dorhêla fîzîkî jî neyê piştguhkirin a ku bi gelemperî piştî mekanê (navê mekanê) tê. Ango nav, bi xwe re mekanê temsîlkirî wekî dîmenekê dide xeyalkirin û kameraya vegêranê ji mekan ber bi karakterên li mekanê diguhêze ku di nav liv û tevgerê civatî de ne. Ev tevger û qewama civakî û çandî ku di kilamê de pêk tê, îşaretê bi bîreke civatî û hevpar dike. Îcar gelek fonksiyonên navan hene, hin ji wan ji aliye dêsmanî/binyadî ve kilamê birêkûpêk dikin, hin ji wan ji aliye wateyê ve li ser rehendên wekî bîr, jiyan, çand û civatê kar dikin.²⁶ Lewma di vê çarçoveyê de, ev beş van herdu aliyên navan dide ber xwe û wan rave dike. Gelek amrazên binyadî û çarçoveyî yên navan hene di nav kilamên kurdî de, li vir em ê tenê balê bikişînin ser têgiha topogenyê ku di nav kilamên kurdî de xuya dike.

Di hin kilamên kurdî de, ji mekanê destpêkê yê kilamê heta cihê armanckirî yê dawiyê (çi rêwîti an jî şopa kesê firarî) navê cih û waran bi rengêkî seredorî di nav vegêranê de cih digire û li ser qewam, tevgerên civatî yên li ser mekan girêdanên hestî û bîranînê saz dike. Ev diyardeya kêmpayda hin vegêranên xweserî zimanê kurdî û dengbêjiyê derdixin meydanê ku di nav piraniya gelên cîhanê de nayê dîtin.

James J. Fox di kitaba xwe ya bi navê *The poetic power of place; Comparative perspectives on Austronesian ideas of locality*²⁷ de diyar dike ku bi taybetî di nav wan gelên xwecih de ku bi zimanên avustronezî (*austronesian*) diaxivin navê cihan wekî parçeyekî navxweyî yê secereyê (*geneology*) tîn vegotin ku di nav wan stranên ayînî de meriv an jî tiştê (bo nimûne, birinc û garis), li ser erdê derdikevin rêwitiyekê li gorî rêzeke secereyî. Ew ji bo ravekirina pêwendiya di navbera erdê û dîrokê de bi rêya seredorî rêzkirina navê cihan, têgeha bi navê “*topogeny*”²⁸ saz dike, li gorî wî vegêranên wihareng zanîna civatî rêz dikin û wan vediguhêzînin. Di pêkhatina van *topogenyan* de, rêwitiyên şexsî jî dikarin bibin xwedî rol. Li gorî Fox çemka *topogeny*ê “vegotin/xwendina ji ber ya navê wan cihan e ku bi seredorî rêz bûne”.²⁹ Herwiha ew dibêje ku “*topogeny* dikeve gelek şekl û formên cihêreng di nav nifûsa avustronezyayê de. Ew dikarin rêwitiya bavûkalekî, koça grûpekî, an jî veguhestina tiştêkî vebêjin”³⁰ Ew hevterîbiyekî (paralelî) di navbera secere û *topogeny* de dibîne, ji ber ku herdu jî bi seredorî navan rêz dikin. Bi xebatên etnografîk ve gelek fonksiyon û rehendên cihêreng ên *topogeny*ê bi gelemperî di nava wan gelan de hatine dîtin ku bi zimanên avustronezyayî (*austronesian*) diaxivin û li ser gelek welat û giravên cuda niştêcîh in.³¹

Di edebîyata klasîk a Îslamî de ji helbestên ku piştî mirina kesekî/kesekê bi mebesta şînê hatine nivîsîn mersîye tê gotin. Mersîye di Kurdî de dikare wek “matemname” jî bê binavkirin. Di edebîyata Îslamî de mersîye herî zêde bi teşeyên qesîde, terkîbbend û tercî‘bendê ve hatine nivîsîn. Mersîye bi piranî li ser desthilatdarên siyasî, kesayetên dînî, endamên malbatê û bi taybetî

22 Li nusxeyên destxet ên qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî bnr.: (Pêvek: I û II).

23 Li gorî agahiyên ku me ji Tekyaya Hezanê wergirt, mustensîxê vê destxetê Hecî Haris Ceylan (murîdê yekem yê Şêx Ebdilqadirê Hezanî ye) û kurê wî Mehmet Ceylan in. Li gorî qeydên nifûsê Hecî Haris Ceylan di 01.07.1846an de li Çirika (Olukçeşme) Hezroyê hatiye dinê û wefata wî jî 1914 an jî 1916? ye. Kurê wî Mehmet Ceylan (01/07/1883-29/01/1962) jî 2-3 heyaman Şaredarîya Hezroyê kiriye.

24 Xuyaye ku ev dîwana Mela ji ber a metbû ku Seyîd Şefîk Arvasî ji bo çapê amade kiribû hatiye girtin.

25 Xebatên me yên li ser van destxetan hêj didomin. Ji bo bidestxistina destxetan em spasdarê Mela Ehmed û Mela Nûreddîn in.

şehîdên Kerbelayê tèn nivîsîn.²⁶ Di edebîyata Kurdî de hem helbestkarên serdema mîrektîyan hem jî gelek yên serdema Xalîdîtîyê qesîde û mersîye nivîsîne. Li derdora Tekyaya Hezanê jî kesên weke Seydayê Licî, Şêx Fethullahê Hezroyî, Şêx Îsmetullahê Karazî, Seydayê Xasî û bi dehan helbestkarên din mersîye nivîsîne.

Em ê li ser vê qesîdeya Şêx M. Selîmê Hezanî lêkolîna xwe ji alîyê ruxsarî û naverokî ve bikin û wê binirxînin.

2.1. Ji Alîyê Ruxsarî ve

Di vê beşê de em ê ji alîyê ruxsarî ve lêkolîna xwe bikin û em ê li ser teşe, kêş, serwabendî, mexles û unsûrên ahengê yên di helbestê de bisekinin.

2.1.1. Teşe, Kêş û Serwabendîya Helbestê

Ev helbesta Şêx Mihemed Selîmê Hezanî bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn û ji 27 malikan pêk tê. Şemaya vê qesîdeyê aa, ba, ca ... ye. Wezna wê mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun e û ji behra hezecê û salim e.

*Nidaya rihleta yarê digel nûriste re'na'ê
Nişan da nefxeya sûrê ji emwatê û ehya'ê*

Serwabendîya vê helbestê serwaya mucerred e. Di dawîya risteyan de “ê” ya herî dawî paşserwa ye û dîsa di dawîya risteyan de “a” jî herf rewîyê ye û ev herf di dawîya hemû risteyên malikên vê qesîdeyê de tê dubarekirin. Bi vî awayî hemû malikên vê helbestê bi hev ve tèn girêdan û serwabendîya vê helbestê jî dibe serwaya mucerred. Di helbestê de serwaya mucerred di navbera peyvên re'na, ehya, Sîna, bala, zulma, ifna, dunya, Enqa, hesra, sewda, heşra, reqsa, gëbra, temaşa, mewla, ra, me'wa, tesella, ala, mudawa, sehra, temenna, ferma, Geyda, Bexda û ehwa'ê de hatiye avakirin.

2.1.2. Unsûrên Ahengê

Di piraniya malikên vê helbestê de weke unsûreke ahengê hunera tesmîtê heye. Herweha Şêx Selîm ji bo pêkanîna mûsîqeyê di piraniya malikên helbestê de serwa û paşserwaya navekî jî bi kar anîye.

Sema a durdinoşan bû / simata dil xiroşan bû

Sefa a sebzepoşan bû / bi balê Tûr û Sîna'ê

Ev serwaya navekî bi kêşê re hêz û melodîyekê dide helbestê. Di vê malika jor de “an bû” paşserwa ye û “oş” jî dibe serwaya murdef. Ji vê serwayê jî ahenga di helbestê de xuya dibe.

2.1.3. Mexlesa Helbestkar

Di edebîyata klasîk de mexles mîna îmzeyaya helbestkar e û bi piranî di dawîya helbestan de mexles tèn bikaranîn. Şêx Mihemed Selîmê Hezanî jî di vê helbestê de mexles bi kar anîye ku ew jî “Selîm” e û ji navê wî yê rastîn pêk tê. Şêx Selîm di malika 20em û malika dawî ya 27em de

²⁶ Ji bo agahiyên zêdetir, bnr.; Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, (Stenbol: Weşanên Nûbihar, 2019), 143.

mexlesa xwe “Selîm” bi vî awayî bi kar anîye:

Tu bê sewda tû bê war î li derdê xwe bike zarî

Selîma ger tû hemwar î bike efsûs û ala'ê

...

Selîm bes ke ji van qalan, tu natirsî ji e'malan

Te çil şeş kir di nêv salan esîrê nefis û ehwa'ê

Tablo 1: Hin taybetîyên qesîdeyê yên ruxsarî:

Helbestkar	Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (1866 -1936)
Serdem	Sedsala 19-20.
Herêm	Hezana Licê ya Diyarbekirê
Ziman-Zarave	Kurdîya Kurmancî
Teşeya Nezmê	Qesîde
Yekeya Nezmê	Xane / Malik
Hejmara Malikan	27 Malik
Kêş, Qalib û	Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun
Behra Erûzê	(Behra Hezecê)
Serwa (Serwabendî)	“a” Serwaya mucerred e
Şemaya Serwayê	aa, ba, ca, ...
Paşserwa	“ê”
Mexles û Cihê Wê	“Selîm” / Malika 20em û ya dawî

2.2. Ji Alîyê Naverokê ve

Di vê beşê de jî em ê ji alîyê tema, ziman û uslûba helbestkar, hunerên edebî û ji alîyê kevneşopî û girîngîya wê ya di edebîyata Kurdî de helbestê binirxînin.

2.1.2. Mijar û Cûreya Helbestê

Ji metna helbestê jî xuya dike ku cureya vê qesîdeyê mersîye ye. Weke ku me li jor jî anîbû ziman ji helbestên ku ji bo şîr û matemê tîr nivîsîn mersîye tê gotin. Gava Şêx Diyaeddîn wefat dike xelîfeyê wî Şêx Selîm jî li pey wefata wî ev helbest nivîsîye. Ji ber vê yekê jî ev helbest dikeve kategorîya mersîyeyê. Mijara wê jî şîr û xema li pey şêx e.

Meded ke ey Diyaeddîn kû bînim te di xewnê da

Weger nedî binûşim ez şeraba fewt û ifna'ê

...

Weled xweş şêremêr merd e Cemaeddîn ji xwe ferd e

Mucedded kin bi wan 'ehd e bibexşî lutf û ferma'ê

...

Hewar kin Şahê Norşîn e digel Hezret Diya dîn e

Kû meqsûda me pêk bîne meded ya Xewsê Bexda'ê

Ji van malikên jor jî bi zelalî tê fahmkirin ku ev mersîye li ser Şêx Mihemed Diyaeddînê Norşînî

ye. Lewra hem navê Diyaeddîn derbas dibe hem jî navên kurên Şêx M. Diyaeddîn; Weled û Ce-maleddîn derbas dibin.

Selîm bes ke ji van qalan, tu natirsî ji e'malan

Te çil şeş kir di nêv salan esîrê nefîs û ehwa'ê

Ji vê malika 27em a jor jî tê xuyakirin ku gava ev qesîde hatiye nivîsîn Şêx Mihemed Selîm 46 salî bûye.

Di sê sed 'erbe'în bû zem digel isneyn fuzûn bû xem

Digel elfê elif bûn em ez im goyînê sehra'ê

Ji vê malikê jî derdikeve holê ku piştî wefata Şêx Diyaeddîn ev helbest hatiye nivîsîn. Lewra ev malik li gorî hesabê ebcedê dîroka wefata Şêx Diyaeddîn dide me. Ew tarîx jî weha ye: **sê sed (300) + 'erbe'în (40) + isneyn (2) + elf (1000) = 1342yê hicrî (1923 miladî)**. Ev hesabê ebcedê herweha hunera edebî ya tarîxdayînê jî pêk tîne.

Şêx Selîm di vê malikê de dibêje di sala 1342yan de em gelekî xemgîn bûne û em bûne elf ku ew jî rabûna qametê û sembola nimêja cenazeyê ye û di vê nimêjê de rukû û sucûd tune ye û weke herfa elfê ev nimêj li ser piyan tê kirin. Herweha di vê malikê de bi şibandina elfê dîsa hunera edebî teşbîh derketiye holê.

2.2.2. Ziman û Uslûba Helbestkar

Şêx Mihemed Selîm ji bilî zimanê dayikê Kurdî bi zimanên Erebi, Farisî û Tirkî jî dizanibû. Tesîra Farisî û Erebi jî di vê helbesta wî de jî diyar e.

Zimanê wî yê vê mersiyyê hinekî giran e, lewra helbest tîje bêjeyên Erebi û Farisî ne. Heta hin riste û malikên helbestê bi tevahî Farisî ne. Lêbelê uslûba wî bi unsûrên ahengê ve herikbar e û ev unsûrên ahengê jî mûsîqîyek xweş di helbestê de ava kirine. Em dikarin bibêjin pênûsa helbestkar xurt e û risteyên wî jî ji aliyê edebî ve têr û tîje ne. Lewra gelek cûre ji hunerên edebî ve di vê helbestê de hatine bikaranîn.

2.2.3. Ciwankariya di Helbestê de

Helbestkar bi uslûb û hunerên edebî yê weke telmîh, îham, tesmît, îstî'are, teşbîh, nîda, alîterasyon, Tarîxdayînê (hesabê ebcedê) û hwd. ve helbesta xwe xemilandiye. Di helbestê de gelek cureyên ciwankariyê hene, li jêr em ê çend nimûneyan ji van hunerên edebî nîşan bidin:

Eger Îsa û Luqman bîn xebardarê xeber îro

Dewa nakin li derdê min eger bêne mudawa'ê

Di vê malikê de mucîzeyê Hz. Îsa ku mirî sax dikirin û hekîmtîya Luqman ku nexweş birînên wan derman dikirin hatiye bibîranîn. Ev yek jî dibe hunera telmîhê û di malikên din de jî nimûneyên vê hunerê hene.

Hewar kin Şahê Norşîn e digel Hezret Diyadîn e

Ku meqsûda me pêk bîne meded ya Xewsê Bexda'ê

Di vê malikê de îfadeya "Diyadîn e" bi du maneyan dikare bê xwendin. Hem weke navê Şêx Mihemed Diyaeddîn/Ziyaeddîn û hem jî weke "Ziya dîn e" (Dîya dîn e) jî dikare bê xwendin, her

du mane jî di malikê de rast e. Çunkî bêjeya “ziya” di maneya şewq, ronahîyê de ye û “dîn” jî di maneya dîn, olê de ye. Yanî ew jî dikare di maneya şewqa dîn, rêberê dîn de bê nixandî. Ji ber sîfet û meqamê Hezret jî ev yek lê tê û bi vî awayî dikare bê şîrovekirin.

Ji bo ku di gelek malikên vê helbestê de serwaya navekî hatiye bikaranîn. Ev jî ji bo helbestê dibe unsûreke ahengê û herweha dibe hunera tesmîtê jî.

*Me dî şemsek munewwer bû digel bedrek mukemmel bû
Xirûbek nagihan wer bû kişandî wan bi xebra'ê*

Di vê malikê de jî şêxê xwe bi şemsê ango bi rojê şibandîye, lêbelê yê şibandî nehatiye bilêvkirin û ev jî dibe îstî'areya vekirî.

*Weled xweş şêremêr merd e Cemaleddîn ji xwe ferd e
Mucedded kin bi wan 'ehd e bibexşî lutf û ferma'ê*

Di vê malikê de jî Weled lawê Hezret bi şêremêrî hatiye şibandin û hunera teşbîhê derketiye holê.

*Ela ey nusxeya camî' ela ey mushefa lami'
Nedî qet kes peyapey ta'iranê Koyê Enqa'ê*

Di vê malikê de jî bi bêjeya “ey”ê bangî, bangkirin hatiye kirin û ev jî dibe nîda. Di hin malikên din de jî ev huner heye.

*Nidaya rihleta yarê digel nûriste re'na'ê
Nişan da nefxeya sûrê ji emwatê û ehya'ê*

Di vê malikê de jî dengên “n” û “r”yê di gelek bêjeyan de hatiye dubarekirin û di helbestê de aheng û mûsîqeyek ava kiriye. Ev yek jî dibe hunera alîterasyonê.

*Çi hal e ev çi hal e ey nedîm û hemnişînê min
Çi deng e ev çi deng e kirye ruhê min di reqsa'ê*

Di vê malikê de jî bi tîpa “ç” yê hem alîterasyon û bi tîpên “e” û “i”yê jî hunera asonansê pêk hatiye. Lewra ev her du herf jî di heman malikê de gelek caran hatine dubarekirin. Herweha di vê malikê de hunera îstîfhamê jî bi pirsên ku bersiva wan tê zanîn pêk hatiye. Helbestkar bi pirsên “çi hal e” û “çi deng e” qesta wî ne wergirtina bersivê ye, lê wî xwestîyê hêza vegotinê zêdetir bike. Bi heman awayî bi dubarekirina van îfadeyan hunera tekrîrê jî derketiye holê.

*Elemdar im elemdar im ji derdê hicrê bêzar im
Nemiyar em ke mîarem wera'ê ah û hesra'ê*

Di vê malikê de hunera telmî'ê heye, lewra du ziman hatiye bikaranîn. Ji ber ku risteya yekem bi Kurmancî û ya duyem jî bi Farsî ye ev huner pêk hatiye.

Di malika 23yem de jî hunera tarîxdayînê (hesabê ebcedê) heye me ew li jor îzah kiribû. Di malikê de wefata Şêx Mihemed Diyaeddîn bi hesabê ebcedê weke hunerekê pêşkêş kiriye.

2.2.4. Kevneşopîya Helbestê

Helbest bi kevneşopîya têkilîya di navbera murîd û murşîdîyê de hatiye hûnandin. Di ekola Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de têkilîyeke hêzdar a murîd û murşîdîtiyê heye û pîr û murşîdê terîqetê ji murîd re mîna evîndarekê ye, di vê helbestê de jî ev yek xuya dike. Ji aliyê piranîya helbestkarên

ku li derdora tekyayan mezin bûne qesîdeyên medh û şîne yên bi vî rengî hatine nivîsîn.

Bavê wî Şêx Ebdilqadirê Hezanî jî di nav vê kevneşopîya murîd û murşîdîyê de li ser şêxê xwe Şêx Ebdirrehmanê Taxî (bavê Hezret) medhîye û mersîyeyên bi vî rengî nivîsîne. Şêx Selîm jî li Tekyaya Hezanê bi kevneşopîyekê ev mersîye li ser Hezret nivîsîye.

Şêx Mihemed Selîm di vê helbesta xwe de di bin tesîra bavê xwe Şêx Ebdilqadirê Hezanî de maye. Ev tesîr jî di van malikên mersîyeya Şêx Ebdilqadir de ku li pey wefata şêxê xwe Şêx Ebdirrehmanê Taxî nivîsîye xwe dide der:

*Eman Seyda eman Seyda mi ne qel û mi ne sewda
Çi derdek bû li min peyda te rihlet kir ji dunya'ê*

*Çi lazim re'y û tedbîr e ku Baxwey kirye teqdîr e
Xuda heywe mekin ji bîr e te rihlet kir ji dunya'ê*

*Di sala sê sed û çaran ku rehmet barî wek baran
Li ser ehbab û hem yaran te rihlet kir ji dunya'ê²⁷*

Ev malikên 1em, 18em û 22yem yên helbesta Şêx Ebdilqadirê Hezanî hem ji alîyê qalibê kêşa erûzê, hem ji alîyê serwa, serwaya navekî, serwabendî û herfa rewîyê ve û hem jî ji alîyê terz, uslûb û hunerên edebî ve tesîra li ser Şêx Selîm nîşanî me dide. Mijar, cûre û teşe di her du helbestan de jî heman e. Bi taybetî jî gava em li malikên 15em, 16em û 22yem yên vê mersîyeya Şêx Selîm dinihêrin ev tesîra Şêx Ebdilqadir bi zelalî xuya dibe.

Di edebîyata Kurdî ya klasîk de gelek kesên weke Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Şêx Mistefayê Sîsî, Mela Zahirê Tendurekî, Şêx Mihemed Emînê Heyderî di çarçoveya murîd û murşîdîya Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de li ser wefata şêxên xwe mersîye nivîsîne. Ev cûre di Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de mîna kevneşopê hatiye dîtin û bi salan dewam kiriye. Şêx Selîm jî li ser Hezret ev qesîdeya berdest nivîsîye. Şêx Selîm di vê mersîyeyê de êş û xema ku li pey mirina şêxê xwe kişandiye anîye ziman.

Di mijarên dînî-tesewîfî de jî Şêx Mihemed Selîm bandoreke mezin li ser gelek alim û edîban jî kiriye. Gelek murîd, xelîfe û alimên derdora Tekyaya Hezanê li ser wî medhîye û mersîye nivîsîne. Mela Ehmedê Xasî, Hecî Fethulahê Hezroyî, Şêx Îsmetullahê Karazî hin ji van edîb û aliman in ku di bin tesîra Şêx Selîm de mane û li pey wî helbest nivîsîne.

Şêx Îsmetullahê Karazî jî li ba wî hem dersên ilmî û hem yên tesewîfî wergirtine û Şêx Îsmetullah li pey wefata wî mersîye nivîsîye û tê de bi hunera hesabê ebcedê tarîxa wefata wî jî weha daye.

*Daxilî ha'ê bû waw mîn Muharrem der ehed
Piştî xeyn û şîn û nûnê bû muqîmê Girdigar²⁸*

*Salê ha şûm û wexîm e rehber û Şahê Selîm e
Kir temam 'alem yetîm e şanzde'ê şehre Adar²⁹*

27 Ji bo hemû helbesta Şêx Ebdilqadirê Hezanî bnr.: Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Mela 'Ebdillahê Hîzanî û Şa'irên Malbata Wî*, (Dihok: Weşanên Spîrêz, 2011), 113-115.

28 Di vê malikê de bi hesabê ebcedê tarîx hatiye dayîn. Dîroka wefata Şêx Selîm di 6ê Miherema sala 1355ê hicrî de ye ku ew jî beranberî (Roja Yekşema) 29ê Adara 1936ê miladî tê.

29 Ji bo hemû helbesta Karazî bnr.: Karak, *Dîwançeyaya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*, 262-264.

Li gorî hesabê ebcedê ew tarîx weha di malikên jor de hatiye nîşandan. Tarîxa wefata wî li gorî hesabê ebcedê 1555ê hicrî ye ku ew jî beranberî 1936ê miladî tê.

2.2.5. Girîngîya Helbestê

Ev mersîyeya Şêx Selîm heta niha bi tevahî nebûbû mijara lêkolînê û di nav edebîyata Kurdî de cî negirtibû. Em bi vê qesîdeya wî dizanin ku wî jî di nav ekola Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de cî girtiye û bi heman kevneşopîyê ve ji bo şêxê xwe mersîye nivîsiye û edîbbûna wî bi vê helbesta xwe nîşan daye.

Ji hemû helbestê jî tê fahmkirin ku Şêx Mihemed Selîmê Hezanî jî alim û şairekî heyama xwe bûye. Lewra hem unsûrên edebîyata klasîk û çanda kevneşopîya tekyayan di helbesta wî de xuya dibe hem jî telmîh û tesmît di serî de gelek hunerên edebî bi kar anîne.

Tablo 2: *Hin taybetîyên qesîdeyê yên naverokî:*

Helbestkar	Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (1866 -1936)
Cûreya Nezmê	Mersîye
Ji Alîyê Naverokê	Matem û pesnê li ser mirî
Mijar	Êş û xema li pey wefata şêxê xwe
Tema	Şîn, êş û ezîyeta veqetînê

Metna Transkirîbekirî ya Qesîdeya Şêx Selîm

Me ji du nusxeyên cuda yê destxet ev helbesta Şêx Mihemed Selîmê Hezanî bi rêya miqayeseyê bi herfên transkirîpsiyona navneteweyî nivîsi.³⁰ Me nusxeya yekem weke bingeh qebûl kir û ferqên nusxeya duyem jî me di jêrenotan de nîşan dan.

Haza kalamê Seyda quddîsesî sirruhe

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun

(Ji behra hezecê: +--- / +--- / +--- / +---)

1. Nidaya rihleta yarê digel nûriste re'na'ê
Nîşan da nefxeya şûrê ji emwatê³¹ û ehyâ'ê
2. Sema a durdinoşan bû simaşa dil xiroşan bû
Şefa a sebzepoşan bû bi balê Tûr û Sîna'ê³²
3. 'Elemdar im birîndar im ji derdê firqeta yarê
Şîrîn e nazidara min bi reftar û bi bala'ê
4. Meded ey qibleya rûhî li afaqê 'enaşir de
Tecellî wer nedî kor bim di vê gewğa û zulma'ê
5. Meded ke ey Dîyaeddîn kû bînim te di xewnê da
Weger nedî binoşim ez şeraba fewt û ifna'ê

30 Qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (Nusxe-I ji Keşkola Malbata Hezanî û Nusxe-II ji Nuxxeya Mela Ehmed Yalar e).

31 Ji bo emwat] :Nusxe-II (Nuxxeya Mela Ehmed Yalar).

32 bû bi bala Tûrê Sîna'ê] :Nusxe-II

6. Çi hûsnek lê muqeyyed bû li nik neqlê mucerred bû
Li 'alem berzexê wer bû çiraya dîn û dunya'ê
7. Ela ey nusxeya cami' ela ey muşhefa lami'
Nedî qeţ kes peyapey ta'iranê Koyê Enqa'ê
8. Elemdar im elemdar im ji derdê hicrê bêzar im
Nemiyar em ke mîarem wera'ê ah û hesra'ê
9. Serapa hîrquet û nar im³³ ke ba ah nale³⁴ hemwar im
Nemîdar em nemîdar em bi medrek eql û sewda'ê
10. Esîrê qameta yekta feqîrê cilwe'a³⁵ ta ta
Ez im îro heta bimirim herim ber erdê heşra'ê
11. Çi hal e ev çî hal e ey nedîm û hemnişînê min
Çî deng e ev çî deng e kirye ruhê min di reqşa'ê
12. Me dî şemsek munewwer bû digel bedrek mukemmel bû
Gîrûbek nagihan wer bû kişandî wan bi gebra'ê
13. Nedîman abê tufan kûsê rişlet ba hemîn est î
Çunîn şûra û gûlgûl ba enîn ber rûyê gebra'ê
14. Xiţaba irci'ê bû ew şelaya irteđî bû lew³⁶
Mela'ik şef bi şef tîn cû ji ber hûsn û temaşa'ê
15. Ela ey hemnişînan şûrê î gewga çî dişwar est
Mekin lewme ji³⁷ min îro kû dîn û eql û mewla'ê³⁸
16. Çi cayê te'n û te'bîr e³⁹ ji meşder bûye teqdîr e
Xuda heyye mekin j'⁴⁰ bîr e ji muşteq qeţ nehîr ra'ê
17. Ela ey muflisê naçar gerîbê bê newa hemzar⁴¹
Gûrabê qe'qe'ê bêçar tû bê sewda û me'wa' î
18. Çi⁴² bilbil zar û bêçarî çî⁴³ perwane siyehkar î
Çu Wamiq dil nemîdar î ji fikra bejn û bala'ê

33 hirquetê nar im] :Nusxe-II.

34 ke bi ah û nale] :Nusxe-II.

35 cilweya] :Nusxe-II.

36 ew] :Nusxe-II.

37 li] :Nusxe-II.

38 ku eql dîn mewla'ê] :Nusxe-II.

39 te'nê te'bîr e] :Nusxe-II.

40 Ji] :Nusxe-II.

41 hemwar] :Nusxe-II.

42 Çû] :Nusxe-II.

43 Çû] :Nusxe-II.

19. Çi Mecnûn û çî Ferhad e ji derdê min xeber nade
Meger Ye'qûbê min bad e li rûhim ke tesella'ê
20. Tu bê sewda tû bê war î⁴⁴ li derdê xwe bike zarî
Selîma ger tû hemwar î bike efsûs û ala'ê
21. Eger Îsa û Luqman bîn⁴⁵ xeberdarê xeber îro
Dewa nakin li derdê min eger bêne mudawa'ê
22. Di sê şed 'erbe'în bû zem digel isneyn fuzûn bû gem
Digel elfê elif bûn em ez im goyînê Şehra'ê⁴⁶
23. Ilahî tû li wan waran nemaye şerh û esraran⁴⁷
Dibarin ez 'iyûn baran bi van⁴⁸ fikr û temenna'ê
24. Weled xweş şêremêr merd e Cemaleddîn ji xwe ferd e⁴⁹
Mucedded kin bi wan 'ehd e bibexşî⁵⁰ luţf û ferma'ê⁵¹
25. Bi vê fikrê me tedbîr e ji nig Rebbê me teqdîr e
Bi vê falê me te'bîr e hewar kin Gewsê Geyda'ê
26. Hewar kin Şahê Norşîn e digel Hezret Dîyadîn e⁵²
Ku meqşûda me pêk bîne meded ya Gewsê Bexda'ê
27. **Selîm** bes ke ji van qalan tu natirsî ji e'malan
Te çil şeş kir di nêv salan esîrê nefis û ehwa'ê

ENCAM

Şêx Mihemed Selîmê Hezanî li gorî belgeyên dîrokî li Mûşê di sala 1282ê rûmî (01.07.1866 miladî) de li Memana Rojkanê hatiye dinyayê û li gorî kutika nifûsê jî dîsa di 29.03.1936an de di 70 salîya xwe de li Hezana Licê wefat kiriye û li Hezanê medfûn e. Şêx Selîm bi bavê xwe Şêx Ebdilqadirê Hezanî (1250 rûmî/1835 miladî-w.1908) re hatiye devera Licê û li vê derê medrese û tekya ava kirine û li herêmê irşad belav kirine. Nav û dengê wî bêtir bi postnişîniya tekayaya Hezanê li deverê belav bûye û di rewşenbîriya herêmê de jî roleke mezin bi cî anîye. Herweha Şêx Selîm di sîlsîleya Xalidîtiya Neqşebendîtiyê de cihekî girîng girtiye û di tekya û medreseyan de ji bo perwerdekirina aliman ked daye û alimên mezin gihandiye.

Şêx Selîm jî di çarçoveya murîd û murşîdîyê de li ser wefata şêxê xwe qesîdeyek nivîsiye. Qesîde ji 27 malikan pêk tê û bi cureya mersîyeyê hatiye nivîsîn. Şêx Selîm di vê mersîyeyê de êş

44 Tû bê sewda û bê war î] :Nusxe-II.

45 bin] :Nusxe-II.

46 Di vê malikê de dîroka wefata Şêx Diyaeddînê Norşînî hatiye dayîn. Ew jî 1342yê hicrî (1923yê miladî ye).

47 numa' î şerhê esraran (nema' î / numa'ê)] :Nusxe-II.

48 bi vê] :Nusxe-II.

49 Weled û Cemaleddîn her du kurên Şêx Diyaeddînê Norşînî ne.

50 bibexşeş] :Nusxe-II.

51 luţfê ferma'ê] :Nusxe-II.

52 Weke "Ziya dîn e" (Dîya dîn e) jî dikare bê xwendin. Yanî di maneya ronahîya dîn, rêberê dîn de.

û xema ku li pey wefata şêxê xwe kişandiye anîye ziman.

Ji vê qesîdeya wî ya ku li ser Şêxê xwe Şêx Mihemed Diyaeddînê Norşînê (Hezret) nivîsîye tê fahmkirin ku Şêx Mihemed Selîmê Hezanî jî alim û şairekî heyama xwe bûye. Lewra di vê helbesta wî de şopên çanda edebîyata klasîk xuya dibin, ji alîyê hunerên edebî ve jî dewlemend e û pênuşa wî jî xurt e.

Ji vê helbestê bi aşkerekî xuya dibe ku Şêx Mihemed Selîm jî alîyê edebî ve ketiye bin tesîra bavê xwe Şêx Ebdilqadirê Hezanî û herweha Şêx Selîm jî ji alîyê dînî-tesewîfî tesîr li helbestkarên li derdora Tekyaya Hezanê kiriye.

Bi saya vê xebatê em bi alîyê edebî yê Şêx Selîm jî hesiyar û êdî di nav rûpelên tarîxa edebîyata Kurdî de dê ew û helbesta wî jî cihê xwe bigire.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, Stenbol: Weşanên Nûbihar, 2019.

Aslan, Bedrettin, *Semerşeyhli Mela Abdullah'ın Aile Seceresi*, İstanbul: İmleç Yayınları, 2013.

Çakır, Mehmet Saki "Şeyh Abdülkadir-i Hezânî (v. 1908) ve Hezân Dergâhı'nda Yetişen Sûfî Âlimler", *Mevlânâ Hâlid-î Bağdâdî Ve Hâlidîliği'nin Bingöl Ve Çevresi Üzerindeki Etkisi Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Rektörlüğü Yayınları, 2017, 353-358.

Doskî, Tehsîn İbrahîm, *Mela 'Ebdillahê Hîzanî û Şa'irên Malbata Wî*, Dihok: Weşanên Spîrêz, 2011.

Destxeta Qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (Nusxe-I, ji Keşkola Malbata Hezanî), Pirtûkxaneyaya Taybet a M. Zana Karak.

Destxeta Qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (Nusxe-II, ji Nusxeya Mela Ehmed Yalar e). Nusxeya Fotokopî, Pirtûkxaneyaya Taybet a M. Zana Karak.

Destxeta Şecereya Malbata Hezanîyan (Nusxeya Mela Ehmed Yalar), Nusxeya Fotokopî, Pirtûkxaneyaya Taybet a M. Zana Karak.

Karak, M. Zana, *Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, 2020.

Korkusuz, M. Şefîk, *Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbakır Velileri I-II*, İstanbul: Kent Yayınları, 2004.

Mela Derwêşê Hezroyî kurê Mela Hadî "Tekyaya Hezanê" (Hevdîtîn: M. Zana Karak, Şeweya Qeydê: nivîs, Dema Hevdîtînê: Kanûna Pêşîn a 2019an).


Mela Nûreddînê Hezanî "Tekyaya Hezanê" (Hevdîtîna ku me pê re kir, Şeweya Qeydê: nivîs, Dema Hevdîtînê: 12. & 21.03.2020 û Gulana 2021).

Nasnameya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî û Nasnameya Şêx Ebdilqadirê Hezanî (Fotokopîya belgeyan di arşîva me de ye).


Rûpela Yekem a Pirtûkçeya Şecereya Binemala Karazî (Fotokopîya Destxetê, Tevahî 10 rûpel e), Nusxeya Fotokopî, Pirtûkxaneyaya Taybet a M. Zana Karak.

PÊVEK

Pêvek I: Destxeta helbesta Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (Nusxe-I)⁵³





53 Nusxe-I, r. 152-153.



Pêvek II: Destxeta helbesta Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (Nusxe-II)⁵⁴

54 Mustensixê vê destxetê Mela Ehmed Yalar e. r. 166-169.





١٤٨

هه‌میش

ندیمه‌ی آب طوفان کوس رحلت باهمنیست این

چنین شوره غلغل با این بر روی غبرائی

خطابا رجعی بو او صلا یا ارتقی بو او

ملا ئک صف به صف چو ژ بر حسن تماشا ئی

الای همنشینان شور این غوغا چه دشوارست

مکن لومه لمن ایرو کو عقل دین مولا ئی

چه جای طعن تعبیره ژ مصدر بو یه تقدیره

خدا حیه مکن ژ بیره ژ مشتق قطن نه ئی را ئی

الای مفلس ناچار غریب بی نوا هموار

غراب قهقع بی چار تو بی سوداؤ ماؤا ئی

چو بلبل زارو بی چاری چو پروانه سیه کاری

چو وامق دل نهی داری ژ فکر ابژن و بالائی

چه مجنون و چه فرهاده ژ درد من خبر ناده


مگر یعقوب من باده لروحم که تسلا ئی

تو بی سوداؤ بی واری لدر دحو بکه زاری

سلیمان گر تو همواری بکه افسوس والائی

اگر عیساؤ لقمان بن خبر داری خبر ایرو

دوانا کن لدر دمن اگر بینه مداوا ئی



Pêvek III: Şecereya Şêx M. Selimê Hezanî ya Binemalê (Destnivîsa wî bixwe)

هذ التارخ من جهة الآباء والاجداد

أَنَا مُحَمَّدٌ سَلِيمُ الْمَوْلُودُ لَيْلَةَ الْجُمُعَةِ فِي قَرْيَةِ تَمَانِي مِنْ قَرْيِ
 رَوْشَكَانٍ مِنْ نَاحِيَةِ بُلَانِقِ ابْنِ الشَّيْخِ عَبْدِ الْقَادِرِ الثَّانِي
 خَلِيفَةِ الْقُطْبِ الْأَعْظَمِ الشَّيْخِ عَبْدِ الرَّحْمَنِ التَّامِي قَدَسَ سِرُّهَا
 وَنَفَعَا اللَّهُ بِبَرَكَاتِ أَنْفَاسِهِمَا الْعَلِيَّةِ الْقُدْسِيَّةِ ابْنِ مَلَا
 عَبْدِ اللَّهِ الْمَدْفُونِ بِقَرْيَةِ سَمَرِ شَيْخٍ نَادُونَ قُطْبِ الْإِرْشَادِ
 تَوْلَانَا حَضْرَةَ الشَّيْخِ خَالِدِ الْمُجَدِّدِ قَدَسَ سِرُّهَا ابْنِ مَلَا عَبْدِ الرَّحِيمِ
 ابْنِ مَلَا مُحَمَّدِ ابْنِ مَلَا أَحْمَدِ ابْنِ حَسِينِ آغَا مِنْ أَمْرَاءِ مَمْلُوكَةِ
 بَهْمَانٍ مِنْ هَيْسَتَابَرِي سَبِي فَالْأَصْلُ الْمُنْتَشِرُ لِلنَّسْلِ هُنَا
 أَوْلَا ثَلَاثَةَ إِخْوَانٍ وَاحِدٌ جَدُّنَا وَلَا نَعْرِفُ اسْمَهُ وَالْآخَرُ
 بَيْتُ مَلَا خَلِيلِ السَّعْدِيِّ رَحِمَهُ اللَّهُ تَعَالَى وَالْآخَرُ ذُصْبِ الْبَابِ قَوْلَانِ
 وَلَا نَعْرِفُهُ وَمِنْ تَنَاسُلِهِ كَذَا نَقَلْتُ مِنْ عَمِّي مَلَا عَبْدِ الْكَرِيمِ
 الْمَرْحُومِ وَابْنِ الْمَذْبُورِ قَدَسَ اللَّهُ أَسْرَارَهَا الْعَلِيَّةِ وَأَسْمُ أُمِّهِ
 آسِيَّةٌ وَأُمُّ أُمِّهِ هَاجِرَةٌ وَأَنَا مِنْ جِهَةِ الْأُمِّ ابْنُ فَاطِمَةَ
 بِنْتِ عَائِشَةَ وَأَسْمُ أَبِيهَا مَلَا سَلِيمَانَ

Pêvek IV: Rûpela Yekem ji Pirtûkçeya Şecereya Binemala Karazî

الملا عبد الله السمرشيني ابن الملا عبد الرحيم
الهيتراني بن ملا محمد بن ملا أحمد بن ملا
محمد الكبير بن ملا سليمان بن حاجي حسين آغا
من أمراء مملكة بهتان من هيشتا برى سبي
بن ملا يوسف من ولد الشيخ موسى الفاروق
الأزلي رئيس الطريقة الزولية صاحب القبة
السوداء بخاردين ابن ماهين المارديني ..
وردى سيداء الشيخ علاء الدين الأوغيني أن
هؤلاء يسمون بعليجانا وأقربا بهم الذاهبون
الى هكاريا بعليجانا وعليجان وعليجان كانا ..
أخين وقبيلتهم جميعا كرافيا .

(١)



Pêvek VII: Nasnameya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî ya Heyama Komara Tirkîyeyê⁵⁶



56 Ev nasname bi tevahî 32 rûpel in, me li vir 8 rûpelên hatine tîjekirin parve kir. Nasname di 14ê Gulana 1928ê miladî de li Licê hatiye dayîn (bi rêya guhertinê). Orjînalê belgeyê di arşîva Şeyh Takiyeddin Aydın de parastî ye.



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2021
Sayı/Hejmar/Issue: 3
e-ISSN 2717-8315
Rûpel/Sayfa Page: 67-99



BÎBLİYOGRAFYAYA TEZÊN MASTER Û DOKTORAYÊ YÊN BEŞÊN ZIMAN Û EDEBİYATA KURDÎ Û ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ (2012-2020)*

Ziyattin YILDIRIMÇAKAR - Sinan ÇAKAR - Şerif GÜZEL

Kurte

Ev gotar li ser tezên master û doktorayê ye ku di navbera salên 2012 û 2020an de, di beşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî de yên li Zanîngehên Tirkiyeyê hatine amadekirin. Armanca me ji bo nivîsandina vê xebatê ew e ku em bîbliyografyayekê li ser van tezan amade bikin û li gorî biwaran wan rêz bikin ku kesên dixwazin ji wan îstîfade bikin bi rihetî xwe bigihînin. Herçiqas bîbliyografyaya tezên heta sala 2018an berê hatibû çêkirin jî, me guncan dît ku piştî tezên doktorayê û gelek tezên masterê ên van herdu salên dawî, em xebateke din çêbikin. Me di vê gotarê de cih da tezên kurmançî, zazakî û çend hebên soranî û ew beş bi beş kategorîze kirin.

Peyvên Sereke: Bîbliyografya, tezên masterê yên beşên kurdî, tezên doktorayê yên beşên kurdî, ziman û edebiyata kurdî, ziman û çanda kurdî, xebatên kurdolojîyê.

67

Cureya Nivîsarê/Makale Tûrû/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatînê/Makale Geliş Tarihi/Received:
05.04.2021
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/:
30.04.2021
Ziyattin Yıldırımçakar. Lêkolîner, Beşa Ziman û
Edebiyata Kurdî, Zanîngeha Mardin Artuklu.
e-mail: ziyayildirim@artuklu.edu.tr Orcid:
<https://orcid.org/0000-0003-4809-511X>
Sinan Çakar. Lêkolîner, Beşa Ziman û Çanda
Kurdî, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl. e-mail: sinan-
cakar@yyu.edu.tr
Orcid: <https://orcid.org/0000-0002-1088-5995>
Şerif Güzel. Hîndeke, Beşa Ziman û Edebiyata
Kurdî, Zanîngeha Bingölê. e-mail: serifguzel@
bingol.edu.tr
Orcid: <https://orcid.org/0000-0003-3837-3155>

Atf/Citation: Yıldırımçakar, Z., Çakar S., Güzel
Ş. (2021). "Bîbliyografyaya Tezên Master û
Doktorayê Yên Beşên Ziman û Edebiyata Kurdî
û Ziman û Çanda Kurdî (2012-2020)", Kurdiyât,
3, 67-99.

* Tezên ewil yên beşên kurdî di sala 2012an de hatine parastin. Lewma me ew dîrok wekî destpêk nişan kir.

The Bibliography of Masters and Doctoral Theses in the Departments of Kurdish Language and Literature and Kurdish Language and Culture (2012-2020)

Abstract

This article is based on doctoral and master theses prepared between 2012 and 2020 in the departments of Kurdish Language and Literature and Kurdish Language and Culture in Turkey. Our goal in writing this work is to prepare a bibliography on these theses and to categorize them with their topics so that those who wish to use them can easily access them. Although a bibliography of such theses until 2018 was prepared, we found it appropriate to create a new work after the doctoral theses and many master theses of the last two years. We have included Kurmanji, Zazaki and a few Sorani theses in this article and they have been categorized in sections.

Key Words: Bibliography, Kurdology, master's thesis in Kurdish Departments, PhD thesis in Kurdish Departments, Kurdish Language and Culture, Kurdish Language and Literature, Kurdish studies.

Kürt Dili ve Edebiyatı ile Kürt Dili ve Kültürü Bölümleri Yüksek Lisans ve Doktora Tezleri Bibliyografyası (2012-2020)

Öz

Bu makale, 2012-2020 yılları arasında Türkiye'de Kürt Dili ve Edebiyatı ile Kürt Dili ve Kültürü bölümlerinde hazırlanan doktora ve yüksek lisans tezlerini kapsamaktadır. Bu çalışmayı yazarken amacımız, bu tezlerle ilgili bir bibliyografya hazırlamak ve bunları kullanmak isteyenlerin kolayca erişebilmesi için konusuna göre kategorize etmektir. 2018 yılına kadar bu tür tezlerin bibliyografyası hazırlanmış olsa da son iki yılın doktora tezleri ve pek çok yüksek lisans tezinden sonra yeni bir çalışma yapmayı uygun bulduk. Bu yazımızda Kurmanci, Zazaca ve birkaç tane Sorani tezine yer verdik, bunları bölümler halinde kategorize ettik.

Anahtar Sözcükler: Bibliyografya, Kürtçe bölümlerin yüksek lisans tezleri, Kürtçe bölümlerin doktora tezleri, Kürt Dili ve Kültürü, Kürt Dili ve Edebiyatı, Kürdoloji çalışmaları.

DESTPÊK

Piştî vekirina beşên kurdî li zanîngehên tirkîyê gelek xebatên master û doktorayê pêk hatine. Ji bo lêkolîneran xaleke girîng e ku bizanibin ka kîjan xebat di kîjan biwarê de hatine nivîsandin û bi awayekî sistematîk û tesnîfkirî li ber çavê xwe bibînin. Loma me jî xebateke bi vî awayî ji ber van armancan pêk anî.

Du gotarên bibliyografîk ku beriya vê gotarê hatibûn nivîsandin hemû tezên ku heta sala 2018 an di beşên kurdî de, di qada kurdolojiyê de hatibûn nivîsandin pêşkêş kiribûn.¹ Lê li ser wî wextî re dem derbas bû û di vê pêvajoyê de tezên doktorayê hatine nivîsandin ku di wan bibliyografyayan de cih negirtibûn, herweha gelek tezên masterê jî li ser wan zêde bû. Ji ber wê me guncan dît ku em xebateke wêkî wan, lê ji wan berfirehtir amade bikin ku tezên master û yên doktorayê yên beşên kurdî yên hemû zanîngehên li Tirkîyeyê, yên di navbera salên 2012 û 2020an de hatine nivîsandin, bihundirîne. Ji ber ku em hêj di destpêka sala 2021an de ne, û tezên vê salê yên hatine parastin bi çend heban sîncordar in, me ew nekirine nav vê xebatê.

RÊBAZ

Me bi lêgerîna li ser *Navenda Tezên Perwerdeya Bilind a Tirkîyeyê* (bi awayê kurt û ji vir pê ve "YÖKTEZ") û bi lêkolîna li zanîngehan ev xebata pêk anî. Herwiha rêbaza pêşkêşkirina Bîbliyografyaya me ev e: Me li gorî biwaran tez kirine beş û di bin sernavên ku ew tez tekildar in ew pêşkêş kirin. Me tezên masterê û yên doktorayê cuda nixandî. Ewî li me tezên masterê dan, piştî jî yên doktorayê. Di bibliyografyayê de kategorîzekerîna me li gorî biwaran wusa ye: Bîbliyografya, civaknasî, çapemenî, dîrok, edebiyata berawirdî, edebiyata klasîk, edebiyata nû, edebiyata zarokan, ferhengnasî, folklor, jînenîgarî, perwerde, sînema, wergernasî û zimannasî. Me tezên ku bi zaravayên kurmançî, zazakî û soranî çap bûne cuda nenixandî, hemû bihev ve di bin navê tezên kurdî de hatine lîstekerî û nixandî. Ji ber ku li hin zanîngehan tezên kurdolojiyê bi tirkî hatine nivîsandin, me di xebata xwe de navê wan ên tirkî nivîsand. Xaleke din divê em behs bikin jî ev e; ji ber ku hin tez înterdîsîplîner in navê wan di bin ji yekî zêdetir kategoriyan de hatine nivîsandin.

NAVEROK Î NIRXANDIN

Me di vê xebatê de cih daye xebatên master û doktorayê yên pênc zanîngehan ku li hinekan tenê tezên masterê û li hinekan jî tezên master û doktorayê tene nivîsandin. Ev zanîngehên ku em behsê dikin ev in: *Zanîngeha Mardin Artuklu*, *Zanîngeha Dicle*, *Zanîngeha Bingöl*, *Zanîngeha Muş Alparslan* û *Zanîngeha Yüzüncü Yıl*.² Di nav van Zanîngehan de bernameyên Doktorayê li *Zanîngeha Bingöl* û ya *Dicleyê* heye. Hin Zanîngehên din jî hene ku xebatên Kurdî dimeşînin wekî *Zanîngeha Siirt* û *Munzurê*, lê li wan zanîngehan hêj tez nehatine nivîsandin.

Li gorî vê bîbliyografyayê, wekî ku li tabloya li jêr em dibînin heta niha li Zanîngeha Bingölê³ 71 tezên beşên kurdî hatine amadekirin ku 68 heb ji wan master in, 3 heb ji wan doktora ne. Li


- 1 Ji bo wan bîbliyografyayan lê bnr. Yakup Aykaç, "Bîbliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê yên li Tirkîyeyê (2011-2016)", *JMS*, 2/1, 2017, 119-132 û Yakup Aykaç û Şerif Güzel, Sinan Çakar, "Bîbliyografyaya Tezên Masterê yên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî (2011-2018)", *Şarkiyat* 11/2 (Tebax 2019), 1007-1043.
- 2 Me navên zanîngehan yên resen tercîh kir wekî ku li ser YÖKTEZê hatibû nivîsandin. Me navê zanîngehan di hemû tablo û îstatîstîkan de bi awayekî resen/tirkî nivîsandin. Ji ber vê yekê, li şûna Bingöl yan jî Çewlîgê me rasterast Bingöl nivîsî, herwiha yên din jî bi vî awayî ne.
- 3 Li Zanîngeha Bingölê digel beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Ziman û Edebiyata Zazakî jî heye. Di vê bîbliyografyayê de me ev herdu beş wek hev qebûl kirin û ji hev cuda nekirin. Lewma hejmarên ku bi tezên Zanîngeha Bingölê re têkildar in yekûna tezên kurmançî û zazakî ne, pêkve ne.

Zanîngeha Dicleyê 22 tez hatine amadekirin ku 12 heb ji wan master in û 10 heb tezên doktorayê ne, li Zanîngeha Mardin Artukluyê 149 tezên masterê, li Zanîngeha Muş Alparslanê 22 tezên masterê û li Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê 105 tezên masterê hatine amadekirin. Yanê di beşên kurdî de heta sala 2020an 13 tezên doktorayê û 356 tezên masterê xilas bûne û hatine parastin. Bi vî awayî hejmara hemû tezên ku hatine parastin dibe 369. Bi tevahî ev li ser tabloyê, li gorî sal û zanîngehên ku xwendekar jê derçûne wekî li jêr in:

	Zanîngeha Bingöl	Zanîngeha Dicle	Zanîngeha Mardin Artuklu	Zanîngeha Muş Alparslan	Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl
2012	-	-	3	-	-
2013	-	-	14	-	-
2014	7	-	18	-	-
2015	14	-	17	5	1
2016	3	3	19	2	15
2017	15	4	14	8	36
2018	9	-	21	3	10
2019	10	3	36	1	34
2020	10	2	7	3	9
Yekûn	68	12	149	22	105

Tablo 1: Hejmara tezên masterê yê beşên kurdî li gori sal û zanîngehan

Di grafîka li jêr de tezên masterê yê ku hatine amadekirin li gorî beşan hatine parvekirin û em rêjeya wan dibînin. Wekî em dibînin çar beş derdikevine pêş: Edebiyata nû bi rêjeya % 25 beşa yekem e ku herî zêde tezên masterê hatine amadekirin, piştî wê bi % 21 folklor, bi % 18 edebiyata klasîk û bi % 15 zimannasî tê. Rêjeya beşên din gelek kême ku ya herî nêzî van bi % 4 çapemenî ye.




Grafîk 1: Rêjeya tezên masterê li gorî biwaran

Li tabloya jêr em hejmara tezên doktorayê li gorî zanîngehan dibînin. Wekî em dibînin tenê li Zanîngeha Bingöl û Dicleyê tezên doktorayê hatine amadekirin û hejmara wan ya heta sala 2020an 13 ye.

	Zanîngeha Bingöl	Zanîngeha Dicle
2019	1	5
2020	2	5
Yekûn	3	10

Tablo 2: Hejmara tezên doktorayê yê beşên kurdî li gor sal û zanîngehan

Li grafîka jêr em rêjeya tezên doktorayê li gorî biwaran dibînin. Li vir zimannasî li pêş e. Piştî wê folklor, perwerde, dîrok û edebiyata klasîk bi rêjeya xwe pêş dikevin.



Grafik 2: Rêjeya tezên doktorayê li gorî biwaran

Hejmara tezên master û doktorayê li gorî biwaran li jêr xuya dike:

	Master	Doktora
Bibliyografya	4	-
Civaknasî	12	1
Çapemenî	19	-
Dîrok	6	2
Edebiyata Berawirdî	10	1
Edebiyata Klasîk	78	2
Edebiyata Nû	108	1
Edebiyata Zarokan	7	-
Ferhengnasî	5	-
Folklor	91	3
Jînenîgarî	9	-
Perwerde	14	2
Wergernasî	2	-
Zimannasî	63	4

Tablo 3: Hejmara tezên master û doktorayê li gorî biwaran

1. NAVÊN TEZÊN MASTERÊ LI GOR KATEGORÎYAN

1. BÎBLİYOGRAFYA

Atlı, Zafer, **Zeynelabîdîn Zinar: Jiyan, Berhem û Senifandina Xebatên Wî**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2018.

Başaran, Cahit, **Kürt Dilinde Sözlükler**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2014.

Can, Mutlu, **Bîblîyografyaya Kirmanckî (Zazakî) (1963-2017)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2018.

Ekici, Abdullah, **Zeynelabîdînê Amidî: Jiyan Berhem û Xebatên Wî yên Destnivîsî**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014.

1. 2. CIVAKNASÎ

Akıncı, Enes, **Peydabûna Nirxên Civakî û Vekolîna Wan di Hin Romanên Kurmancî yên Folklorîk de**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2019.

Ali Arif, Fakhir, **Çavkaniya Jînwarparêzî ya Barzan**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2017.

Anuk, Nevzat, **Behsê Tirkkerdişê Kurdan de Merkezêk: Enstîtuyê Cigerayîşê Kulturê Tirk**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.

Bülbül, Mikail, **Di Helbestên Cegerxwîn de Rengvedanên Têkiliyên Îqtidarî**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013.

Ergün, Zülküf, **Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2012.

Hassan Mawlood al-Bajalan, Hardi, **Di Helbestên Hemîn Mukiryani de Civaknasî**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Kanat, Yılmaz, **Batî kaynaklarında Zazalar ve Zazaca**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2019.

Karaaslan, Mehmet Salih, **'Hedersmord' li Swêdê 'Kuştina Namûsî' li Kurdistanê**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014.

Kerece, Fahri, **Di Çarçoveya Têgiha Neteweperwerîyê da Nirxandinek li ser Şêx Ubeydillahê Nehrî**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2018.

Özcan, Mulazım, **Di Salên 1980-2000an de li Tirkîyeyê Rewşa Ziman û Edebiyata Kurdî û Têkiliya Wan li gel Tevgerên Civakî yên Kurdan**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2018.

Ücar, Hatice, **Di Çîrok û Stranên Gelêrî yên Colemêrgê de Nasnameya Jin**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2019.

Saiwan Ahmed, Omar, **Edebiyatî Enfal le Govare Kurdiyekanî Nawçeyî Germiyan da (1992-2012)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2016.

1.3. ÇAPEMENÎ

Ali Mohammed, Ghalib, **Rola Yusufî di Çapemeniya Kurdî de**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Arslan, Mesut, **Di Dewra Osmaniyan de Veşangeriya Kitêbên Kurdî (1844-1923)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014.

Balta, Adem, **Rê û Rêbazên Nivisîna Nuçeyên Kurdî**, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2017.

Çetin, Süleyman, **Kovara Hawarê û Bandora Wê ya li ser Zimanê Kurdî**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2016.

Demiral Taher, Îde, **Perwerdeya Nirxên Çandî û Civakî di Kovangeriya Zarokan a Kurmançî-Latînî de (1980-2015)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2018.

Hikmat Ali Zada, Partiman, **Rolê Govara Kepir di Pêşxistina Çîroka Zarokan de**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2018.

Hussain, Hunar M., **Rollî Rageyandin le Nêzikkirdnewey Diyalêkte Kurdyekan, Torî Mîdyayî Rudawû be Nimûne**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.

Ismael Khalid Zebari, Rabeea, **Lêkolînek li ser Rexne ya Edebî (Kovara Peyv Weke Nûmûne)**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Kan, Ahmet, **Rojnameya Kurdistanê 1898-1902 (Analîza Naverokê)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2018.

Kanabi Taher, Barzan, **Bas û Xwas Le Manşetî Hewal Rojnamekanî Xebat, Kurdistanî Nûwe û Rojname: Be Numûne Lêkolîneweyekî Simantîkî û Pragmatîkî**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2018.

Karaaslan, Mehmet Salih, **'Hedersmord' li Swêdê 'Kuştina Namûsî' li Kurdistanê**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014.

Khidhir, Mohammed, **Ji bo Zarokan Çîrokên Ajalan (Mînak Çîrokên Kovara Heng 2001-2011)**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Majeed Muhammad, Ghareeb, **Weşangeriya Zarokan û Zimanê Ragihandinê: Mînaka Kovara Sivore**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2020.

Muhammed Mawlud, Qabeel, **Rola Rojname Bizav di Pêşxistina Helbesta Kurdî li Devera Behdînan**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Nori Omer, Salam, **Rolê Kovara Metîn di Pêşxistina Vekolînên Edebî de**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Othman Qader, Samad, **Zimanê Ragihandinê di Nuçeyên Rojname Elektronîk de**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Öztürk, İrfan, **Hîmên Helbesta Kovara Tîrêjê**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014.

Saleh Hussein, Nadhim, **Kovangeriya Zarokan li Başûrê Kurdistanê (Mînak: Kepir)**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2018.

Yonat, Mehmet, **Kovara Nûdemê û di Kovara Nûdemê de Şopên Surgunê**, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2015.

1.4. DÎROK

Adak, Reşat, **Di Serdema Meşrûtiyetê de Zanyarekî Kurd: Seidê Kurdî û Hizr û Xîtabên Vî Derheqê Hişmendiya Gelê Kurd de**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013.

Coşkun, Şûkran, **Berawirdkirina Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî û Şerefnameya Menzûm a Cegerxwîn**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Demir, Vejdi, **Kurdên Arî: Mît, Dîrok û Îdeolojî**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019..

Eyer, Ahmet, **Kurdên Merwanî di Tarîxu`l-Meyafarqîn a Îbnu`l-Ezraq de**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2016.

Kerece, Fahrî, **Di Çarçoveya Têgiha Neteweperweriyê da Nirxandinek li ser Şêx Ubeydillahê Nehrî**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2018.

Ulugana, Sedat, **Mîrektiya Bitlîsê di Êwra Evdal Xan de (1618-1664)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.

1.5. EDEBIYATA BERAWIRDÎ

Ceylan, Şehmuz, **Berawirdkirinek li ser Destana Memê Alan û Destana Odysseia**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2019.

Coşkun, Şûkran, **Berawirdkirina Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî û Şerefnameya Menzûm a Cegerxwîn**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Ertaş, Mustafa, **Mewlûda Heyderî (Şêx Muhammed Emînê Heyderî) û Berawirdkirina Wê bi Mewlûda Bateyî re**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2020.

Ibrahim Awla, Farman, **Di Edebiyata Kurdî ya Kevin û Nû da Erkên Rexneyî**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Ismael Ali, Saman, **Vebêjin di Navbera Romana "Navê Min Sor e" ya Orhan Pamuk û "Mîrnemeyê" Can Dost e**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Jameel Mohammed, Hawkar, **Binyadî Gêranewa le Dastanî Mem û Zinî Oskar Mann û Şanoyî Memê Alanî Ebdurehîm Rehmî Hekarî (Lêkolînewekî Berawirdkariyê)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2017.

Najeb Abdulrazaq, Jegr, **Binyatê Honerî di Dastana Zembîlfruş ya Feqiyê Teyran û Miradxanê Bayezidî da**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2017.

Shukur Mahmood, Imad, **Têgeh û Zaravayê Îrfanî di Helbestên Fexredîn Eraqî û Mihwî de**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Tanrikulu, Veysel, **Kürtçe Masallar ile Grimm Kardeşler Masallarının Motifler Açısından Karşılaştırılması**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbakir, 2017.

Yılmaz, Ferhat, **Berawirdkirinek li ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî**, Zanîngeha

Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.

1.6. EDEBIYATA KLASÎK

Abdulahq Salahaldin, Barzi, **Wêneya Helbestî di Helbestên Kurdî yên Mistefa Begê Kurdî da**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Ahmed Haji Abozaid, Bayar, **Rengvedana Edebê Folklorî di Şîrên Mela Xelîl Mişextî da**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2018.

Akboğa, Hasan, **Xelîfe Yûsif û Teqrîza Wî (Metn û Lêkolîn)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2017.

Akın, Abdurrahman, **Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî û Berawirdkirina Wê bi Mewlûda Mela Huseynê Bateyî re**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Akın, Erkan, **Mela Ehmedê Cizîrî'nin Gazellerinde Kullanılan Edebi Sanatlar**, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2017.

Arslan, Mehmet, **Mewlidê Mala Abdulkadir Muşeki (Metn û Tehlil)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2019.

Atmaca, İbrahim, **Xizna We'zan: Dîwançeya Hilmî (Şêx Ehmed Hilmîyê Dêrşewî) -Metn û Lêkolîn-**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2020

Awla Rasul, Luqîman, **Ciwankariya Peyvan di Helbestên Kurdî yên Salim de**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Aykaç, Seyfettin, **Mela Mehmûdê Tîruwayî û Ferhenga Wî ya Menzûm (Metn û Lêkolîn)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2016.

Aykaç, Yakup, **Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015.

Bakırhan, Cihat, **Mele Nurullahê Godîşkî'nin 'Çenta Yetîman' Adlı Eserinin Transkripsiyonu, Türkçeye Çevirisi, Tahlil ve Tenkidi**, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2017.

Berouki Milan, Murat, **Hêmanên İranî yên Dîrokî û Mîtolojîk di Mem û Zîn'a Xanî û Dîwana Melayê Cizîrî de**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019

Beyter, Önder, **Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (Metn û Lêkolîn)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013.

Cırık, Mehmet Emin, **Weliyên Kurd di Nefahatu'l-Unsê de**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Çalışır, Rojbir, **Destana Rustemê Zal (Metin-lêkolîn)**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Çelik, Murat, **'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bazîdî**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.

Çetin, Ramazan, **Şêx Mûsayê Şêxanî Gundikî û Berhemên Wî yên Menzûm**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Çiftçi, Metin, **Eqîdenameyo Zazakî yê Mehemedê Hezanîyî (Metno Transkrîbekerde, Wekentîş û Açarnameyîş)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015.

Dağılma, İbrahim, **Mewlîdê Xasî û Hetê Me'na ra Wekentîşê Mewlîdî**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2017.

Delshad Saleh, Warin, **Bekir Begê Erizî (Jiyan û Berhem)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.

Demir, Mehmet Emin, **Şîret di Helbesta Kurmancî ya Klasîk da: Nimûneya Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mele Xelîlê Sêrtî û Seyîd Eliyê Findikî**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Demir, Yunus, **Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî): 'Meğmuru'd-Dewawîn'(Metn û Lêkolîn)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Deniz, Muhammed İkbâl, **Jiyana Seyîd 'Eliyê Findikî û Dîwana Wî**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2017.

Durmuş, Mahmud, **Dîwançeya Mela Edullahê Qursincî (Lêkolîn û Metn)**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2019.

Ekici, Abdullah, **Zeynelabidînê Amidî: Jiyan Berhem û Xebatên Wî yê Destnivîsî**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2014.

Eminoğlu, Nevzat, **Nêrînek Gelemperî li Mîrektiya Hîzanê: İlm û Edebiyat**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2016.

Erdoğan, Mehmet, **Mewlîd û Eqîdeyê Mela Muhammedê Muradanî**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2020.

Ergün, Zülküf, **Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2012.

Ertaş, Mustafa, **Mewlûda Heyderî (Şêx Muhammed Emînê Heyderî) û Berawirdkirina Wê bi Mewlûda Bateyî re**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2020.

Ertekin, Nurettin, **Tesewif di Dîwana Şeyda de**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2018.

Gezer, Semih, **Dîwana Mela Yasîn Yusrî (Metn û Lêkolîn)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2015.

Gider, Ahmet, **Molla Muhammed Kavarî Dîvânî'nda Din ve Tasavvuf**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2017.

Gözetin, İbrahim, **Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wi ya Newcû'l-Enam**, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2015.

Güllü, Zeydin, **Transkrîpsiyon û Vekolîna Kitab-û Ahmedîye'yê**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2019.

Gümüş, Nezir, **Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn)-Metn û Lêkolîn-**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

Heider Farhan, Hawkar, **Xemilandina Felsefeya Oldariyê di Helbestên Mehwi de**, Zanîngeha

Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

Hesan Kareem, Keywan, **Eşq li cem Nalî**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2017.

İli, Aynur, **Hunerên Edebî di Dîwana Hadî (Seydayê Licî) de**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2019.

İlhan, Ziver, **Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013.

İnci, Veysi, **Îqtîbas di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de (Helbestên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî û Melayê Bateyî)**, Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Wan, 2020.

Jahany, Parviz, **Leyla û Mecnûna Sewadî (Metin-Lêkolîn-Şîrove)**, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.

Karak, Mehdi Zana, **Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)**, Mardin Artuklu, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2020.

Karaman, Cevdet, **Ehmed Hîlmî Elqoxî û Berhema Wî ya Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî**, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş, 2017.

Aykaç, Yakup, **Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2020.

Tarduş, İbrahim, **19. Yüzyıl İngiliz Seyahatnamelerinde Kürtler**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2020.

2.4. EDEBIYATA NÛ

Filiz, Mehmet Şirin, **Üç Kürt (Kurmanca) Romanında Üç Özgürlük Anlatısı (Emekçi, Kürt, Kadın)**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2020.

2.5. EDEBIYATA BERAWİRDÎ

Jahany, Parviz, **Berawirdkirina Beyta Mem û Zînê ya Kurmancî (Varyanta Oskar Mann) û Mem û Zîna Mîrza ya Hewramî**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2020.

2.6. FOLKLOR

Atlı, Hikmettin, **Di Vegotinên Gelêrî de Guherînên di Navbera Civaî Etno-Dînî de (Nimûneya Kurdên Elewî û Kurdên Ezîdî)**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2020.

Çifçi, Tekin, **Adıyaman ve Çevresinde Halk İnançları ve Halk Hekimliği**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2019.

Subaşı, Kenan, **Kürtçe (Kurmanci) Masalların Anlatı Tipolojisi**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2019.

2.7. PERWERDE

Kurt, Şehmuz, **Türkiye’de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018)**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2020.

Salam Khalid, Hewa, **İkinci Dil Olarak Kürtçe öğretimi**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2019.

2.8. ZIMANNASÎ

Açar, Zafer, **Tesîra Helwestê li ser Tercîha Ziman di Jiyana Kurdîzanan de - Nimûneya Wanê**, Zanîngeha Bingöl, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg, 2019.

Babayiğit, Mehmet Veysi, **Kürtçe, Türkçe ve İngilizcedeki Atasözleri – Bağlamsal Bir Karşılaştırma**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civaî, Diyarbekir, 2020.

Kırkan, Ahmet, **Zazacanın Fonetik Açısından İncelenmesi; Kuzey, Güney ve Merkez Zazacasının Karşılaştırılması**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbekir, 2019.

Yonat, Mehmet, **Kurmancî Kürtçesi Ağzıları Hakkında Sosyolinguistik Bir İnceleme (Muş, Adıyaman, Şırnak Örneği)**, Zanîngeha Dicle, Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbekir, 2019.

ENCAM

Me ev gotar li ser tezên Master û Doktorayê nivîsand ku ji 2012an heta 2020an li beşên Kurdî yên Zanîngehên tirkîyê hatine nivîsandin û me ew bi awayê bîbliyografîk li gorî biwaran kategorîze kirin. Me dît ku digel tezên masterê, tezên doktorayê jî ji 2018an vir ve li ser wan tezan zêde bûne. Em dibînin ku tezên curbicur û înterdîsîplîner di beşên kurdî de hatine amadekirin. Ew dîsîplînen ku em behs dikin ew in ku hinek tez dikevin nav du, sê serenavan: Bîbliyografya, civaknasî, çapemenî, dîrok, edebiyata berawirdî, edebiyata klasîk, edebiyata nû, edebiyata zarokan, ferhengnasî, folklor, jînenîgarî, perwerde, sinema, wergernasî, zimannasî. Digel ku xwendekar ji van beşan bixwe mezûn nebûne, dîsa jî karibûne li ser curbicur biwaran tezan hazir bikin û ev jî înterdîsîplîneriya kurdolojiyê nîşan dide, ku jixwe kurdoloji hemû beşên mirovî wekî me li jor hejmartî hildide nav xwe.

Me di encama nîrxandinên xwe de dît ku heta niha herî zêde tez bi 149 tezan li Zanîngeha Artukluyê hatine amadekirin, piştî wê bi 105 tezan Zanîngeha Yüzüncü Yıl tê, ku hemû tezên hatine amadekirin yên masterê ne.

Herwiha ji 2019an pê ve tezên doktorayê li Zanîngeha Dicle û Bingölê tene amadekirin û heta niha 13 tezên doktorayê di van herdu zanîngehan de hatine parastin. Ev jî xaleke girîng e ji bo beşên kurdolojiyê yên li zanîngehên Tirkîyeyê.

Me dît ku li gorî kadroyên mamosteyan û hejmara tezan li Zanîngeha Yüzüncü Yılê anormalîyek dertê. Kadroya herî berfireh ji aliyê mamosteyan ve Mardin Artuklu ye û hejmara tezan li wir zêde ne, lê belê li Yüzüncü Yılê hejmara mamosteyan kême û herwiha bernameya masterê piştî zanîngeha Bingöl û Muşê jî vebû, lê ji aliyê hejmara tezan ve li pêş e û piştî Artukluyê cî girtiye. Ew jî ji aliyê îstatîstîkê ve nîşan dide ku korelasyoneke negatîf li Yüzüncü Yılê heye ku paşerojê em ê encamên vê yekê bibînin.

Me li gorî biwaran jî tez nîrxandin û me dît ku di masterê de bala xwendekaran herî zêde çûye li ser edebiyata nû ku 108 tezên masterê di vê biwarê de hatine nivîsandin.⁴ Piştî wê bi 91 tezan folklor, bi 78 tezan edebiyata klasîk û bi 63 tezan jî zimannasî tê. Em dibînin ku li gorî van her çar beşan hejmara tezên li ser biwarên dinê hatine amadekirin gelek kême in. Di çapemeniyê de 19 tezên masterê, di perwerdeyê de 19, di civaknasîyê de 12, di edebiyata berawirdî de 10, di jînenîgarî de 9, di edebiyata zarokan de 7, di dîrokê de 6, di ferhengnasîyê de 5, di bîbliyografîyê de 4, di sînemayê de 2 û di wergernasîyê de 2 tez hatine amadekirin.

Di doktorayê de xwendekaran herî zêde bala xwe daye zimannasîyê ku li ser vê biwarê 4 tez hatine amadekirin. Piştî zimannasîyê bi 3 tezan folklor û bi 2 tezan edebiyata klasîk, dîrok û perwerde tên. Di beşên din de, wekî civaknasî, edebiyata nû, edebiyata berawirdî, ji her yekî wan 1 tez hatiye amadekirin.

4 Wekî me li destpêka gotarê jî diyar kiribû tezeke ku înterdîsîplîner be dikare di bin du carna jî sê serenavan de cih bigire. Wekî mînak tezeke ku di bin "edebiyata klasîk" de be dikare di bin "dîrok"ê de jî cih bigire. Lewma hejmarên ku me li gorî biwaran diyar kiriye ji hejmara yakûn ya hemû tezan zêdetir e.

Em hêvîdar in ku ev xebata me dê kêrî lêkolîneran were ku bizanibin ka di kîjan salê û di çi biwarê de tezên kurdî hatine amadekirin û bi hêsanî xwe bigihînin wan.

JÊDER

Aykaç, Y. “Bibliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê yên li Turkiyeyê (2011-2016)”, *JMS*, c. 2/1, (2017), r. 119-132.

Aykaç, Y., Güzel, Ş., Çakar S., “Bibliyografyaya Tezên Masterê yên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî (2011-2018)”, *Şarkiyat* 11/2 (Tebax 2019), r. 1007-1043.

YÖKTEZ, Yükseköğretim Kurulu Başkanlığı Tez Merkezi. “Tez Sorgu”. Pêwendî 5 Nîsan 2021. <https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi>



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2021

Sayı/Hejmar/Issue: 3

e-ISSN 2717-8315

Rüpel/Sayfa Page: 101-117



BERAWIRDA ŞİRETÊN KU DI HELBESTÊN MELAYÊ CIZÎRÎ Û EHMEDÊ XANÎ DA DERBAS DIBIN

Yasin DURAN

KURTE

*Şîret amûrek e ku di her qada jiyanê da bi armanca duristkirina xeletîyan, xilaskirina xerabîyan û islehkirina fêhlên xirab ên mirovan tê bikaranîn. Yek ji qadên jiyanê ku tê da şîret tene bikaranîn jî edebiyat e. Di vê lêkolînê da şîretên di helbestên du helbestvanên girîng ên edebiyata kurdî ya klasîk hatîne berawirdkirin. Yek ji van helbestvanan Melayê Cizîrî ye ku di dîroka edebiyata klasîk a kurdî da yekem car *dîwaneka mureteb nivîsandiye û pêşengê edebiyata klasîk a kurdî ye. Yê din jî Ehmedê Xanî ye ku piştî Melayê Cizîrî derketiye holê û li gel wî bûye sitûnek ji du sitûnên qayîm ên edebiyata kurdî ya klasîk*. Armanca lêkolînê bi rêbaza berawirdkirinê di helbestên Mela û Xanî da tespîtkirina xalên hevpar û cuda yên şîretên wan e. Di vê lêkolînê da pêşiyê li ser *têgeha şîretê, bikaranîna wê di edebiyatê da* hatiye sekinîn paşê *jî piştî kurte* agahîyeka dîwanên Mela û Xanî, şîretên ku di helbestên wan da wek şîretên hevpar, şîretên tenê *di helbestên Mela da û şîretên tenê di helbestên Xanî da di bin sê* serenavan da hatîne polînkirin. Di dawiyê da jî li gorî zanyariyên van beşan encamek hatiye amadekirin. Wek encam hatiye dîtin ku Mela û Xanî ku hem helbestvan in hem jî digel helbestvaniya xwe *jî* alim in û di helbestên xwe da cih dane şîretan. Mela bi piranî li ser meseleyên *hûndirîn ên* mirovan, Xanî jî hem li ser meseleyên *hûndirîn ên* mirovan hem jî li ser meseleyên *karûbarên dinyayê û pirsgirêkên civakî* şîret dane.*

Peyvên Sereke: Şîret, helbest, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî

101

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatîne/Geliş Tarihi/Received: 18.04.2021
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/:
26.05.2021
Yasin Duran. MEB, Xwendevanê Doktorayê,
Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Zanîngeha
Bingölê.
e-mail: yasinduran30@gmail.com
Orcid: 0000-0002-7449-1194

Atf/Citation: Duran, Y. (2021). "Berawirda
Şîretên ku di Helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê
Xanî da Derbas Dibin", Kurdiyât, 3, 101-117.

Comparison of advice in the poems of Melayê Cizîrî and Ehmedê Xanî

SUMMARY

Advice is a tool that is used in every area of life with the aim of correcting mistakes, correcting evils and correcting the wrongdoings of people. One of the areas in which advice is used is literature. In this study, the advices in the poems of two important poets of classical Kurdish literature were compared. One of these poets is Melaye Cizîrî, who for the first time in the history of Kurdish classical literature has written a full dîwan and is the pioneer of Kurdish classical literature. The other is Ehmedê Xanî, who emerged after the Melayê Cizîrî and with him became one of the two oldest pillars of classical Kurdish literature. The aim of this study is to identify the common and different points of their advice through the method of comparison in the poems of Mela and Xani. This study first focuses on the concept of advice and its application in the literature. Later, after a short explanation of the dîwan of Mela and Xanî, the advice in their poems was collected under three headings: The common advice in the poems of both poets, the advice contained only in Mela's poems and only in Xani's poems. Finally, a conclusion has been prepared based on the knowledge of these sections. As a result, it has been determined that besides being a poet, Mela and Xanî, who were also scholars, included advice in their poems. While Mela mostly gives advice about the individual inner world of the human being, Xanî gives advice both on the individual inner world of the human being and on daily world affairs and social problems.

Keywords: advice, poem, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî

Melayê Cizîrî ve Ehmedê Xanî'nin Şiirlerinde Geçen Öğütlerin Karşılaştırılması

ÖZET

Öğüt, yanlışları düzeltmek, kötülükleri ortadan kaldırmak ve kötü davranışları ıslah etmek amacıyla hayatın her alanında kullanılan bir araçtır. Öğüdün kullanıldığı hayat alanlarından bir tanesi de edebiyattır. Bu çalışmada da Kürt edebiyatının iki önemli şairinin şiirlerindeki öğütler karşılaştırılmıştır. Bu şairlerden biri Klasik Kürt Edebiyatı tarihinde ilk defa müretteb bir divan yazmış olan ve bu alanda Klasik Kürt Edebiyatının öncüsü olan Melayê Cizîrî'dir. Diğeri ise Melayê Cizîrî'den sonra ortaya çıkan ve onunla birlikte Klasik Kürt Edebiyatının iki sağlam sütunundan biri haline gelen Ehmedê Xanî'dir. Bu çalışmanın amacı karşılaştırma yöntemini kullanarak Mela ve Xanî'nin şiirlerinde geçen öğütlerin ortak ve farklı yönlerini tespit etmektir. Bu çalışmada öncelikle öğüt kavramı, bu kavramın edebiyatta kullanımı üzerinde durulmuştur. Daha sonra Mela ve Xanî'nin divanları hakkında kısa bir bilgilendirme yapılmış ve akabinde bu iki şairin şiirlerinde geçen şiirler, iki şairin de şiirlerinde geçen ortak öğütler, sadece Mela'nın şiirlerinde geçen öğütler ve sadece Xanî'nin şiirlerinde geçen öğütler olmak üzere üç başlık altında sınıflandırılmıştır. Son kısmında ise önceki bölümlerde bulunan bilgiler ışığında bir sonuç kısmı hazırlanmıştır. Sonuç olarak görülmüştür ki hem Mela hem de Xanî hem şair hem de şairliklerinin yanında aynı zamanda âlim birer şahsiyettir ve şiirlerinde öğütlere yer vermişlerdir. Mela daha çok insanın iç dünyasına yönelik konularda öğüt verirken Xanî hem insanın iç dünyasına yönelik hem de günlük dünya işleri ve toplumsal sorunlar konusunda öğütler vermiştir.

Anahtar Kelimeler: öğüt, şiir, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî

DESTPÊK

Mirov, di jîyana xwe da hin caran yan bi zanebûn yan jî beyî ku haya wî jê hebe rêya xwe şaş dike û xeletîyan dike. Di van rewşan da pêdivî bi hin tiştan heye ku wan kesên rêya xwe şaş kirî û xeletî kirî hişyar bike û wan ji xeletîyan xilas bike. Şîret jî amûrek e ku bi van armancan di her qada jîyanê da tê bikaranîn. Yek ji qadên jîyanê ku tê da şîret tene bikaranîn jî edebiyat e. Di edebiyatê da li ser şîretan cureyeka serbixwe ya bi navê pendname (şîretname) jî derketiye holê ku armanca wan şîretdan e. Lê di edebiyatê da; ne tenê di pendnameyan da heye, helbestvanan di helbestên xwe yê din da jî cih dane şîretan.

Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî du helbestvanên gelekî girîng ên edebiyata kurmancî ya klasîk in. Melayê Cizîrî bi dîwana xwe ya mureteb a bi navê *Dîwana Melayê Cizîrî*, Ehmedê Xanî jî bi berhemên xwe yê bi navê *Mem û Zîn*, *Nûbihara Biçûkan*, *Eqîdeya Îmanê* û *Dîwan* di nav edebiyata kurdî ya klasîk da bi navûdeng bûne. Di vê lêkolînê da li ser dîwanên her du helbestvanan hatiye sekinîn. Şîretên di nav helbestên wan ên ku di dîwanên wan da cih digirin hatîne tespîtkirin, polînkirin, nirxandin û berawirdkirin. Armanca lêkolînê bi rêbaza berawirdkirinê di helbestên Mela û Xanî da tespîtkirina xalên hevpar û cuda yê şîretên wan e.

Ji bo helbestên Melayê Cizîrî, dîwana wî ya ji aliyê Selman Dilovan¹ ve hatiye amadekirin û di nav weşanên Nûbiharê da hatiye weşandin wek çavkanî hatiye girtin û li ser helbestên di wê dîwanê da cih digirin lêkolîn hatiye kirin. Ji bo helbestên Ehmedê Xanî, dîwana wî ya ji aliyê Kadri Yıldırım² ve hatiye amadekirin û di nav weşanên Avestayê da hatiye weşandin û şerha dîwana wî ya ji aliyê Abdurrahman Durre ve hatiye nivîsîn û di nav weşanên Avestayê da hatiye weşandin wek çavkanî hatiye girtin û li ser helbestên di wan her du berhemên da cih digirin lêkolîn hatiye kirin. Di nav lêkolînê da cihê beytên dîwanê wiha hatine nîşandan: (25.b4.16). Di vê derê da 25: hejmara helbestê, b4: hejmara rêza beyt an bendê û 16: hejmara rûpela dîwanê nîşan dide.

Nesîhet/Pend/Şîret/Amoj

Peyva nesîhet peyveka erebî ye û ji peyva nush a ku tê wateyên “xwerû, xalisbûn, dûrbûn ji xirabîyê, xwedîbûna inyeta baş, xwastina qencîya kêsên din” hatiye çêkirin û di ferhengê da di wateya hewla dabinkirina qûsur û xetayên kesekî din, şîretkirin, ji bo teşwîqa başîyê û lêvekirina kesekî/ê ji xirabî kirinê, rênîşandana kesekî di derbarê tiştên ji bo wî xirab û mifa tê bikaranîn³. Peyva pend jî peyveka farisî ye û tê wateya “rê” ango “penddan”, tê wateya rê nîşandanê⁴. Di kurmancîyê da jî li hemberî peyvên nesîhet û pend pêyvên şîret û amoj jî tene bikaranîn. Di ferhengê da peyva amoj tê wateyên “perwerde, nesîhet, şîret û şêwr” û şîret jî tê wateya nesîhetê⁵. Ango nesîhet, pend, şîret û amoj çar peyv in ku bi zimanên cuda ji bo gotinên xweşik ên ku rêya baş nîşanî mirovan dide û wan ji xeletîyan dûrdixe tene bikaranîn.

Şîret di baweriya Îslamê da gelekî girîng e. Ewqas ku di hedîseka xwe da cenabê Pêxember, dîni wek şîret pênase dike û dibêje: “Dîn nesîhet e”⁶ Xweda teala jî Qur’ana Kerîm ji bo kesên teqwa wek şîret pênase dike⁷ û armanca virêkirina Qur’anê bo mirovan jî wek şîretbûn pênase dike⁸ ji ber vê yekê jî emrê şîretkirinê li Pêxemberê xwe dike⁹. Ji ber vê girîngiya şîretê hemû mi-

1 Selman Dilovan, *Dîwan-Melayê Cizîrî*. Çapa Duyem. (Stenbol: Weşanên Nûbihar, 2012).

2 Kadri Yıldırım, *Dîwan- Ehmedê Xanî Külliyyatı IV*. (İstanbul: Weşanên Avesta, 2014).

3 Mustafa Çağrı, “Nasihah”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi* (Ankara: TDV Yayınları, 2006), 32/408-409

4 nyildirim.wordpress.com, “Fars Öğüt Edebiyatı” (24 Nisan 2020).

5 Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî – Tirkî*. (Stenbol: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, 2013). 41/1786

6 ansar.de/buhari, “Kitabul İman”, (26 Nisan 2020).

7 Hayat Kitabı Kur’an (Gereççeli Meal-Tefsir), Mustafa İslamoğlu, (İstanbul: Düşün Yayıncılık, 2016), Al-î İmran 3/ 138.

8 A’raf 7/ 2.

9 Nisa 4/ 63.

silman jî şîretkirinê ji xwe ra wek peywireka jîndarî û emrê dînê xwe dipejirîn.

Şîretname di Edebiyatê da

Xweda di Qur'ana Kerîm da ji misilmanan dixwaze ku gava ew rastî xeletîyekê hatin wê xeletîyê sererast bikin¹⁰. Ji ber vê yekê misilman xwe ji bo sererastkirina xeletîyan berpirsyar dibînin û şîret jî amûrek e ku xeletîyan sererast dike. Ev amûr di hemû qadên jîyanê da derdikeve pêş. Yek ji van qadên jîyanê jî edebiyat e. Helbestvan bi piranî kesên hestiyar in û bi pirsgirêk û xeletiyên civaka xwe ve eleqedar in û bi rêya hunera xwe hindî ji wan tê dixwazin van pirsgirêkan hel bikin û xeletîyan durist bikin. Ji ber vê yekê ji bo pêkanîna civateka hestiyar a ku ji kesayetên bi exlaq û durist pêk tê di hemû çandan da berhemên ku ji şîretan pêk tên hene¹¹. Îbn Hazm, şîretan dike du beş: Yek şîreta aşkere û rasterast ya din jî şîreta veşartî û neyekser¹². Di edebiyatê da ji wan berhemên ku bi qesta şîretdanê hatine nivîsîn ra pendname, nesîhetname tê gotin. Em dikarin van cure berheman li gorî dabeşkirina Îbnî Hazm di nav şîretên aşkera û rasterast binirxînin. Lê ji bilî pendnameyan (nesîhetnameyan) jî helbestvan hin caran di nav helbestên dîwan û dîwançeyên xwe da jî bi awayekê veşartî û neyekser şîretan didene xwînerên xwe.

Nesîhetname (pendname), bi gelemperî berhemên exlaqî û şîretker in. Di nav civatên misilmanan da gelek girîngî bi bicihanîna emrên Xweda û Pêxemberî tê dayîn. Ji ber vê yekê jî nivîskar û helbestvanan bi ayet, hedîs, gotinên pêşîyan, metelok û wecîzeyan şîret dayîne xwînerên xwe¹³. Wek encam di pendnameyan (nesîhetname) armanca esil ew e ku bal û berê mirovan bide jiyareka ku wek îdeal tê pejirandin. Ji bo ku ev jiyara îdeal çêbibe jî hewil dide ku exlaqê mirovan xweş bike¹⁴. Taybetîyeka şîretnameyan jî ew e ku berhem di kîjan serdemê da hatibe nivîsîn, agahiyên derbarê wê serdemê, di xwe da dihevine. Herwiha panoramaya exlaqî û civakî ya hawirdora ku berhem tê da hatiye nivîsîn jî radixe ber çavan¹⁵. Ji ber vê yekê bi vekolîna berhemeka pendname (nesîhetname) mirov dikare hin rewşên exlaqî yên civaka nivîskarî ya serdema berhem lê hatiye nivîsîn hîn bibe.

Di edebiyatê da berhemên ku ji bo şîretkirinê hatîne nivîsîn wek nesîhetname (pendname) an sîyasetname derdikevin pêş. Her çend hem pendname hem jî sîyasetname bi armanca xwe ya şîretkirinê hevpar bin jî bi muxatabên xwe ji hev cuda dibin. Sîyasetname bi taybet ji bo ku şîretan li hukumdarên bike hatine nivîsîn lê pendame ji bo ku şîretan li kesan yan jî li hemû xelkê bike hatine nivîsîn¹⁶. Edebiyata şîretan an berhemên ku di nav xwe da şîretan dihevinin xwedî dîrokeka gelekî kevnar in. Hêj di dewra Eşkanîyan (b.m. 256- p.m.224) û Sasanîyan (p.m. 224-651) da di edebiyata Farisan da berhemên şîretan hatine nivîsîn¹⁷. Ji xwe edebiyata farisan di vî warî da gelekî dewlemend e. Di edebiyata farisan da berhema şîretan a herî bi nav û deng *Pendnameya Ferîduddînê 'Ettar (1120-1221) e*¹⁸. Di serdema Îslamê da ji bilî berhema Ferîduddînê 'Ettar, *Pendname, Bostan û Gulistan a Se'dîyê Şîrazî, Mesnewî ya Mewlana Celaleddînê Rûmî, Baharîs-*

10 Al-î İmran 3/ 104, 110, 114 hwd

11 İskender Pala, "Nasihatname". *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi* (Ankara: TDV Yayınları, 2006), 32/409-410.

12 Musa Balci, İslâm Öncesi Fars Öğüt Edebiyatı, (Erzurum: Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Doktora Tezi, 2013), 175.

13 Pala, "Nasihatname".

14 Balci, İslâm Öncesi Fars Öğüt Edebiyatı, 174.

15 M. Zahir Ertekin, "Analizler li ser Guldana Hezîn di Çarçoveya Şîretnameyên Kurdî de", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* 2/2 (2016), 62-86.

16 Ayvakti, Alim Yıldız, "Nasihatname Pendname Ya da...", (27 Nisan 2020).

17 nyildirim.wordpress.com, "Fars Öğüt Edebiyatı"

18 Balci, İslâm Öncesi Fars Öğüt Edebiyatı, 110.

tan a Molla Camî¹⁹, mînakên girîng ên edebiyata farisan in. Di nav edebiyata ereban da jî gelek berhemên şîretan yê hatîne nivîsîn. *Adâbû'l-Mûlûk* a Ebû Mansûr es-Sealîbî, *Nasîhatû'l-Mûlûk* a Mawerdî, *Nasîhatû'l-Mûlûk* a Îmâm-î Xezalî, *Sîracû'l Mulûk* a Turtûşî mînakên girîng ên siyaset-nameyên edebiyata erebî ne²⁰. Di edebiyata tirkî da jî *Risâletu'n-Nushiyye* ya Yunus Emre, *Kutatg û Bîlîg* a Yusuf Has Hacîp, *Ferhengnâme-i Sa'dî* ya Hoca Mesud, *Maarifname* ya Sinan Paşa, *Hayriyye* ya Nabi û *Lutfiyye* ya Sünbülzâde Vehbî mînakên girîng ên şîretnameyan in²¹.

Helbestvanên kurd jî wekî cîranên xwe yê ereb, faris û tirk hewil daye ku bi rêya helbestên xwe rêberiyê bo gel û xwînerên xwe bikin. Ji ber vê yekê wan jî di gelek helbestên xwe da cih daye şîretan. Her çend ku di edebiyata kurdî ya klasîk da berhemeke mureteb a helbestkî yan pexşan wekî pendname heta niha nehatibe tesbîtkirin jî mînakên nesîhetnameyan (pendname) di gelek dîwan û dîwançeyên kurdî da hene. Di edebiyata kurdî da cihdana şîretan di helbestên xwe da bi Baba Tahirê Uryan dest pê dike²² ku helbestvanekê herî kevnarê kurdan e. Ji bilî Baba Tahirê Uryan gelek helbestvanên din jî di berhêman xwe da cih daye şîretan. Wek mînak, Îsmailê Bazîdî (1655-1710) di berhema xwe ya bi navê *Gulzarê* da, Mela Xelîlê Sêrtî (1750-1843) di berhema xwe ya bi navê *Nehcu'l-Enamê* da, Şêx Muhemmedê Kerbelayî (m. 1939) di berhema xwe ya bi navê *Mîrsadu'l-Etfalê* da, Şêx Muşerref Xînûkî (1926-2008) di helbestên xwe yê Kurmancî da li ser dîn û exlaqî sekinîne û şîret li gelê xwe û feqîyên xwe kirine²³. Ji bilî van di *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî, *Dîwançeya Şîretî* ya Şêx Mûsayê Şêxanî, *Pendname* ya Cegerxwîn, *El-Kelamu'l-Waffî fî Ekamî's-şûffî* ya Şêx Mûsayê Şêxanî, *Guldan û Gulzar* a Mele Husnî Hezîn²⁴, *Eqâidname* ya Mela Nesreddînê Zoqî, *Fiqihname* ya Mela Abdulcelîlê Botî, *Gulzar* a Şêx Tahirê Şûşî²⁵, da jî şîret cih digirin. Her wisa helbestvanên wekî, Ehmedî Korî Mukrîyanî, Êl Beg Caf, Hecî Qadirê Koyî²⁶, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî, Seyîd Elîyê Findikî, Mela Ehmedê Nalbend û hwd. di hin helbestên xwe da cih daye şîretan. Ji bilî helbestan di metnên pexşan da jî nivîskarên kurd cih daye şîretan. Bi taybet di pexşanên rewşenbîrên kurd ên dawîya Împaratoriya Osmanîyan da şîret hene. Di van metnan da li ser rewşa kurdan a paşvemaî tê sekinîn û ji bo pêşveçûna wan şîret li kurdan tînin kirin. Se'îdê Kurdî, Kerkûklû Necmeddîn, Doktor Abdullah Cevdet, Silêmanî Abdulkêrîm, Celadet Elî Bedirxan ji wan kesan in ku di metnên xwe da cih daye şîretan²⁷. Ango ji Baba Tahirê Uryan heta roja me kurdan jî wekî gelên din ji bo ku rêya baş nîşanî xwînerên xwe û gelê xwe bidin û wan ber bi kesayet û civakeka îdeal bibin di helbest û pexşanên xwe da cih daye şîretan.

Dîwana Melayê Cizîrî û Dîwana Ehmedê Xanî

Melayê Cizîrî, yekem helbestvanê kurd e ku bi terzê edebiyata klasîk a rojhilatî dîwaneka bi kurdî nivîsandîye²⁸. Her çend derbarê serdama jiyana wî da nêrînên cuda hebin jî li gorî nêrîna

19 M. Emin Demir, Şîret Di Helbesta Kurmancî Ya Klasîk Da: Nimûneya Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mele Xelîlê Sêrtî û Seyîd Elîyê Findikî. (Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanen Zindî, Teza Lîsansa Bilind, 2019), 8.

20 Ayvaktî, Alim Yıldız, "Nasihatname Pendname Ya da..."

21 Pala, "Nasihatname".

22 M. Zahir Ertekin – Bedrettin Basuğuy, "Pend û Amojgarî Di Dîwana Şêx Ehmedê Xanî de: Helbesta Zahidê Xelwetnişîn wek Nimûne". 2. *Uluslararası Ahmed-i Hânî Sempozyumu* (İslam Düşüncesinde İslam), Zanîngeha Ağrı İbrahim Çeçen, (2018), 149.

23 Nesim Sönmez, "Di Nûbihara Piçûkan da Şîretname". 2. *Uluslararası Ahmed-i Hânî Sempozyumu* (İslam Düşüncesinde İslam), Zanîngeha Ağrı İbrahim Çeçen, (2018), 51.

24 Demir, Şîret Di Helbesta Kurmancî Ya Klasîk Da, 11-12.

25 Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De*, (İstanbul: Weşanên Nûbihar, 2019), 147/340-342.

26 Ertekin, "Analîzê li ser Guldana Hezîn di Çarçoveya Şîretnameyên Kurdî de", 69-70.

27 Ertekin, "Analîzê li ser Guldana Hezîn di Çarçoveya Şîretnameyên Kurdî de", 72.

28 Abdurrahman Adak, *Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* (İstanbul: Weşanên Nûbihar, 2014), 208.

ku îro bêtir tê pejirandin Mela di sedsala XVI û XVIIan da jiyaye. Hevdemê desthilatdarê Cizîra Botan, Şerefxanê kurê Mir Ebdal e²⁹ û di bin hîmayeya wî da maye. Mela, di edebiyata kurdan da yekem helbestvan e ku di bin hîmayeya desthilatdarekî da dîwanek nivîsandîye. Mela wek berhem dîwanek û ji derveyî dîwanê jî çend menzûme nivîsandine lê helbet ji van berhemana ya herî girîng û pê tê nasîn dîwana wî ye. Dîwana Mela di dîroka edebiyata kurdî da yekem dîwan e ku bi awayekî muretteb hatiye nivîsîn. Di nav kurdan gelek berbelav e, gelek destxet, çap, şerh û wergerên dîwanê hene³⁰. Nêzîkî bîst nusxeyên dîwanê hene, ji wan nusxeya herî kevin wek nusxeya Muhammed Tayyar Paşayê Amêdî ya ku di 1815an da hatiye îstînsaxkirin tê zanîn³¹. Dîwan, cara ewil ji aliyê Martin Hartmann ve di 1904an da hatiye çapkirin. Piştî vê salê li gelek cihan hem bi tîpên erebî, hem jî bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Herwiha bi zimanên erebî, farisî, tirkî û kurdî gelek şerhên vê dîwanê hatine kirin. Ji bilî wan xebatan di zanîngehan da jî gelek tez, meqale û teblîx hem li ser Melayê Cizîrî, hem jî li ser Dîwana wî hatine amadekirin³².

Ligel Melayê Cizîrî, helbestvanekî din ê girîng ê edebiyata kurdî ya klasîk jî Ehmedê Xanî ye. Ehmedê Xanî piştî mirina Melayê Cizîrî di nîva duyem a sedsala XVIIan û destpêka sedala XVIIIan da li Bazîdê jiyaye. Mîrektîyên ku di dewra Melayê Cizîrî da xurt û serbixwe bûn di dewra Ehmedê Xanî da zêrîbûn û ketine bin desthilatdariya Osmanîyan û herêmên kurdan jî bi gelemperî bûne meydana şerê Osmanî û Safewîyan. Vê rewşa sîyasî bandoreka mezin li Ehmedê Xanî kiriye û ev bandor di berhemên wî da bi taybet di Mem û Zînê da aşkere dibe³³. Ehmedê Xanî ji bo perwerdeyîya medreseyan wek ferhegeka menzûm a erebî – kurdî, kurdî – erebî *Nûbihara Biçûkan*, ji bo ku xwandekarên medreseyan bi kurdî esasên dîne xwe bizanin *Eqîdeya Îmanê*, wek mesnewiyek orjinal *Mem û Zîn* nivîsandine. Ji bilî van berhemana Xanî gelek helbest jî nivîsandine lê ev helbestên xwe bi şiklê dîwaneka muretteb a wekî Dîwana Mela saz nekirine. Helbestên wî yên ku di destxetan da hatîne dîtin ji aliyê hin kesan ve hatine komkirin û çapkirin³⁴. Cara yekem Mela Mehmûdê Bazîdî, 25 helbestên Xanî di dîwançeyekê da kom dîke û teslîmî konsûlê Rusî yê Erziromê Jaba dîke û ew jî ligel xwe dibe Rusî û teslîmî Pirtûkxaneya Gel a Giştî ya Petersbûrgê dîke. Dîsa ji aliyê İsmail Badî 20, Mesûd Kettanî 7, Muhammed Elî Qeredaxî 7, Abdurrahman Durre 27, Abdullah Varlî 109 û Tehsîn İbrahîm Doskî ve 29 helbestên Xanî hatîne çapkirin³⁵. Her çend li gorî her çapekê hejmara helbestên wî ji yek cuda be jî wek encam dikare bê gotin ku hejmara helbestên Xanî yên teqez di navbera 25 û 31ê de ne³⁶.

Şîretên Li Ser Mijarên Hevpar di Helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî da

Hem Melayê Cizîrî hem jî Ehmedê Xanî kesên dîndar in û di derbarê Qur'an û Sunneta Pêxemberî ku du çavkanîyên sereke yên dîne Îslamê ne xwedî ilmekî kûr in. Ligel vê her du helbestvan jî kesayetên mutesewif in ji ber vê yekê jî li gorî fikrên tesewifê difikirin. Tesewifa Mela ne wek tesewifa tekyayê bêtir wek tesewifa felsefî ye³⁷ ji ber vê yekê terîqeta wî di helbestên wî da xuya

29 M. Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî*, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî. Wergera ji Erebi: Emîn Narozî, (İstanbul: Weşanên Avesta, 2013), 21.

30 Adak, *Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, 217-230

31 Osman Tunç, *Molla Ahmed-i Cezîrî (Melayê Cizîrî), Dîwan (Dîwan)*. Wer. Osman Tunç, (Ankara: T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, 2012), 8.

32 Abdurrahman Adak – Hayrullah Acar – Yakup Aykaç, “Bibliyografyaya Melayê Cizîrî”. Mukaddime (Özel Sayı 1). 8/3 (2017), 197.

33 Yıldırım, *Dîwan- Ehmedê Xanî Külliyyatı IV*. 13-16.

34 Adak, *Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, 252-258.

35 Yıldırım, *Dîwan- Ehmedê Xanî Külliyyatı IV*. 30.

36 Ertekin – Basuğuy, “Pend û Amojgarî Di Dîwana Şêx Ehmedê Xanî de”, 147.

37 Adak, *Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, 231.

nabe lê Xanî bi xwe di helbesta xwe ya bi navê “Mi Dî Neqşek ji Neqşê Neqşibendan”³⁸ aşkera dike ku ew pêgirê terîqeta Neqşîbendî ye. Ji ber kesayetên xwe yê dîndar û mutesewif hem Mela hem jî Xanî di helbestên xwe da xwastîne rêya baş nîşanî xwînerên xwe bidin ji ber vê yekê hin caran bi aşkere hin caran jî bi veşartî di helbestên xwe da cih daye şîretan. Di helbestên her du yan da hem li ser mijarên hevpar hem jî li ser mijarên cuda şîret hene. Mijarên hevpar ên ku her du helbestvanan jî şîret dane xwînerên xwe em dişên wiha rêz bikin:

Girîngîya Evîna Îlahî û Rêya Xwegehandina Wê

Di baweriya Îslamê da divê mirov herî zêde ji Xweda hez bike, evîna Xweda divê ji evîna hemû kes û tiştan zêdetir be. Xweda di Qur’ana Kerîm da wiha dibêje: “*Hin mirov hene ku hin heyînan di asta Xweda da dibînin û ka çawa ji Xweda hez dikin ji wan jî hez dikin. Lê kesên bawermend herî zêde ji Xweda hez dikin...*”³⁹. Ji ber ku hem Mela hem jî Xanî ev heqîqete baş dizanî di helbestên xwe da di derbarê vê mijarê da şîret li xwînerên xwe kirîne.

Dil emanet da bi naehlan nedî
Lê bi naehlan me da gewher ‘ebes (21.b2.58)

Bi dinarê dinê zinhar da yarê xwe tu nefroşî
Kesê Yusuf firotî wi di ‘alem de xesaret kir (37.b7.93)

Zahir dibêjim pendigîr da dil nedî zulfa herîr
Şubhê Melê d’mînê esîr guh dêre qewlê mu’teber (38.b12.95)
Melayê Cizîrî

Di van her sê beytan da Mela li ser girîngîya evîna îlahî disekine di beyta yekem da dibêje nebe ku tu dilê xwe bidî wan kesên ku ne hêjayî dilê te ne. Eger tu we bikî ew qîmeta dilê te nizanin û evîna te jî kêrî tiştêkî nayê. Ji ber vê yekê divê tu dilê xwe bidî êkê wisa ku layîqê vîyanê ye û qedrê wê baş dizane ku ew jî bes Xweda ye. Di beyta duyem da qîsseye Yûsuf pêxember bi bîr tîne û dibêje ey kesên evîndar nebe ku hûn evîna xwe bi malê dinyayê biguherin ji ber ku evîna îlahî ji hemû malên dinyayê bi qîmetir e. Beyta sêyem jî dikare bi du şiklan bihê fêmkirin. Yek, ey kesê ku dixwaze şîretekê bigire nebe ku tu dilê xwe bidî evîna mecazî û di wê evîna xwe da wekî min asê bibî ya dûyê jî ey ew kesê şîretxwaz ger tu dilê xwe bidî evîna îlahî tu jî dê wekî min tê da asê bibî, êxsîr bibî ji ber vê yekê van tiştan bizane paşê aşiq bibe.

Canî ji te ey Xanî cana ku bixwazîtin
Xa nuqte li ser danî filhal di mizgîn da (10.b17.144)

Ehmedê Xanî

Di vê beytê da Xanî şîretê li xwe dike û neyekser jî li xwînerên xwe dike û dibêje çawa ku ferqa di navbera herfa (Xê = خ) û (Cîmê = ج) da, guhestina cîyê noqteya wan e, ji wî bêtir çî ferq û cudahîyeka din, di navbera wan da nîne, ferqa di navbera can û canan da jî wisa ye⁴⁰. Ji ber vê yekê ewqas evîndarê Xweda be ku gava gote te kanê canê xwe bide min ey Xanî tu bi dilxweşî canê

38 Yıldırım, *Dîwan- Ehmedê Xanî Külliyyatı IV*. 118.

39 Sureta Beqere, 2/ 165.

40 Abdurrahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyan Wî*, (İstanbul: Weşanên Avesta, 2002), 167.

xwe gorî wî bike.

*Ê bi Xizrî ra divêtin abê heywan bit nesîb
Dê bi se'y û cehdê yeksan li bal wî roz û şeb (11.b10.36)
Abê heywan te divêtin tu bibe hemrehê Xudr
Camê Cem bîn û ji Dara û Sikender meke behs (22.b9.60)*

*Abê heywan te divê rastî binoşî şebe qedrê
Destî ber gerdenê pîr pêç û xem an zulfê duta be (82.b22.181)*

Melayê Cizîrî

Di van beytan da Mela dibêje ey evîndar eger tu bixwazî xwe bigehînî evîna îlahî divê pêşîyê tu bibîye hevalê Xizir ango hevalê rêşînasekê gihîştî û şareza⁴¹. Lê hevaltîya Xizir ewqas hêsan nîne bila bîra te were ku Musa pêxember di hevaltîya wî da çend kete zorîyê. Ji bo ku tu bişêy hevaltîya Xizir bikey da ku bigehîye evîna îlahî divê bi şev û rojan tu nesekinî û her bixebitî. Şeva leyletu'l qedrê tu here li hizûra Xweda bi edeb destên xwe dane serekê, here secdeyê duayan bike û ji wî bixwaze⁴² da ku rêya evîne nîşanî te bide.

*Cewrê Hindî dê bikêşî her kesê Tawus divêt
Gewher û durra yetîm bê terk ser têtin teleb (11.b12.36)*

*Dil bişo tu j'vê nîfaqê ku bidit sîne beraqê
Bi sefa hemrehê erbabê dil û ehlê sefa be (82.b18.181)*

Melayê Cizîrî

Di beyta yekem da Mela evîna îlahî dişibîne teyrê Tawus û dibêje çawa ku kesê bixwaze xwe bigehîne Tawusê divê xwe li ber zor û zehmetiyên çiyayên Hindistanê bigire her wisa kesê ku talibê evîna Xweda ye jî divê bizane ku di vê rêyê da dibe ku gelek zor û zehmetî û îşkence hebin û divê talibê evîna îlahî xwe li ber van zor û zehmetî û îşkenceyan bigire. Di beyta duyem da jî dibêje ey evîndar ger tu bixwazî xwe bigehînî evîna rastî divê tu dile xwe ji hemû xirabîyan bişoy, da ku bibî xwedî dilekî saf û bibî hevalê dilpak û dilsaffîyan⁴³.

*Şeklê mecazî çendek e, seyda heqîqî werdek e
Teyxûnê qeyda lê veke, behrî me ber endazi kir (28.b6.184)*

*Nêçîr di bê teyxûn bitin, cengê li pêşber xwûn bitin
Şunqar ne dê mecnûn bitin, uskûf ji çavan bazî kir (28.b7.184)*

Ehmedê Xanî

Di beyta yekem da Xanî evîna mecazî dişibîne cendekê mirî û evîna heqîqî jî dişibîne werdeka kûvî ya deryaya evîna heqîqî. Ji bo ku mirov xwe bigehîne evîna îlahî divê Teyxûnê qelb û dilê xwe ji qeyd û bendên maddî veke û li pey werdeka pîroz bifirîne. Teyxûnê dilê xwe bend û zincîr bike, girê bide, di binê kontrola xwe da bigire, hem jî lazim e ku mirov cendekê jî li pêşberî wî bi xwîn bîne ku pê tehrîk bibe, şewq û îştîyaqa wî ji nêçîrê ra zêde bibe, bi dû werdekê bikeve⁴⁴. Ango ey evîndar ji bo ku tu xwe bigihînî evîna îlahî xwe ji evînen mecazî xilas bike ji ber ku ew evînen me-

41 Zivingî, *Gerdeniya Gewherî*, 258.

42 Zivingî, *Gerdeniya Gewherî*, Cilt 2, 90.

43 Zivingî, *Gerdeniya Gewherî*, 2, 88.

44 Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, 241.

cazî asteng in di navbera te û evîna îlahî. Xwastekên nefsa xwe girêbide, xweşî û şabûna gihiştina evîna îlahî bîne ber çavên xwe, perdeyên li ser çavên xwe rake heqîqetê bibîne û bide dûv evîna îlahî.

Reya Dilşabûnê

Di dinyayê da xwedî kîjan dîn û bawerî be bila be armanceka sereke ya mirovan dilşabûn e. Her mirovek li gorî jiyân û baweriya xwe bi tiştêkî cuda dilşa dibe ji ber vê yekê li gorî her yekî rêya dilşabûnê jî dibe ku cuda be. Mela û Xanî jî li gorî bawerî û têgihiştina xwe rêya dilşabûnê nîşanî xwînerên xwe dane û şîret li wan kirine. Mela di derbarê dilşabûnê da di beytekê da wiha dibêje:

*Mumkînek dê hebitin da ku teleb hasil bibit
Seyyid û neçîr ku nebit tûleê sayyadî çî kit (18. b4.52)*

Melayê Cizîrî

Di vê beytê da Mela dibêje ey evîndar ger te bivê hêvî û xwastekên te bicih bîn û tu pê dilşa bibî divê tu hêvî û xwastekên ku bicihatina wan ne mûmkîn be nexwazî. Ji ber ku ev hêvî û xwastekên te çî caran bicih nayên û tu jî dê her dem xemgîn bî. Lê ger hêvî û xwastekên te tiştên mûmkîn bin wê gavê tu dê bişêy bigehî wan û dê dilşa bî. Ehmedê Xanî, li ser vê meselê bêtir sekinîye û helbestek li ser nivîsandîye. Di vê helbesta xwe da di hin beytan da wiha şîretan dide:

*Ey dil! Ger te divêtin bibi dayîm mesrûr
Di terebxaneê dunya vexwe "ava engur"*

*Penbeê xefletê xewxay cîhanê bidirin
Ji meqamê ku bi hiş tê ji sedayê "tenbûr"*

*Zimzima zemzeme ye rahê "Huseynî" ji "Hicaz"
Vexwûnit "Kabe"yê dil ta bite "Beytu'l-Me'mûr"*

*Perdeê zulmetê eşxalê cîhanê bidirîn
Ji nezergahê "cemal"ê tu "hicab"ê bike dûr*

*Menzere "dideê can"ê te munevver nepitin
Nexlê "ma zaxe" nekişî tu ji xal û xetê hûr (2.b1-b5.108)*

Ehmedê Xanî

Di van beytan da Xanî dibêjê eger tu bixwazî di vê dinyayê da kêfxweş û dilşa bibî divê tu "ava engur" (ava tirî, mey) vexwey ango divê tu ji evîna îlahî vexwey ger te ji evîna îlahî vexwar hêdî dê tu ji hemû derd û kulên dinyayê xilas bibî. Perde û hîcaba xeflet û teqereqîyên dinyayê hilîne û bidirîne. Ku ew nebin manî' û astengên wî meqam û rewşa xweş. Tu guhên xwe bide meqamê awaz û sedayên Huseynî yên ku ji meqamê Hîcazî ne, ji zewq û çeşnîya wê zemzema û terennumê, ava zemzema heqîqetê vexwe ku dilê te bibit wekî beytul me'mûrê, bibe tecelligaha Xweda û meqamê işqa wî ya heqîqî⁴⁵. Xwe ji wan mijûlahîyên dinyayê yên ku di navbera te û evîna

45 Durre, Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî, 208-210.

Îlahî dibin asteng xilas bike û alemê wek neynîka tecellîya cemala îlahî bibîne û bi wî çavî lêbinêre. Ger te bi çavê dilê xwe yê ronak temaşe kir wê gavê tu dê neqş û nemûşên îlahî bibînî û dilşa bibî.

Girîngîya Tabî'bûna Mûrşîdekî û Pedivîya Îtaeta Wî û Taybetiyên Aşiqan (Mûrîdan)

Hem Mela hem jî Xanî ji ber ku kesên mutesewif in di nav helbestên wan da gelek şîretên li ser girîngîya hebûna şêxekî û pêdivîya îtaeta wî cih digirin.

*Xidmeta pîrê muxan dê ket kesê meqsûd e mey
Şîşe û cama zucacî ê divêt dê ret Heleb (11.b11.36)*

*Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wîlayet (19.b3.54)*

Da di seyra 'îşqê bêdilber neçî
Lê dibit seyra te bêdilber 'ebes (21.b3.58)

Dil bi tayek nêrgizan de nazîkek terwende de
Gul dîkin teşbîhê xaran her xes û xaşakê rûh (28.b4.73)

Te xered vêkktina yek weliyek mûrşîd hebit
Salîk û talîbê îrşadê bi Bexdadi çî kit (18.b9.53)

Melayê Cizîrî

110

Mela di van beytan da li ser girîngîya hebûn û tabî'bûna şêxekî disekine. Di beyta yekem da dibêje ger tu bixwazî xwe bigehîniye evîna îlahî divê tu li her derê bigerî û bo xwe rêşînasekê (şêxekê) gelekî baş bibînî. Ew çî ferman bidet te divê tu bicih bînî, çî tiştên ji te dixwazît divê tu bikî. Di beyta duyem da jî dibêje kesê arif heta ji destê meyfiroşekî (mûrşîd) meyê nevexwe ango kesê arif heta di bin terbiye û telîma mûrşîdekî da derbas nebe neşêt bigehîte asta welayetê. Di beyta sêyem da jî dibêje nebe ku tu di rêya evînê da bi tena serê xwe bêyî rêşînasekî birêve biçî. Ji ber ku ger tu di rêya evînê da beyî mûrşîdekî bi tena serê xwe çûy dê hemû kedên te di avê da çin û tu nagihîye armanca xwe. Di beyta çarem da jî dibêje dilê xwe bide mûrşîdekî kamil ji ber ku her kes nikare bibe mûrşîdekî kamil û ger kesê te dilê xwe dayê mûrşîdekî kamil nebît wê gavê te nagehîniye armanca te. Di beyta pêncem da jî dibêje ger tu bixwazî bo xwe mûrşîdekî kamil bibînî ku te bigehîniye evîna îlahî divê tu hereket bikî û biçî li her derê lê bigerî ji ber ku di mala xwe da rûniştî tu mûrşîdekî wisa bo xwe nabînî.

*Ye'ni ev xaneê gil nabite qabil qet'a
Ne bi "çeçmê dil"ê nazir ne bi rûyê menzûr (2.b11.110)*

*Zahida! Ger te divêtin tu Xwudê nas bikî
Were ber sayeê "şimşad qed"an qet meçe dûr (2.b16.111)
Bi ziyarê were qeydê "şecer"ê Wadî Qudis?
Ku bizanî bibihî sîte "Enellah" ji "Tûr" (2.b17.111)*

Ehmedê Xanî

Xanî jî di van beytan da li ser girîngîya tabî'bûna mûrşîd disekine û di vê mijarê da şîretan li xwînerên xwe dike. Di beyta yekem da Xanî dibêje bê mûrşîd dilê te qet neşê qabilîyeta tiştêkî bi dest bêxît û neşê bi çavê dil li tiştan binêrît ji ber vê yekê divê te mûrşîdek hebe. Di beytên du-yem û sêyem da jî gazî kesên zahid dike û dibêje ger we bivê Xweda nas bikin hûn herin ber siha şimşad qedan ango mûrşîdên kamil û qet xwe ji wan dûr nexin. Da ku hûn heqîqeta "enellah"ê bizanin û tecellaya cemala Xweda bibînin.

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjît secde bin latê murîdên wî dibin qatê
Murîd er bêbeser nebwed zi fermanêş bi der nebwed
Kê salik bêxeber nebwed zi resp û rahê menzilha (1.b5.14)
Melayê Cizîrî

Di vê bendê da Mela li ser pêdivîya îtaeta mûrşîdan disekine. Dibêje ey murîd ger tu bixwazî bigihî evîna îlahî divê teqez tu ji gotinên mûrşîdê xwe dernekevî ew çî bêje te divê bê îttîraz tu bikî. Hetta heke ku mûrşîd bibêje murîdên xwe ji bo pûtê Lat herin secdeyê divê murîdên wî bi xeberê wî bikin û biçin secde. Jixwe ger murîd kore nebin divê wisa bikin teqez divê ji emrê mûrşîdê xwe dernekevin. Ji ber ku mûrşîd beriya wan di vê rêya ku niha ew tê da derbas dibin derbas bûye û vê rêyê ji wan gelek baştir dizane û mûrşîd her çî dike ji bo başiya murîdên xwe dike û teqez berê wan nade rêya xirab. Ango bi kurtasî divê di dilê murîdan da di derheqê mûrşîdên wan da qet çî guman nebin û bi tamamî xwe teslîmî wî bikin. Xanî jî di vê meseleyê da wekî Mela difikire û di hin beytên xwe da wiha dibêje:

Dilo rabe xwe dilxweş ke, di ho da çine seyranê
Bi carek bes xwe bir meke, were seyra gulistanê (21.b1.165)

Di fermanê ku aşiq bit, we naxwazit minafiq bit
Divê her dem muvafiq bit, weki Şeyxê di Sen'anê (21.b6.166)

Wekî şeyxê wi hadir bit, li fermanê we nazir bit
Bi emrê dostê kafir bit, bisojit Suhfê Qur'anê (21.b7.166)

Disojim suhf û mektûbê, bi emrê yar û mehbûbê
Dema dil dem bi metlûbê, didim ez din û îmanê (21.b8.166)
Ehmedê Xanî

Ey dil, ey murîd serê her tiştî xwe kêfxweş ke û dilşa be ji ber vê rêya tu lê diçî ji ber ku rêya te wekî baxçeyeka gulan e. Lê helbet hin şert û mewcên vê rêyê hene. Di vê rêyê da kesê aşiq li hemberê xweştîvîya xwe ango mûrşîdê xwe divê wekî Şêxê Sen'an be ku wî li ser xwasteka xweştîvîya xwe dînê xwe guherîbû û çûbû ser dînê yara xwe. Kesê aşiq jî nabe ku wek minafiqan be ango dilê wî bê û biçê, divê wekî Şêxê Sen'an dilê wî li ser yara wî (mûrşîdê wî) sabît be. Hetta ku gava mûrşîdê wî gotê bibe kafir û perên Qur'anê bisoje ew jî bê guman divê bi emrê mûrşîdê xwe bike û bibe kafir û perên Qur'anê bisoje. Bi kurtî divê mûrşîd di evîn û girêdayîya xwe ya li hemberî

mûrşîdê xwe da jidil û bê guman be.

Mela di beyt û bendeka din da jî taybetîyên kesên aşiq ango mûrîdan wiha tîne ziman:
Gunah û zuhd û tamat hilnagirit xerabat
Kesê bi vî derî ret divê bikit ri'ayet (19.b5.54)

*'Aşiq divê dil sade bit xaka riya yarê xwe bit
Sed dax di dil wek lale bit xûnê bixut rengxunçe bit
Wi canfida şubhet me bit lê j'emrê yar xafil nebit
Daîm bi se'y û cehde bit teb'ê ku yar lê ew we bit
... (112.b9.270)*

Melayê Cizîrî

Mela di vê beyta jorî da behsa rêya terîqetê dike û dibêje rêya terîqetê bi zuhdeka nejdil û bi gunehan nayê meşandin, kesê inyeta vê rêyê kir pêşîyê divê jidil be, xwe ji gunehan paqij bike û rîayeta edeb û erkanên vê rêyê bike. Mela di benda jorî da jî wek şîroveya beytê bi hûrgilîtir û aşkeretir behsa pêdivîyên rêya terîqetê û taybetîyên talibên vê rêyê dike û wiha dibêje: Aşiq (mûrîd) divê xwedî dilekî saf û paqij be, di rêya yara xwe da wekî axê dilnizm be, divê dilê wî ewqas dax û birîn hebin ku wek laleyekê reş û şîn be û ji ber vexwarina xwînê jî wekî guleka sor be, divê di rêya yarê da canfîda be ger yar jê bixwaze bêyî ku demekê bifikire canê xwe gorî bike, her daîm hewl bide ku bibe kesekê wisa ku yar jê hez dike û her daîm di emrî da be.

Şîretên ku di Helbestên Melayê Cizîrî da Hene Lê di yên Xanî da Tunene

Şîretên ku di helbestên Cizîrî da hene lê di yên Xanî da tunene li ser mijara teslîmbûna hikmeta Xweda ne. Li gorî Mela di hevsengîya îşq û aqlî da îşq girantir û girîntir e. Gelek meseleyên ku bi aqlî neyêne fêmkirin bi îşqê dikare bihêne fêmkirin.

*Ayetê husnê mufassal ke ji keşşafê cemal
'İlmê 'îşqê bike tefsîr û ji defter meke behs (22.b7.59)*

Razê dehrê ji sipîhrê tu nizanî bi cedel
Hikmetê Dewar e tu j'hikmetê Dawer meke behs (22.b8.60)

Ji ezel 'aqîbetê karî ku me'lûmi nebit
Camê mey noş û ji teqdîrê muqedder meke behs (22.10.60)

Di beyta yekem da Mela dibêje ey evîndar ka rabe bi alîkariya zanîna Xwedayî ayeta delalîyê û ilmê aşqê rave bike û qet behsa defter û kitêbên zanîsta zahîrî neke û guhê xwe nede wan. Ji ber ku ev karê dilî ye tenê bi têgihîştina dilî mirov dikare van raveyan bike⁴⁶. Aqil di hin meseleyan da acîz dimîne ku ev jî yek ji wan e. Di beyta duyem da jî dibêje ne mûmkîn e ku tu bi têkoşîneka aqlî nihênîyên aleman fêmkî ji ber vê yekê aqlê xwe gelek newestîne. Bizane ku ev hemû daxwaz û hîkmeta Xweda ne, vê yeke qebûl bike û hêdî behsa hîkmeta wî neke. Ger ku encam û dawiya

46 Zivingî, *Gerdeniya Gewherî*, 256.

tiştêkî dîyar nebe, tu jî nede dûv û hewil nede ku tu bizanî dê çawa be ji ber ku tu wisa bikî jî çi nahiye destê te û tu çi tiştî nizanî. Ji ber vê yekê vexwe ji evîna îlahî û xwe bi temamî teslîmî wî bike, ji wî bawer be, ji wî dilxweş be û hêdî behsa teqdîra wî neke.

Şîretên ku di Helbestên Ehmedê Xanî da Hene Lê di yên Mela da Tunene

Yek ji tiştên ku herî zêde bandorê li hizr û ramanên helbestvanan dike rewşa siyasî û aborîya civakê ye. Ji ber ku her helbestvanek di serdema xwe da, di nav civakeka xwe da dijî loma rewşa civakê bivê nevê ji her alî bandorê li wî dike. Gava li rewşa civakî ya serdema Mela û Xanî tê nêrîn hin cudahîyên sereke tên dîtin. Di serdema Mela da li herêmên kurdan mîrektîyên bi hêz hebûn û Mela bi xwe jî di bin hîmayeya mîrên Cizîra Botan da bû⁴⁷ halê kurdan gelek xirab nebû ji ber vê yekê Mela ji pirsgirêkên civakî bêtir li ser dinyaya xwe ya navgîn sekinî. Lê di serdema ku Xanî lê dijiya rewşa kurdan wekî ya serdema Mela baş nebû. Mîrektîyên ku di dewra Melayê Cizîrî da xurt û serbixwe bûn di dewra Ehmedê Xanî da zeîf bûn û ketine bin desthilatdariya osmanîyan û herêmên kurdan jî bi gelemperî bûne meydana şerê osmanî û safewîyan⁴⁸. Ji ber vê yekê Xanî li gorî Mela bêtir bi pirsgirêkên civakî re eleqedar bûye û di berhemên xwe da jî cih daye van pirsgirêkan. Lê Xanî tenê pirsgirêk destnîşan nekirîne di heman demê da ji bo çareserkirina wan pirsgirêkan jî şîret li xwîner û civaka xwe kirine. Ev helbesta li jêrî hatiye dayîn bi temamî li ser karûbarên dinyayê hatiye nivîsîn. Di vê helbesta xwe da şîretan li xwîner û civaka xwe dike.

*Zahidê xelwetnişîn pabestê kirdarê xwe ye
Tacirê rîhletguzîn derbendê dînarê xwe ye
Aşiqê dîlberhebîn dildayê dildarê xwe ye
Vi zemanî her kesek bêşubhe xemxwarê xwe ye (20.b1.163)*

Divê bendê da bi awayekî veşartî bangî li xwîner an gelê xwe dike. Dibêje ey xwîner! an jî ey gelî kurdan! Hûn bizanin ku her kesek bi şolê xwe ve mijûl e û her kesek şolê xwe dike. Sê nimûneyên ku di nav civaka xwe da aktîf jêdigire û dibêje her yek ji van bi şolê xwe ve mijûl e. Dikare bê gotin ku zahid, xelwet û tekkeyê temsîl dike. Tacir, rewşa aborî ya her zemanî rave dike û ji xwe aşiq jî jênegerê her civak û serdemê ye⁴⁹. Ey xwîner tu dibînî her kesek şolê xwe dike kes şolê kesekê dî nake ji ber vê yekê tu jî rabe şolê xwe bike û nehêle bi hêviya kesekê din ve.

*Bê 'emel tu ji kes meke hêvî eta û hîmmetê
Bêxered nakêşitin qet kes ji kesê zehmetê
Kes nehin qet hilgirit barê te ew bê ucretê
Gerçî Îsa bit ku wi fikra ker û barê xwe ye (20.b2.163)*

Xanî di vê bendê da balê dikêşîte ser qanûneka îlahî û civakî. Ew qanûn jî ew e ku ji bo mirov bixwaze tiştêkî bi dest bixe teqez divê mirov karekî bike û kedêkê pê bide. Allah, di Qur'ana Kerîm da derheqê vê qanûnê da wiha dibêje: "Ji bo mirovan tenê tenê berdêlka xebata wan heye"⁵⁰. Ango ji bo ku mirov bixwazin tiştêkî bi dest bixin teqez divê xebatekê bikin ger xebatê nekin wê

47 Adak, *Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, 230.

48 Yıldırım, *Dîwan- Ehmedê Xanî Külliyyatı IV*, 14-15.

49 Ertekin – Basuğuy, "Pend û Amojgarî Di Dîwana Şêx Ehmedê Xanî de", 153.

50 Sureta Necm, 53/ 39.

gavê neşên wî tiştê ku dixwazin bi dest bixin. Di nav gel da jî derheqê vê mijarê gelek gotinên pêşîyan hatîne gotin wek mînak di nav kurdan da gotina pêşîyan a “Heta nava destî reş nebît, tama devî xweş nabît” rasterast vê rastiye tîne ziman. Xanî jî di vê bendê da vê rastiye tîne ziman û şîretan li xwînerên xwe dike. Dibêje ey gelî xwîneran! Tu bi xwe karê xwe bike nemîne li hêviya hîmet û mineta kesekî din. Ger ku karê wan tê da nebe kesek ranabe ji bo te zihmetê bikêşe. Ger tu bi xwe barê xwe (berpirsariyên xwe) bar nekî kesek bê heq (ucret) nayê li şûna te barê te li xwe bar nake. Hişyar be ku em di dewreka wisa da ne ku xwe Îsa pêxember jî be her kesek li dûv karê xwe ye.

*Hoşyar bî! Da neki'umrê xwe bêhasil telef
Lew ku nakit fayde mal û genc û ewlad û xelef
Maceraya Xidir diwarê yetîmi bû selef
Vi zemanî her kesek mi'marê dîwarê xwe ye (20.b3.163)*

Ey xwîner hişyar bî ku ev dinya demeke kurt e û her mirovek jî ji bo demeke kurt lê dijî paşê bar dike diçe ji vê dinyayê. Cihê mirovan ê heqîqî di axretê da ye û ev dinya jî baxçeyek e ku tu li vê dinyayê çi lê biçînî dê li axretê jî wan biçînî û bixwî. Ji ber vê yekê umrê xwe yê kurt, pûç derbas neke, hindî ji te tê baxçeyê umrê xwe bi kar û xebatên baş ve tijî bike. Mal, zarok, umr û gencîneyên xwe ji bo kêlana vî baxçeyê umrê xwe di dinyayê da xerc bike. Ji ber ku gava te ji vê dinyayê bar kir û çûy hêdî çi mifayê wan jî nagehîte te, ew tenê ji bo dinyayê dikare mifayekê bigehînine te. Ey xwîner ji derdora xwe û serdema xwe agahdar be. Niha em ne di serdema Xizir da ne û ev zeman jî ne wekî zemanê wî ye. Xizir di zemanê xwe da bê heq (ucret) dîwarê etîman çêdikir lê di vî zemanî da hêdî kesek wek wî nake û herkes mîmarê dîwarê xwe ye. Di vê bendê da Xanî bi neyekser şîretê li kurdan jî dike. Dibêje ey gelê Kurd! Hûn dibînin ku herêma hewe bûye cihê şêrên gelên din û her gel li dûv berjewendiyên xwe digere. Hûn jî şiyar bin û li heqê xwe bipirsin ger hûn we nekin kesek di şûna hewe li heqê hewe napirse.

*Ca nezer ke ibretê pêla ku waqî' bit sewaş
Ger nebitin iltifat û mûçe a debr û me'aş
Cundiyê rimbazê faris naditin canî belaş
Sa'eta serbaziye hêvî ji serdarê xwe ye (20.b4.164)*

Sevda Aktulga Gürbüz. Dr. Hindekar, DİB e-mail: ysfgbrbz65@gmail.com Orcid.org/0000-0003-1450-4632

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types: Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research Article

Dema Hatînê/Makale Geliş Tarihi/Received: 22.03.2021

Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/: 29.05.2021

Atf/Citation: Gürbüz, A. S. (2021). "Mijara Ru'yeta Jinan li Bihiştê: Mînaka İbn Teymiye û Celaledînê Suyûtî", Kurdiyât, 3, 145-156.

MIJARA RU'YETA JINAN LI BIHIŞTÊ: MÎNAKA İBN TEYMIYE Û CELALEDÎNÊ SUYÛTÎ

Sevda Aktulga GÜRBÜZ

KURTE

Çawa ku tê zanîn Îslam, li ser esasê eqîl û naklî hatiye bînakirin. Piştî dinyayê baweriya jiyana bi axretê jî ji esasê baweriya îmanê hatiye qebûl kirin û zanîn. Di axretê de Ru'yet, ango dîtina Xweda, yek ji meseleya axretê ye ku di nav alimên Îslamê de hatiye niqaşkirin. Dîtina Xweda di axretê de wekî mijarek xeybê hatiye zanîn ku ev mesele di nav alimên mezheban de bûye mijara niqaşê.

Di Qur'ana Pîroz û hedîsan de derbas dibe ku Xweda dê xwe bi evdên mu'mîn bide nîşan. Ev nêzîkbûn wekî baweriya Ehlê Sunetê tê qebûl kirin. Firqeyên wekî Mutezîle û ehlê Şîe, derbarê mijara ru'yetê de li ser nêzîkbûna eqîl çûne û ev mijarên wiha bi pîvana eqil û mentiqê nixandine. Wan mezheban, ev mijar li gor prensîbên tewhîdê zanîne û dîtina bi vî şiklî înkâr kirine.

Di peroblema dîtina Xwedê ya di axretê her çiqas bûye mijara niqaşê, di eynî wextî de dîtina jinan ya Xwedê jî wek mijareke din derketiye holê. Li gor angaştek dînî jin dê di axretê Xwedê nebînin. Yek yê xwediyê vê angaşê jî alimê Ehlê Sunetê yê mezin Îmam Celaledînê Suyûtî ye. Ew dibêje ku di bihiştê de jin Xwedê bi awayekî gelemperî nabînin. Li gor Îmam, ger Xwedê bibînin jî, îddîa dike ku yê tenê di demên kifşe de bibînin. İbn Teymiye jî di vê babetê de axiviye û di vê derbareyî de çend tişt gotine. İbn Teymiye, nêzîkî 180 sal beriya Îmam Suyûtî jiyaye. Ev Îmam jî di vê mijarê de xwediyê wê fikrê ye ku, jin di cînetê de dê wekî mêran Xwedê bibînin. Lewre ev ru'yet mafê hemî bawermendan e. Ev mijar, di eynî wextî de di hedîs û nessên dînî bi awayekî berfireh hatiye nixandin ku emê lêkolînê bikin.

Peyvên Sereke: Ru'yet, Bihişt, Jin, Celaledînê Suyûtî, İbn Teymiye.

Cognisance Issue of Women's in Paradise: The Specific to Ibn Taymiyyah and Djalāl al-Dīn al-Suyūṭī.

ABSTRACT

The issue of Ru'yet is one of the unseen issues that have been discussed throughout history. There are debates about seeing Allah in the hereafter within the Islamic groups too. Factions such as Mu'tezile, Şîâ regard the ru'yet as impossible by interpreting evidence of transference. Based on the source of Holy Quran and Hadith, it is accepted in the Ahl al-Sunnah belief that Allah will appear to the believing servants in Paradise. However, sects such as Mu'tazila and Şî'ah deny the news that appear in the shari'ah about Ru'yet, on the basis of wisdom, in accordance with the principles of tawhid. In the discussions of Ru'yet that started with whether God is seen or not, the issue of whether women can attain this honor in Paradise was added. Celaleddin as-Suyūṭī, who is one of the scholars of Ahl as-Sunnah, claims that even if he sees that women will not see Allah in general in Paradise, this situation will only happen at certain times. Ibn Taymiyya, who lived 180 years before Imam Suyūṭī, states that in response to the same understanding in his own time, stating that Nasses (written laws in Islamic jurisprudence) are addressed to the community, women will have the honour of Ru'yet together with men in the afterlife. The most comprehensive assessment on whether women will see God in Paradise was made by Imam Suyūṭī and Ibn Taymiyye. The general evaluations of the two scholars on this subject, which was discussed within the framework of the same Nasses are important in terms of understanding the subject. The way of interpretation of these scholars in the hereafter, in which the ahl al sunnah are reasonably accepted as wajib, Show that they are not independent from the conditions of their era. Since the right to dream is an evaluation based on personality and regardless of the gender, which is not the choice of anyone, writing and discussing the subject in Kurdish is also important in terms of enriching the scientific and intellectual life.

Key words: Cognisance, Heaven, Woman, Djalāl al-Dīn al-Suyūṭī, Ibn Taymiyyah.

Cennette Kadınların Ru'yeti Meselesi: İbn-i Teymiyye ve Suyuti Örneği

ÖZET

Bilindiği gibi İslam dini, aklî ve naklî deliller ve naslar üzerine bina edilmiştir. Bundan dolayı nakli bir delil olarak bu dünyadan sonra ahiret inancı, bir iman esası olarak kabul edilmiştir. Ahiret hayatında da Ru'yet, yani Allah'ı görme, ahirete ait bir mesele olarak İslam âlimleri arasında tartışılmıştır. Ahirette Allah'ı görme meselesi, gaybî bir konu olarak mezhep âlimleri arasında da tartışma konusu olmuştur.

Kur'an ve hadis muktesebatı içinde geçtiği üzere yüce Allah, kıyamet gününde zatını Mumin kullarına gösterecektir. Bu inançta Ehl-i Sunnetin bir inancı olarak kabul görmektedir. Buna karşın Mutezile ve Şia gibi mezhepler, kendi aklî ve mantikî yaklaşımlarına göre bunu kabul etmemişlerdir. Bu mezhepler, ru'yet meselesini tevhid prensipleri açısından değerlendiren bu konuyu bir noktada inkâr etmişlerdir.

Nasıl ki ahirette Allah'ın görülmesi Müslümanlar arasında tartışma konusu olduysa, aynı şekilde ahirette Yüce Allah'ın kadınlar tarafından görülüp görülmeyeceği meselesi de ayrı bir tartışma konusu olmuştur. Nitekim Ehl-i Sunnet âlimlerinden İmam Suyūṭī, ahirette kadınlar Allah'ı genel anlamda göremeyeceklerdir. Eğer görecekseler de ancak belli zaman dilimlerinde görecekselerdir. Bu konuda diğer bir görüş te İbn-i Teymiyye'ye aittir ki onun da bu konudaki görüşleri meşhurdur. İbn-i Teymiyye, İmam Suyuti'den 180 yıl önce yaşamış bir âlimdir. İbn-i Teymiyye, bu konuda farklı bir fikre sahip olarak ru'yeti bütün inananların hakkı görür.

Bu konu, aynı zamanda Kur'an, hadis ve diğer İslamî kaynaklarda da geçmektedir. Biz de bu konuda bir araştırma yaparak İnançlı Kürt okuyucuların istifadesine sunmak niyetindeyiz.

Anahtar Kelimeler: Ru'yet, Cennet, Kadın, Celaleddin es-Suyuti, İbn-i Teymiyye.

DESTPÊK

Meseleya ru'yetê wek mijareke xeybî, di dîroka bawerîya bi roja qîyametê de cî girtiye. Mijara herî zêde ji aliyê mirovan ve hatiye mereq kirin yek jî ev mesela ru'yetê ye. Ji ber vê yekê di qadên zanistên Îslamî yên wekî Kalam, Felsefe û Tesewîfê de ev mijar her tim bûye mijara axivînê û di vî derbarî de niqaş hatine kirin. Sedema munaqeseya mijara dîtina Xwedê Te'ala di axretê de ew e ku gava meriv bibêje dê Xwedê bê dîtîn, hingê ev kes cîsmîyetê îsnadê Xwedê dike û Xwedê wekî tişteke berbidest dide nîşandan. Ji ber ku meriv li dinyayê bi pênc pejnên/hîsên 'ezayan û bi aqil ve fêhm nake ka Xwedê bi zatê xwe ve çî ye û dişibe çî. Sedemê vê jî firqayên wek Mutezîle û Şîa li gor gotinên ku di şerî'etê de heyî bi hişmendiyê ve têkildar dibin û înkâr dikin. Sedema têkiliya vê bingehkirinê; yekîtiya Xweda û dûrxistina Xweda ji her kêmasiyan û bêhempakirina Xweda ye. Li gor wan firqeyan dîtina Xwedê bi çavan û guhlêdarkirina Xwedê bi guhan di herdu dinyayan de jî dijî rêgezên/qaîdeyên tewhîdê ne. Mutezîle girîngiyê dide aqil û di heman demî de neqlê jî qebûl dike. Mu'tezîle, prensîba tewhîd û edaletê diparêze û pêşniyar dike ku li gor sînorên hişmendiyê nass jî tê qebûl kirin¹.

Li aliyê din ve alimên Ehlê Sunetê li gor Qur'an û hedîsê difikirin ku, li gor wan, dîtina Xweda ya di axretê de wek lutfê Xweda ku Xweda dê xwe nîşanî mumînan bide. Di vê mijarê de gelemperîya Ehlê Sunetê wiha difikirin. Ya di ru'yetê de bûye mijara niqaşê ru'yeta jinan ya di axretê de ye. Di warê dîtina jinan ya Xwedê, di axretê gelek gengeşî û niqaş çêbûne. Îmam Suyûtî (m.911/1505) yek ji wan kesan e ku dîtina jinan ya Xweda bi gelemperî red dike. İbn Teymiye (m. 1328) jî wek alimêkî din di vê mijarê de cudahiyekê bo jin û mêran nake û dîtina Xweda mafê her kesî dibîne. Ji ber vê, binyadên İbn Teymiye gelek girîng in. Ji bo ku ev niqaş bêhtir bîna fêhm kirin divê berî ewil fikrên Ehlê Sunetê yên ku derheqê mijara ru'yetê de bîna dîtîn û fêmkirin.

Li Gor Ehlê Sunetê di Axretê de Ru'yet

İbn Teymiye û İmam Suyûtî balê dikêşînine ser mijara ru'yeta jinan ka gelo ew ê di bihîştê de Xweda bibînin yan na. Lewra İbn Teymiye di berhema xwe ya bi navê *Mecmû'u'l Fetawa* û İmam Suyûtî jî di berhema xwe ya bi navê *İsbalu'l-Kisayê* de, bi taybetî cihên fireh ji bo mijara ru'yeta jinan vedîqetînin. Dema di lîteraturê de li ser mijara ru'yeta jinan lêkolîn bê kirin tê dîtîn ku herî berfireh wan herdu aliman cih dane vê mijarê. Ji ber vê sedemê armanca me ew e ku em nêrîne wan herdu aliman ya di derheqê mesela ru'yetê de niqaş bikin.

Benîadem ji roja hatiye afirandinê heta roja îro herî zêde li ser çend tiştan sekiniye û bala xwe daye ser. Yek ji wan mijaran jî ev e ku însan hebûnên ku nayên dîtîn dixwaze wan bibîne û tiştên ku nayên zanîn wan bielime. Herwiha însan xwestiyê xwe nas bike, yê ku ew afirandiye nas bike û bibîne. Dîtina Xweda yek ji van mijaran e ku li gor bawerîya Misilmanan Xwedê ne di dinyayê de lê dê li axretê de bibînin. Li axretê ru'yet, hem bi wateya di bihîştê de gihîştina lutfê temaşeya cenabê Heq, hem jî di nav êkolên Îslamê de dîtîn tê wateya nihêrîn, bidestxistina nî'metan, zanîna Xweda, hêvîdarî, bendemayîn, fikirkirin, plansazî, dîtina xewnan û wateyên din. Hê wateyên bi vî rengî li vê peyvê hatiye bar kirinê.

Ji serdema duyem ya Hicriyê ku niqaşên ru'yetê dest pê kirine, ji vir ve heya îro Ehlê Sunetê rêyeke navincî parastîye. Li gor nêzîkbûna vê navinciyê qebûl kirine ku Xwedê Te'ala yê li axretê ji aliyê mu'mînan ve were dîtîn lê mahiyeta wê ne kifşe ye. Lewra dîtina Xwedê Te'ala ji aliyê aqilî

1 Qadî 'Ebdulcebbar b. Ehed el-Hemedanî, *el-Muxnî fî Etwabî't- Tewhîdî we'l-'Edl (Ru'yetu'l-Barî)*, thk.: M. Mistefa Hilmî-Ebu'l-Wefa Xenîmî, (Bê cih: Daru'l-Misriyye li't-Te'lif we't-Terceme, bt.), 4, 167-168.

ve caîz e, ji aliyê neqlî ve jî wacib hatiye zanîn.² Li gor alimên Ehlê Sunetê wasîteya ru'yetê çav e. Ango însan dê Xwedê bi çavê xwe bibînin. Ev dîtî ne me'newî ye. Xwedê te'ala li bihiştê ji xeynî hebûna keyfîyetê, teşbîh û cihetê ango "bîla teşbîh", "bîla keyf" yê bi çav were dîtî.³ 'Alimên Ehlê Sunetê îdiayên dîtîna Xweda bi delîlên nassî/kîtab û sinnet ve bibingeh kirine. Ji wan delîlan yek jî ev ayet e: "Ew roj hinek rû geşin. Li Xwedayê xwe dinihêrin"⁴. Li gor 'alimên Ehlê Sunetê ayet, bi awayekî vekirî dibêje ku dê rûyên mu'mînan ji ber mizgîniya dîtîna Xweda rewnaqtir bin. Sedema vê şad û bextewariyê diyariya herî mezin dîtîna cenabê Allah e.⁵ Ev ayet ji bo hebûna ru'yetê dibe delîlek qewî. Wekî din hedîsek Resulê Xweda (s.x.l) jî ji Ebdulah bin Umer (r.) hatî rîwayet kirin wiha ye: "Kesên li bihiştê ku payeya wan herî kêr be jî, yê nîmetên ku ji bo wan hatiye îkramkirin heta sala du hezaran bizanibin; di nav wan de ya herî meqbûl ji bo Xweda, sube û êvarê rojê du caran dîtîna rûyê cenabê Xweda ye û ev ayet xwendiyê; Wê rojê hinek kes rû geş in. Li Xwedayê xwe dinihêrin."⁶

Yek jî piştrastiyên nessî/qetî ku 'alimên Ehlê Sunetê bi îmkana ru'yetê ve girê didin ev ayet e "Ji bo wan kesên ku îhsan kirine husn û zêdehiyek jî heye".⁷ Ehlê Sunetê peyva "zêdehiyek" (ziyadehî) ku di ayetê de derbas dibe wek "nêrîna li rûyê Xweda"⁸ tefsîr kirine. Bingeha wê jî digihînine vê hedîsa Hz. Pêxember (s.x.l). "Ji Resûlulah (s.x.l) hatiye rîwayet kirin. Wî weha gotiyê: Ev ayeta ku dibêje: "Ji bo wan kesên ku îhsan kirine husn û zêdehiyek jî heye" tê çî wateyê? Hz. Pêxember (s.x.l) wiha bersivand: "Piştî ku ehlê bihiştê çûne bihiştê û piştî ku ehlê dogehê jî çûne dogehê munadiyeke wiha bang dike: Ya ehlê bihiştê, ji bo we di nezdê Xweda (c.c) de sozeke hatiye dayîn heye. Ew dixwaze ku vê soza ku daye we bîne cih. Ew ê jî wiha bêjin: Ma Wî rûyê me rewnaq nekîr? Mêzîna me girantir nekîr? Me ji agirê dogehê neparast? Li ser vê Xweda (c.c) hicabê/perdê vedike, ew jî li cenabê Xweda dinêrin. Bi navê Xweda (c.c) sond dixwim ku Xweda tişteke ku ji dîtîna xwe baştir ku evd jê hez bikin çavan rewnaqtir bike nedaye wan kesan."⁹

Dîsa li gor alimên Ehlê Sunetê ji bo piştrastiya hebûna mijara ru'yetê yek jî riwayeta ku ji Ebu Hureyre (r.) hatiye ragihandin de wiha derbas dibe: "Însanan: Ey Resulê Xweda, ma em ê roja qiyametê Rebbê xwe bibînin? Hz. Pêxember (s.x.l) got: Ma di Şeva bedrê (heyva çardeyan) ji bo ku hûn heyvê bibînin ma hûn hevudû aciz dikin? Gotî: Na ey Resulê Xwedê. Hz. Pêxember (s.x.l.) dîsa pirsî: Ma di asîmeneke sayî de ji bo dîtîna rojê hûn hevdu aciz dikin? Wan dîsa bersivandin: Na ey Resulê Xwedê. Hz. Pêxember (s.x.l.) jî wiha kerem kir: Wek heyva Şeva Bedrê (heyva çar-

2 Sa'duddîn Mes'ûd b. Fexruddîn 'Umer b. Burhanuddîn Ebdîllah el-Herewî el-Xurasanî et-Teftezanî, Şerhu'l-'Eqa'îd, wergêra tirkî: Suleyman Ateş, (İstanbul: Dergah Yayınları, 2016), 153-154; Abdullatif Harpûti, *Tenqîhu'l-kelam fi 'aqa'idi ehli'l-İslam*, wergêra tirkî: Fikret Karaman, (İstanbul: Çelik Yayınevi, 2016), 164; Ebû Hafis Necmeddin 'Umer b. Muhammed en-Neseffî, (İstanbul: Bayrak Yayıncılık, 2016), 57; Ebû Muhammed Nûruddîn Ahmed b. Mahmûd b. Ebî Bekr es-Sabûnî el-Buxarî, *el-Bidaye*, wergêra tirkî: Bekir Topaloğlu, (Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, 1979), 97-98; Abdülqahir el-Bexdadî, *Kitabu Usûlû'd-dîn*, wergêra tirkî: Ömer Aydın, (İstanbul: İşaret Yayınları, 2016), 130-131; Ebû Hamid Muhammed b. Muhammed b. Ahmed el-Xezalî et-Tûsî, *el-İqtisad fi'l- i'tiqad*, wergêra tirkî: Kemal Işık, (Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, 1977), 45; Fexreddin Razî, *el-Muhassal*, wergêra tirkî: Huseyin Atay, (Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, ts.), 185; Nureddin Ahmed, Sabûnî, *el-Bidaye fi usuli'd-dîn*, neşr.: Bekir Topaloğlu, (Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, 2005), 121-124; Ebu'l-Muîn Meymûn b. Muhammed b. Muhammed b. Mu'temid en-Neseffî, *Tebsîratu'l-Edille fi usûlû'd-dîn* thq. Huseyin Atay, (Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara,1993), 1: 508.

3 Harpûti, *Tenqîhu'l-Kelam*, 167; Ebû Mensûr el-Maturîdî, *Kitabu't-Tewhîd*, wergêreê tirkî: Bekir Topaloğlu û hevalên wî, (İstanbul: İsam Yayınları, 2003), 120.

4 Qiyamet 75/22-23.

5 en-Neseffî, *Tebsîratu'l-Edille*, 1: 520.

6 Mewdûdî, *Tefhîmu'l-Qur'an*, 6: 542.

7 Yûnus, 10/26.

8 Mela Muhammedê Şoşîkî, *Nûra Qelban: Tefsîra Qur'anê*, (İstanbul: Weşanên Nûbiharê, 2011) 3, 32

9 İbnû'l-Heccac Muslîm, *Sahîhu Muslîm*, (Beyrût: Daru Tevbe, 2008), "İman", 297; Ebû İsa Muhammed et-Tirmizî, *Sunenu Tirmizî*, thq. Beşşar Ewwad, (Beyrût: Daru Xureba el-İslamiyye, 1996), "Cennet", 16.

deyan) û wek roja li asîmanê sayî hûnê Rebbê xwe bibînin.”¹⁰

Bi piranî Şî'a û Mutezîle 'alema fena û beqayê wekhev dibînin. 'Alimên Ehlê Sunetê jî vê fikrê rexne dikin. Berhevdana rewşa beriya mirinê û piştî mirinê caîz nabînin û dibêjin 'mirin û fena bi awayekî tebiî li wir, ji holê radibe û 'alema axretê naşibe dinyayê. Ji ber vê jî ru'yet heq e'¹¹. Ev maf wek lutfekî Xweda dê bê bi bicihkirin. Rebbê 'Alemê ji ber hebûna zatê Wî tê xuyanê. Sedem vê jî hebûna Xweda çawa ku wacib e¹², eynî wisa wacibûna dîtina wî de jî 'alimên Ehlê Sunetê hemfikir in.

Wek ku tê dîtîna di Qur'an û hedîsan de xîtaba peyva ru'yetê, ji bo hemû mu'mînên ku herine bihiştê derbasdar e. Ji bo ehlê bihiştê wek nîmeta herî xweşik, ev tişt tê gotin lê ji bo kesên bê-bawer, piranî tê gotin ku yê ji vê nîmetê bêpar bimînin. Ev ayeta tê di vê miradê de wekî piştrastiyekî ye: *“Na, na ya rast ew ê di wê rojê de ji dîtina cenabê Xweda bêpar bimînin”*¹³. Herwiha ji bo evdên muqarreb/nêzîk li axretê mijara ru'yetê wek we'd û mizgînîyekî derdikeve hemberî me û bi vegotinên bi gelemper hatî bilêvkerin de jî ev tişt tê diyar kirin¹⁴.

Ru'yeta Jinan li Bihîştê

Li gor Qur'an û hedîsan serboriya jinan ya li ser rûyê erdê bi Hz. Hawayê dest pê dike. Ji aliyê berpirsîyarên îlahî ve jin û mîr wekhev hatine qebûl kirin lê ji aliyê wesfên din ve cudahiyeke berçav di navbera jin û mîran de heye. Lêbelê di Qur'anê de di navbera motîfên hewesandina bihiştê û azirandina dojhê wekhev tê dîtîna¹⁵.

Di Qur'ana pîroz de; bihişt bi wesfên Firdews,¹⁶ Cennet'ul-Me'wa,¹⁷ ebediyeta ku hatiye we'd kirin,¹⁸ 'Edn,¹⁹ welatê ebedê,²⁰ roja bextewariyê²¹ derbas dibe de, her ku jin be yan jî her ku mîr be, ku îman anî be û tiştên bi feyde/baş kiribe dê herine wir. Herwiha ji bo wan li wir nîmetên bê-hesab wê bên dayîn.²² Şert û mercên jiyana li axretê, diyardeyeke ku girêdayî jiyana dinyayê xwe kifşe dike. Bihişt diyariyek e ji bo kesên li dinyayê xwedî 'emelên salih bin e. Li gor Ehlê Sunetê û mutesawifan, li bihiştê diyariya herî mezin dîtina cemala Xweda ye.

Derheqê Ru'yetê de Nêrînen Îmam Celaledînê Suyûtî

Çawa li ser dîtina mu'mînan ya cemala Xweda niqaş tînin kirin wisa jî li ser dîtina jinan ya cemala Xweda nîqaş hatine kirin. Divê bê gotin ku di vê mijarê de fikrên cuda cuda hene. Wek ku

10 Ebu Ebdîllah Muhemmed b. İsmâil b. İbrahîm el-Cu'fî el-Buxarî, *Sahîhu Buxarî*, (Beyrût: Daru İbni Kesîr, 2002), “Tewhîd”, 24; “Zuhd”, 16; Muslîm, “İman”, 322; “Mesacîd”, 633.

11 Ebu'l-'Ebbas Zeynuddîn (Şihabuddîn) Ahmed b. Ahmed b. Abdillatif eş-Şercî ez-Zebîdî, *et-Tecridu's-sarih li-ehadîssi'l-Cami'i's-sahîh*, nşr. Tariq Ebdullah b. Muhemmed b. Muaz, (Bexdat: Daru İbni'l-Cewzî, 2012), 643

12 Xezalî, *el-İqtisad*, 45.

13 Mutaffîfîn, 83/15.

14 Xezalî, *İhyau 'Ulûmi'ddîn*, wergêrê tirkî: Ahmed Serdaroğlu, (İstanbul: Bedir Yayınevi, 1975), 4: 647.

15 Al-î İmran, 3/133; Hedîd, 57/21; İnsan, 76/19; Bakara, 2/25; el-Waqia, 56/35-38; Saffat, 37/48-49; Nebe', 78/33; Hicr, 15/47-48; Meryem, 19/62; Vakia, 56/25; Nebe, 78/35; Xaşiye, 88/11; Alî İmran, 3/15, 136, 198; Nisa, 4/13; Maide, 5/85; Tewbe, 9/72, 89; İbrahîm, 14/23; Taha, 20/76; 'Enkebût, 29/58; Fetih, 48/5; Hedîd, 57/12; Mucadele, 58/22; Zumer, 39/20; Yasîn, 36/56; Heşr, 59/20; Enbiya, 21/101-102.

16 Mu'mînûn, 23/11.

17 Necm, 53/15.

18 Furqan, 25/15.

19 Saff, 61/12.

20 Fatır, 35/35.

21 Enbiya, 21/103.

22 Mu'mîn, 40/40.

tê zanîn Îmam Celaledînê Suyûtî (m. 911/1505)²³ kesê yekem e ku li ser mijara 'li bihiştê jin dê mu'ameleyeke çawa bibînîn û yan jî dê cemala Xweda nebînîn' bi delîlan sekiniye. Îmam Suyûtî, roja ru'yet pêk bê wek roja îne dide zanîn. Dibêje ku wê di vê rojê de meclisa ru'yetê kom bibe û tesnîf bike ka dê Xweda bibîne.²⁴ Îmam Suyûtî di vê berhema xwe ya ku wek reddiye jî em dikarin bi nav bikin li ser bersiva fetwaya "Ku jin li bihiştê Xweda bibînîn" ji bo hemdemê xwe Muhammed bin Ebdu'l-Mun'îm el Cewcerî (m. 889/1484) nivîsandiye.²⁵

Îmam Suyûtî roja îne ya ku bûyera ru'yetê tê de pêk were wek rojê mezîniye bi lêv dike. Li gor vê Îmam Suyûtî Xweda ji vê rojê hez dike û wê wekî roja ku qiyamet tê de radibe û wek yewmu'l-mezîd bi nav dike.²⁶ Ragihandina ku ji Se'îd bin Museyyeb (r.) ya li ser roja ru'yetê ku tê gotin ev roj roja îne ye wiha ye: "Ehlê bihiştê yê li gor 'emelên xwe di bihiştê de bi cî bibin. Pişt re bi qedera demeke roja îne ya dinyayê yê dem were dayîn ku herin Rebê xwe ziyaret bikin. Dê erşê Xweda bi wan ve bixuyê, Xweda ji bo wan dê yek di bexçeyek ji bexçeyê bihiştê de were xuyan."²⁷

Her çiqas bi ayeta "*Birevine bihiştê ku firehiya wê bi qasî asîman û erdê ye ku Rebê we, ew ji bo kesên xwedî teqwa amade kirîye.*"²⁸ Wê nîmetên bihiştê ji bo 'evdên mitteqî sabît be. Li gor hin nêzîkbûnan jî dê roja qiyametê jin wekî mêran Xwedê nebînîn. Li bihiştê her rojê îne dê ehlê bihiştê cemala Cenabê Heq bibînîn û yê her kes bigihîje zewqa muşehedeya cemala Cenabê Heq, lêbelê jin dê ji vî mafî bêpar bimînîn. Li ser vê mijarê Enes bin Malik (r.x.l.) ji Hz. Pêxember (s.x.l.) wiha riwayet dike: "Cibrîl di destê xwe de bi eynikekê sipî ve hat ku li ser niqutek reş hebû. Min pirsî ev çi ye?" Bersivand: "Ev roja îne ye Rebbê te vê pêşkêşî te û ummeta te dike ku ev roj ji bo we bibe 'eyd' dema ku pirsîn "di wê de çi heye? Dibêje; "di wê de ji bo we xêr heye." Ev di qada ferîşteyan de roja herî baş e. Em vê rojê li qiyametê wek roja yewmu'l-mezîd bi nav dikin." Bersivand "Rebbê we (c.c.) li bihiştê ji miska sipî geliyek dest dixê ku bû roja îne jî Xweda te'ala înzalê textê xwe dike. Pişt re dora text ji mînderên nûrê dorpêç dibe û Nebî li ser wan cih digirin. Wan mînberan jî textên zêrîn dorpêç dikin û li wir jî sidîq û şehîd rûdinên. Pişt re ehlê bihiştê tîn û li ser komên xwelî rûdinên pişt re her roja îne Rebê wan tecellî dike."²⁹

Ji bo kesên ku herine Bihîştê Neîm, tiştê herî xweş temaşekirina li ser palkursiyên e.³⁰ Nî'meta herî mezîniye li bihiştê rûniştina ser doşekên nûranî û dîtina Rebbê alemê ye. Ê ku li ser wan doşekan rûdinên ew ji payeya yekem in, ew nebî, sidîq, şehîd 'ewam-xewas û tevahiya Misilmanan in. Çawa ku di hedîsê de hatiye, ev bûyer, bûyereke e ku jin dê di nav wê qeffleyê de nebin. Li gor ekser ehlê sunnetê jin jî wekî mêran dê cemala Xweda temaşe bikin. Lê Îmam Suyûtî li dijî nêrîna gelemperî dibêje ku ev behsa giştî ye, li ser dîtîna jî bo jinan derbasdar nîn e.³¹

Îmam Suyûtî li ser mijara roja ru'yetê ya ku tê gotin "Jin dê Xweda Muşehede Nekin" de delîlek ji riwayeta Huzeyfe (r.) jî jê digre û parve dike. Hz. Pêxember (s.x.l.) wiha ferman kiriye: "Her kes piştî ku bicîh bûn Xweda ferman dike: "Evdên ku bêyî dîtina min îtaatê min kirine, baweriyê bi

23 Rabia Zahide Temiz, "Suyûtî'nin 'İsbalu'l Kisa ale'n-Nisa' Adlı Eseri ve Mumin Kadınların Ahirette Allah'ı Görmeleri (Ru'yetullah) Meselesi", *İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi* 34, (2016): 178.

24 Ebu'l-Fadl Celaluddîn Abdurrahman b. Ebî Bekr b. Muhammed el-Xudayrî es-Suyûtî eş-Şafîî, *İsbalu'l-kîsa' 'ale'n-nisa'*, (Beyrût: Daru'l Kutubi'l-İlmiyye, 1985), 9.

25 Temiz, "Suyûtî'nin 'İsbalu'l Kisa ale'n-Nisa' Adlı Eseri", 181.

26 Suyûtî, *İsbalu'l-kîsa'*, 18

27 Tirmizî, "Cennet", 15.

28 Alî İmran, 2/133.

29 Ebu'l-Qasim Suleyman et-Teberanî, *el-Mu'cemu'l-ewsat*, thq. Mehmûd et-Tahhan, (Riyad: Mektebetu'l-Me'arif, 1987), 3: 55; Suyûtî, *İsbalu'l-kîsa'*, 18.

30 Mutafîfîn, 83 / 22-25.

31 Suyûtî, *İsbalu'l-kîsa'*, 18.

Resulên (s.x.l) min anîne li ku ne? Îro Yewmu'l-Mezîd e/Roja Zêdexwestinê ye, ji min bixwazin!" Her kes bi hev re dibêjin "wechê xwe nîşanî me bide; em li wî binêrin" li ser vê Xweda ji ber çavên wan hicabê radike û li wan tecellî dike. Nûra wî her derî rapêç dike. Pişt re tê gotin ku; "Bizivirine malên xwe." Ew jî dizivirin. Ev rewş ji hevserên wan (أزواجهم) hatiye veşartin. Dema ku ji mêrên xwe pirsîn "dema hûn çûn bi sûretekî, hûn hatin bi sûretekî din hatin" Ew jî dibersivînin: "Rebbê me tecellayê me kir. Me tiştê ku bi we naxuyê temaşe kir" Herwiha heft rojan bi nîmetên bihiştê di kêfê û rehetiyê de dijîn.³² Li gor Îmam Suyûtî peyva ku (أزواجهم) di hedîsê de derbas dibe, di wê de ru'yet bêyî jinan hatiye bikaranîn.

Îmam Suyûtî dibêje: "Hedîsên di derheqê bihiştê de piranî bi banga nêrzayî hatiye kirin. Suyûtî piştî her hedîsa ku şîrove kiriye nîşeya 'ru'yet tenê ji bo mêran e' lê zêde kiriye. Li gor Suyûtî nêrsên ku sîxeya mêran tê de derbas dibe, jinan eleqedar nake û hewce nîne ku bête vegotin. Lewra Xweda Te'ala rewşeke ku tê de jin hebin jixwe bi sîxeya wan îfade dike. Wek mînak, di Qur'anê de bangên hevpar wek "Jin û mêrên mu'mîn, kî ji we 'emelên salih bike..." yan jî "Teqez jin û mêrên misilman" cih digrin. Di vê wateyê de, di Qur'anê de ayeta "Kesên ku karên baş dikin re encamên baştir û jê zêdetir hene."³³ Di sîxeya/kêşana muzeker/nêrza de ye. Ango zayenda wê peyvê de nêrîtî heye. Herwiha di hedîsan de jî ev nîşan tên dîtin. Riwayeteke ku ji Ebdulah bin Umer (r.) ji Hz. Pêxember (s.x.l) hatî rîwayet kirin de wiha derbas dibe: "Ji halê yê ehlê bihiştê ku payeya wan herî kême be jî ew ê baxçeyên xwe, jinên xwe, nîmetên zêde, li ser doşekan û xizmetkarên xwe ji dûrahiya hezar salî ve bibînin. Ji ehlê bihiştê jî kesên ku zêdetir îkrama Xweda digihêjinê ew kesên ku sibê û êvarên rojê li wechê Xwedê dinêrin in û pişt re ayeta: "Ew roj rû geş dibin û li Xweda dinêrin."³⁴ Wî ev hedîs xwend.³⁵ Wek di vê hedîsê de jî derbas dibe dîtin xasî mêran e ku ji zayenda bêjeyê kifşe dibe.³⁶

Li gor Îmam Suyûtî rewş wiha ye: "Bêşik ehlê bihiştê ew roja bi nîmetên bihiştê ve mijûl in, di nav zewqê de ne, ew û hevjinên wan li ser palkursiyên di bin sihan de pal dane. Ji bo wan li wir fêkî hene. Ji bo wan li wir çî bixwazin heye. Ji Rebbê Rehîm peyman "selamê" heye."³⁷ Di vê ayetê de peyva "selamê" di nav nîmetên bihiştê de wekî tecelleya Îlahî ye. Lewra di ayetê de behsa wan û hevjinên wan dike û pişt re dîsa behsa wan dike û ehlê selamê bi xîtaba "wan" hatiye xelat kirin. Nexwe muxatebê peyva "selam" ji bo "wan" ango ji bo mêran hatiye bi kar anîn. Herwiha jin daxilê "selamiyê" bibin jî ew nayê wateya ku ru'yet selama jinan e. Di vê rewşê de, ev ayet û ayetên din derheqê ru'yetê de, ji bo îsbatkirina ru'yeta jinan delîl nayê hesabandin.³⁸

Di riwayeteke Ebdulah bin Mesut (r.) de jî di derheqê mezhernebûna jinan ya ru'yetê li bihiştê de wiha derbas dibe; "Ji bo çûyîna nimêja îne lez bikin. Xweda ji bo ehlê bihiştê rojên îne li ser girekî sipî yê ji kafûrê xuya dike. Mirov jî li gor pêşgiringiya xwe ya nimêja îne nêzîkî Xweda dibin. Xweda ji bo wan ji nîmetên nedîtî îkraman îhdas dike." Ji xeynî vê riwayetê Ebu Hureyre (r.) jî neqleke merf'û, di vê mijarê de, ji Pêxemberê me wiha rîwayet kiriye: "Ehlê bihiştê her roja îne diçin serdana Rebbê xwe. Di vê meclîsê de kesek tune ku Xweda bi wan re rû bi rû neaxivê. Xweda "Ey filankes kurê filankesê! Roja ku te wiha wiha kiribû tê bîra te?" dibêje. Pişt re ji wir di-

32 Bezzar riwayet dike ku ev hedîs bi yek îsnadê ye û kes vê nizane, hedîsek ecêb e. Bnr. Ebu'l Hesên el-Heysemî, *Mecmau'z-zewaid ve menbau'l-fewaid*, (Kahire: Mektebetu'l- Qudsî, 2015), 10: 422; Suyûtî, *Îsbalu'l-Kîsa'*, 19.

33 Temiz, "Suyûtî'nin 'Îsbalu'l Kîsa ale'n-Nisa' Adli Eseri", 196.

34 Qiyame, 75/ 22-23.

35 Tirmizî, "Cennet", 17.

36 Suyûtî, *Îsbalu'l-kîsa'*, s. 25.

37 Yasîn, 36/ 55-58.

38 Suyûtî, *Îsbalu'l-kîsa'*, 27.

zivirin mala xwe. Hevjînên wan pêşwazî li wan dikin: “Silav tu bixêr hatî, teqez xweşikiyek cuda li ser te heye ku dema tu ji cem min çûyî ev tunebû”³⁹ dibêjin. Ew jî bersivê didin: “Em îro bi Rebbê xwe re rûniştin.”⁴⁰

Îmam Suyûtî wiha dibêje: “Di hedîsan de li ser mijara dîtina Xweda ji aliyê jinan ve tu delîl tunene”. Herwiha li gor Îmam, ji ber ku berpîrsiyariya nimêja îne li ser jinan ferz nîne ru'yet jî ji bo wan derveyî îmkanê de ye. Cîhad, qadîbûn, nimêja cemaetê, nimêja îne, berpîrsiyariya bangê, berpîrsiyariya xwendina xutbeyê, kirina nimêja cenazeyê û hilgirtina cenaze, ketina îtikafê, tewaf, remel, li saya bi herweleyê/lezçûyinê de û xemilandin û herambûna êrmûşî, ev rewş û berpîrsiyarî tenê xasî mêran in. Ji ber vê di mijara ru'yetê de jî imtiyaza mêran divê ecêb neyê dîtin.⁴¹

Divê em vê jî bînin ziman ku Îmam Suyûtî nabêje tevahiya jinên ehlê bihiştê dê ji ru'yetê bêpar bimînin. Lewra serenavek tenê li ser mijara ru'yeta jinan nivîsiye ku di bin vê sernavê de bi lîv kiriye ku; *Dê Ew Roj Wekî 'Eydên Dinyayê be*. Riwayeta ku ji Bekr bin Ebdulah el-Muzenî (r.) hatiye kirin de derbas dibe ku “Jinên ehlê bihiştê, yê di rojên 'eydan de bikarin herin û Xwedê Te'ala bibînin.”⁴²

Derheqê Ru'yetê de Nêrinên Îbn Teymiye

Rewşa bihiştê, avakirina wê, jiyana di bihiştê de û di derheqê nîmetên wê, teswîra wê ya giştî de Îbn Teymiye wiha dibêje: Di bihiştê de ru'yeta Xwedê Te'ala nîmetek e ku Xwedê dê bike nesîbê her kesî û ev nîmet ji bo jin û mêran naguhere.⁴³

Di navbera sofiyan de li hev kirinek heye ku dibêjin li bihiştê dîtina Xweda hem ji bo jinan hem ji bo mêran wekhev e. Lewra dema çavkaniyên şer'a Îslamê bê nihêrîn mizgîniya her 'evdî piranî li ser heman nîmetên bihiştê hatine dayîn. Herwiha riwayeta Îbn 'Ebas (r.) jî piştgirî dide vê angaş-tê: “Ru'yeta di bihiştê de tiştê mutad û gelemperî ye. Li gor ta'etan, nimêjan mutad û gelemperî ye. Mêr di jîyana dinyayê de çawa Xweda zikir kiribin, bangî wî kiribin, bi dilê xwe çawa dîtina wî hesibandibin, nêzikahiya wî çawa nimêja îne de zêdetir bibe, li axretê jî ji bo bangkirina wî, hev dîtina wî hev gihêştina wî divê demeke weha hebe. Ji bilî vê jinên ku sunnetê tînin cih, keçên xama û jinên ku di kincan/heyz de bin jî tê de tevahiya misilmanan, li bihiştê ew ê Xwedê bibînin. Herwiha di serdema Resûlulah (s.x.l) de tevahiya jinên mu'mîn, ji ber ku diçûne nimêja 'eydê, yê di mijara ru'yetê de jî pîrsgirêk nejîn.”⁴⁴

Îbn Teymiye, di derbareyê hedîsa ku qala ferqa di navbera jin û mêran ya di derbarê ru'yetê dike, wiha dibêje û ji bo vê jî hedîsa “Heyva çardeh şevî” wekî mînak bilêv dike. Li gor wî: “Çawa heyva çardehşevî bê dîtin teqez hûnê jî Rebbê xwe bibînin. Li ser dîtina wê pîrsgirêkek, eziyetek hûnê nejîn. Ger beriya hilatin û avabûna rojê ji nêmêjê bêparnebûn di destê we de be nimêjên xwe der nedin.”⁴⁵ piştî vê hedîsê ayeta: “Beriya ku roj hilwere û biçê ava Rebbê xwe tesbîh bike û hemdê wî bike.”⁴⁶ ji Resulê Xweda (s.x.l) dixwîne, li ser vê digihîje vê encamê ku kesên nimêjên sibê û esrê bikin wek diyarî mizgîniya ru'yetê jî dide wan. Herwiha nimêj çawa ta'etekî 'umumî

39 Suyûtî, *Îsbalu'l-kîsa*, 20.

40 Tirmizî, *Tefsîr*, 53.

41 Suyûtî, *Îsbalu'l-kîsa*, 34.

42 Suyûtî, *Îsbalu'l-kîsa*, 49.

43 Ebu'l-'Ebas Taqîyyuddîn Ehmed b. Ebdilhelîm b. Mecdiddîn Ebdisselam el-Herranî Îbnu Teymiye, *Mecmûu'l-Fetawa*, (Riyad: 2004), 4: 420.

44 Îbnu Teymiye, *Mecmûu'l-Fetawa*, 10: 420-421.

45 Buxarî, “Mevaqtû's-Salat”, 17; Muslîm, “Mesacîd”, 211.

46 Taha, 10/ 130.

be, ru'yet jî ji bo jin û mêran wekî hev e û dê jin û mên herdu jî li gor 'emelên xwe Xwedê Te'ala bibînin.⁴⁷

Berawirkirina Nêrînên Îbn Teymiye û Îmam Suyûtî

Îmam Suyûtî ji ferziyeta nimêja îne wekî delîlekî bi kar tîne û dibêje, heke nimêja îne li ser mêran ferz be ru'yet jî tenê xasî mêran e û eynî wekî nimêja îne ru'yet jî ji bo jinan pêkan nîne. Lêbelê Îbn Teymiye, cudahiyek di navbera nimêja îne û sibê an jî esrê de nabîne. Ji ber wê, li gor wî tişt girîng ne yek bi yek nimêj in. Ya girîng di nav wextan de demên qudsî saetên bifezilet in. Ev îbadetên hatî kirin bi tiştên bifezîlettir dawî dibe.⁴⁸ Şertê gihîştina vê ecrê jinbûn an jî mêrbûn nîne. Herwiha ji bo vê 'erebbûn, 'ecembûn, reşbûn, spîbûn jî wek delîlek cudahî û ciyawaziyê nayê dîtîn.⁴⁹

Îbn Teymiye li dijî fikra; "Di ayet û hedîsan de wateya mijara ru'yetê girêdayê lefiz û zayenda bêjeyê nêr/muzeker e" derdikeve. Ew wiha dibêje: Delîlên nessî, wateyî û lefzî hevpar in. Ji ber vê jî çawa ku ev gotin ji bo mêran hatiye bikar anîn, eynî wisa ev mijar ji bo jinan jî derbasdar e.⁵⁰ Ev mijar, di Qur'ana Pîroz de wiha derbas dibe: "*Bêşik kesên baş li bihiştê Neîm de ne, li ser palkur-siyar rûdinên û temaşe dikin.*"⁵¹ Wekî ku tê dîtîn ru'yet hem ji bo jinan hem jî ji bo mêran hatiye bikaranîn. Lewra daxuyana "*kesên baş*" hem ji bo mêran hem ji bo jinan hatiye gotin. Wekî din, li gor bikaranîna zimanê Erebî, gava bêjeyek ji bo pirjimar hate bikar anîn, hingê wekî zayenda nêr tê û lê di wateya xwe de hem mêran hem jî jinan di bin wê wateyê de dihevine.⁵²

Îbn Teymiye, li ser hedîsa ku me berê ewil jî behsê kiribû "*Heyva çardeşevî*" dûr û dirêj dise-kine. Wekî tê zanîn ew hedîs, di Buxarî û Muslîm de jî derbas dibe. Îbn Teymiye dibêje ku daxuyaniyeke nessî ya gelemperî li vir heye û dike ku li ser vê hedîsê ve hevpariya ru'yetê îsbat bike. Li gor rîwayeta Ebu Hureyre (r.) ya ku ji Pêxember (s.x.l) hatiye rîwayet kirin dipirse: "Ey Resulê Xweda (s.x.l) Roja qiyametê em ê Xweda bibînin? Resulê Xweda, Bersiva vê pirsê wiha dide: "Dema heyva çardeşevî derket û tiştek ku rûyê heyvê bigire tune be, ji bo dîtina wê zehmetiyek derdikeve holê an na?" Kesên li wir wiha dibêjin: "Na ey Resulê Xweda". Li ser vê bersivê dîsa dipirse: "Dema ku li pêşiyê 'ewr nebin dîtina rojê de pirsgirêk derdikeve holê an na?" Dîsa gotina xwe dubare dikin dibêjin; "na". Vêca Resulê Xweda (s.x.l) wiha berdeyam dike: "Hûnê jî dê Rebbê xwe wisa bibînin". Roja qiyametê dê însan kom bibin û yê wiha bejin: "Her kî li dinyayê ta'etên xwe li gor çî kiribe bila tabî'ê wî tiştî be. Ji wan hin kes jî didin pey taxutan. Di paş de bi tevahiya minafiqan tenê ev ummet dimîne. Ji xeynî sureteke ku ew binasin. Xweda bi sûreteki cuda ber bi wan ve tê. Ev ummet yê bêje; "Ji ber te em xwe dispêrin Xweda. Heta ku Rebbê me yê 'Ezîz û Celîl neyê em li cihên xwe naliqin. Dema ku Rebbê me hat em ê wî nas bikin. Dema Xweda Te'ala hat li cem wan yê bêje; "Ez Rebbê we me", ew jî wê bejin; "Erê tu Rebbê me yî."⁵³ Lefza "wek" ku di hedîsê de derbas dibe ji bo herdu aliyan e jî. Lewra hebûn û rastiya axretê ji bo her kesî derbasdar e. Di vê rewşê de mijara ru'yetê jî ji bo her kesî derbasdar dibe.⁵⁴

Bihîşt ji bo hewldan û xebatên baş ên dinyayê, li axretê diyariyekê bêdawî ye ku ji bo 'evdên

47 Îbn Teymiye, *Mecmû'u'l-Fetawa*, 10: 421-422.

48 Îbn Teymiye, *Mecmû'u'l-Fetawa*, 10: 424.

49 Îbn Teymiye, *Mecmû'u'l-Fetawa*, 10: 427.

50 Îbn Teymiye, *Mecmû'u'l-Fetawa*, 10: 429.

51 Muteffifîn, 83/22-23.

52 Îmaduddîn Ebu'l-Fîda Ibnu Kesîr, *en-Nihaye fî'l-fiteni we'l-melahim*, thq. Muhemmed Ahmed Abdulazîz, (Beyrût: Daru'l-Cil, 1988), 2: 352.

53 Buxarî, "Tevhîd", 24; Muslîm, "Îman", 299.

54 Îbn Teymiye, *Mecmû'u'l-Fetawa*, 10: 432.

mu'mîn hatîye we'd kirin. Tê dîtîn ku Xwedê Te'ala nîmetên ku yê bide ehlê bihiştê li gor zayendê ji hevdu venaqetîne. Li ser teqwaya/payebilindiya hin kesên li bihiştê jî di hedîsan de ne li gor zayendê ye. Ew wekheviya berpirsiyariyan çawa hevpar be diyariyên wan jî siruştî ye ku hevpar be. Ev fikir bi fikra ulemayan re jî paralel e ku li ser mijara mukafatê de li hev kirine.

Di Qur'anê de dema behsa mukafatan tê kirin di navbera zayendan de cudahiyeke nehatiye gotin. Herwiha ev ji bo gihîştina vê encamê xwedî bandor e.

Di Qur'anê de eşkere ye ku zewqa herî xweş ji bo ehlê bihiştê, dîtina cemala Xweda ye ku ev jî di nissan de bi gelemperî hatiye vegotin. Cudahiyeke wek jin û mêr nehatiye gotin û di xîtaban de gotina peyva "însan" (îns) tê bikaranîn. Mafê ru'yetê jî li ser şexsiyetê tê nixandî ne li ser mijara zayendê ye ku ew ne di destê me de ye. Lêbelê tê fêmkirin ku beriya Îmam Suyûtî, Îbn Teymiye jî di dema xwe de li ser mijara mezherbûna ru'yetê ya jinan niqaş û pêşniyazî kirine. Herwiha tê fêmkirin ku her çiqas li gor ayetan, xîtabên gelemperî hebin jî li gor taybetiya rêzimana 'Erebî ku di wir de jî mijara cînavkên zayendî hene ev mijar hatiye nîqaş kirin. Ev vegotin li dijî helwestên sunneta Pêxemberê me (s.x.l) ye. Lewra ew, jinan wek "nîmetên bikêr" dibîne û ferman dike ku ji bin pêyan bîn rakirin û bibin taca ser seriyên. Herwiha tê dîtîn ku Îmam Suyûtî li ser serboriyên serdemên jinên meşhûr ku ji wan ders girtiye jî dema behsa wan muhadisên jin kiriye bi rêz û hurmet behs kiriye.⁵⁵

ENCAM

Yek ji mijarên di Qur'an û hedîsan de derbas dibe dîtina Xweda ya di axretê ango ru'yet e ku di vî warî de gelek niqaş hatine kirin. Ehlê Sunet qebûl dike ku dê roja axretê hesreta zanîn û dîtina Xweda bi dawî were û dîsa qebûl dike ku ru'yeta Xweda hem li gor nêzîkbûna eqîl hem jî li gor şîroveyên neqlî caîz û mumkîn e.

Qur'ana Pîroz di nav malbata mirovahiyê de, di nav jin û mêran de hem ji aliyê mafan hem jî ji aliyê berpirsiyariyan ve edalet di navbera wan de ava kiriye. Di tekamula medeniyeta Îslamê de ji bo jin û mêran tevlêbûneke hevpar heye. Payebilindî jî li gor nissan Quranê bi teqwayê ye û bi tîrsa ji Xweda ye. Ev yek di her merheleyan de hatiye kifş kirin.

Piştî dawîbûna jiyana dinyayê, kesên ku bigihîjine kêfxweşiya domdar (se'adeta ebedî) ya bihiştê, yê rehmet, lutf û îhsana Xweda bi tevahiya heşmeta teceliya Wî bibîne. Di nissan de derbas dibe ku bihişt cihê nîmetên zêdetir e û hem ji bo mêran hem jî ji bo jinan eynî ye. Lêbelê di wan nîmetan de nîşaneyeka payebilindiyê nayê xuyanê.

Di 'erdnîgariya Îslamê de têgihîna jinê, bandor li ser têgihîna 'alimên wê demê jî kiriye ku gotine dê jin di bihiştê çawa Xweda bibînin! Ji ber vê yekê, rê li ber xeletfêmkirina nissan jî vekirine. Ev têgih xwe di berhemên Îbn Teymiye û Îmam Suyûtî de jî nîşan daye. Herwiha em dikarin bêjin sedema vê şîroveyê her çiqas şîroveyên nissan jî be, têgihîştin û şîroveya xelet de para mezin ya nixandina jinan ya zemanê berê ye. Lewra di wan demên berê de jin qasekî bêqîmet dihatin zanîn û ji ber vê jî dîtina jinê ya Xweda wekî kêmasiyekî didîtin.

Di naveroka Qur'anê de bi awayekî gelemperî qala serdestiya 'edaletê tê kirin. Herwiha jin û mêrên ku bihişt heq kirine yê bigihîjine asta temaşekirina cemala Xweda, ev yek jî divê di nav encama vê 'edaletê de be.

55 Ebu'l-Fadl Celaluddîn 'Ebdurrehman b. Ebî Bekr b. Muhemmed el-Xudeyrî es-Suyûtî eş-Şafîî, *el-Muncem fi'l Mu'cem: Mu'cemu Şuyuxî's-Suyûtî*, thq. İbrahîm Bacis Abdulmecîd, (Beyrût: Daru İbnu Hazm, 1995), 101-241.

ÇAVKANÎ

Bexdâdî, 'Ebdulqahir, *Kitâbu Usûlû'd-dîn*, wer. Ömer Aydın, İstanbul: İşaret Yayınları, 2016.

Cevzî, İmam Ebu'l-Ferec Cemaluddin Ebdurrehman Ali b. Muhammed, *Zadu'l-mesîr fî ilmi't-tefsîr*, wer. Abdulvehhab Öztürk, İstanbul: Kahraman Yayınları, 2015.

Firuzâbadî, Muhammed, *Tenviru'l-Meqabîs min tefsîr-i İbn Ebbas*, İstanbul: İlkharf Yayınevi, 2016.

Kezalî, Ebû Hamid Muhammed b. Muhammed b. Muhammed b. Ahmed, *el-İqtisâd fî'l-i'tiqâd*, wer. Kemal Işık, Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, 197.

_____, *İhyâu 'Ulûmid'-Dîn*, wer. Ahmed Serdaroğlu, İstanbul: Bedir Yayınevi, 1975.

Harpûtî, Ebdullatîf, *Tenqîhu'l-kelâm fî 'Eqâidi ehli'l-İslâm*, wer. Fikret Karaman, İstanbul: Çelik Yayınevi, 2016.

Hemedânî, Qadî Ebdulcebbar b. Ehmed el-, *el-Muxnî fî ebwâbi't- tevhîdi ve'l-adl (Ru'yetu'l-Bâri)*, thq. M. Mustafa Hilmi-Ebu'l Vefa Xanîmî, yy: Dâru'l-Misriyye li't-Te'lif ve't-Terceme, bt.

Heysemî, Ebû'l Hesan *el-Mecmau'z-Zewâid ve Menbau'l-Fevâid*, Kâhire: Mektebetu'l-Qudsî, 2015.

İbn Kesîr, İmâduddîn Ebu'l-Fîdâ, *Tefsiru'l-Kur'ân'il-'Ezîm*, wer. Abdulvehhab Öztürk, İstanbul: Kahraman Yayınları, 2014.

_____, *en-Nihâye fî'l-fiteni we'l-melâhim*, thq. Muhemmed Ehmed Abdulazîz, Beyrût: Dâru'l-Cîl, 1988.

İbn Teymiye, Ebu'l-Ebbâs Taqiyyüddîn Ahmed b. Ebdilhelîm b. Mecciddîn Ebdisselâm Herrânî, *Mecmûu'l-Fetawa*, Riyad: 2004.

Mâturîdî, Ebû Mensûr *Kitâbu't-Tewhîd*, wer. Bekir Topaloğlu ve diğêrleri, İstanbul: İsam Yayınları, 2003.

Mewdûdî, Ebu'l-Ala, *Tefhîmu'l-Qur'ân*, werger lijne, bt.

Muslîm, İbn'l-Heccâc, *Sahîhu Muslîm*, Beyrût: Dâru Taybe, 2008.

Nesefî, Ebû Hefs Necmuddîn 'Umer b. Muhemmed en-, *Eqâidu'n-Nesefî*, İstanbul: Bayrak Yayıncılık, 2016.

Nesefî, Ebu'l-Muîn Meymûn b. Muhemmed b. Muhemmed b. Mu'temid, *Tabîratu'l-Edîlle*, thq. Huseyin Atay, Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, 1993.

Râzî, Fexreddîn, *el-Muhassal*, wer. Huseyin Atay, Ankara: Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, bt.

Sâbûnî, Ebû Muhemmed Nûreddîn Ehmed b. Mehmûd b. Ebî Bekr, *el-Bidaye fî Usulî'd-dîn*, wer. Bekir Topaloğlu, Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, 1979.

Suyûtî, Ebu'l-Fadl Celâluddîn Abdurrahmân b. Ebî Bekr b. Muhammed el-Xudayrî, *İsbâlu'l-kîsâ' 'ele'n-nîsâ'*, Beyrût: Dâru'l Kutubi'l-İlmiyye, 1985.

_____, *Tefsîru'l Celâleyn*, wer. Ali Rıza Kaşeli, İstanbul: Sağlam Yayınları, 2016.

_____, *el-Muncem fî'l Mu'cem: Mu'cemu Şuyuxî's-Suyûtî*, thq.: İbrahîm Bacis Abdulmecîd,

Beyrût: Dâru İbn Hazm, 1995.

Şoşikî, Mela Muhemmed, *Nûra Qelban: Tefsîra Qur'anê*, Stenbol: Weşanê Nûbiharê 2011.

Teberânî, Ebû'l-Qâsim Suleyman, *el-Mu'cemu'l-Ewsat*, thq. Mahmûd et-Tahhân, Riyad: Mektebetu'l-Maârif, 1987.

Teftezânî, Sa'duddîn Mes'ûd b. Faxruddîn 'Umer b. Burhâniddîn 'Ebdillâh el-Herewî, Şerhu'l-'Eqâ'id, wer. Suleyman Ateş, İstanbul: Dergâh Yayınları, 2016.

Temiz, Rabia Zahide, "Suyûtî'nin 'İsbâlu'l-kisâ ale'n-nisâ' Adlı Eseri ve Mumin Kadınların Ahirette Allah'ı Görmeleri (Ru'yetullah) Meselesi", *İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi* 34, (2016), 173-220

Tirmîzî, Ebû İsa Muhemmed et-, *Sunenu Tirmîzî*, thq. Beşşar 'Ewwad, Beyrût: Dâru Xureba el-İslâmiyye, 1996.

Zebîdî, Ebu'l-Ebbâs Zeynuddîn (Şihâbuddîn) Ahmed b. Ahmed b. 'Ebdillatîf eş-Şercî ez-, *et-Tecridu's-sarîh li-ehâdîssi'l-Câmi'i's-sahîh*, nşr. Tariq Ebdullah b. Muhemmed b. Muaz, Bexdat: Dâru İbni'l-Cevzî, 2012.



Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatînê/Makale Geliş Tarihi/Received:
27.01.2021
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/
26.02.2021
Abdulbari Aziz Othman. e-mail: aziz-
man2015@hotmail.com, Orcid: 0000-0003-
1372-2961

Atîf/ Citation: Othman, A. A. (2021). "el-Kurd
we'l-Mezhebu'ş-Şafi î", Kurdiyât, 3, 157-171.

الكرد والمذهب الشافعي

Abdulbari Aziz Othman

عبدالباري عزيز عثمان

المخلص

أرسل الله تعالى دين الإسلام للبشرية جمعاء، فدخل الناس في هذا الدين أفواجاً من شتى البقاع والألوان، والقوميات. وكان الكرد ممن دخلوا في هذا الدين الجديد، وأصبحوا من أشد المدافعين عنه، والمحاربين في سبيله، والمتمسكين بمبادئه وقيمه. وقد شهد المسلمون في عهدهم الأولى لا سيما في القرن الثاني للهجرة بروز مدارس فقهية متعددة في الفروع الفقهية، ليصل الأمر بهم بعد فترة من الزمن إلى تحول هذه المدارس والاتجاهات الفقهية إلى مذاهب فقهية مستقلة. وتمثلت هذه المدارس الفقهية في المذاهب الفقهية الرئيسية السنية الأربعة بين المسلمين وهي: الحنفية، والمالكية، والشافعية، والحنبلية.

ومن هذه المذاهب الفقهية المذهب الشافعي، الذي ينسب إلى الإمام محمد بن إدريس الشافعي، الذي جمع بين مدرستي الحديث والرأي. حيث كان هذا المذهب من أكثر المذاهب التي انتشرت في بلاد الكرد حتى غدا اسم الكرد مقترنا وموسوماً بالمذهب الشافعي في المصادر والأبحاث التاريخية، وصار المذهب الشافعي سمة مميزة للشعب الكردي، فإذا ذكر اسم الكرد ذكر معه المذهب الشافعي. وقد برز لعلماء الكرد دور كبير ومهم في خدمة ونشر المذهب الشافعي، سواء في بلاد الكرد أو في خارجها. وهذا البحث يستعرض الأسباب التي جعلت من المذهب الشافعي غالباً ومنتشراً بين الشعب الكردي دون غيره من المذاهب الفقهية السنية الأخرى. وما هو الدور الذي قام به الكرد في نشر وتثبيت وتمحيص المذهب، وما هي الدوافع والبواعث وراء تمذهب الكرد بمذهب الإمام الشافعي رضي عنه دون غيره من المذاهب الأخرى.

الكلمات المفتاحية: الإسلام، الكرد، المذهب الشافعي، علماء الكرد، انتشار المذهب.

KURD Û MEZHEBÊ ŞAFI'Î

Kurte

Xwedê Teala dînê Îslamê ji bo hemî însanên li ser rûyê erdê şandiye. Ji ber vê

yekê ji welat, reng û gelên cur bi cur mirov ref bi ref ketine vî dînî. Yek ji wan miletên ku ketine vî dînê nû, Kurd in. Kurdan bi esasên vî dînî saxlem girtin û ji bo parastina wî cehd û xebat kirine. Di demên pêşî de bi taybetî jî di serdema sedsala duyem ya piştî koçê di fiqha Îslamî de gelek medrese derketin pêşberî Misilmanan. Piştî borîna demekê ew medrese û nêrînên fiqhî bûne mezhebên serbixwe. Ew medreseyên fiqhî yên sereke di nav Misilmanên Sunnî de wekî mezhebê Heneffî, Malikî, Şafi'î û Henbelî cih girtine. Ji wan mezhebên fiqhî yek jê jî mezhebê Şafi'î ye. Ew mezheb bi bal Muhemmedê kurê Idrîs ve tê nisbetkirin. Wî, ekola hedîs û re'yê cem' kiriyê. Mezhebê herî belavbûyî di welatê Kurdan de ev mezheb e. Ji ber ku ev mezheb bûbû wekî taybetmendiyek Kurdan, di çavkanî û lêkolînên dîrokî de navê Kurdan her bi vî mezhebî re dihat gotin. Ango dema navê Kurdan derbas dibû pê re mezhebê Şafi'î jî dihat gotin. Li aliyê din alimên Kurdan di hizmet û belavkirina vî mezhebî de -çi li welatê Kurdan çi jî li derveyê welatê wan- roleke mezin girtine ser xwe. Di vê lêkolînê de dê sedemên ka çima ji mezhebên fiqhî yên Sunnî bi tenê mezhebê Şafi'î di nav Kurdan de pirtir belav bûye, rola Kurdan di belavbûna vî mezhebî çi ye, her wiha çima Kurd ji bilî mezhebên din ketine vî mezhebî, were pêşpêşkirin.

Peyvên Sereke: Îslam, Kurd, Mezhebê Şafi'î, Alimên Kurd, Belavbûna Mezheban.

The Kurds and the Shafii Sect

Almighty Allah has sent the religion of Islam to all humanity. Subsequently, people of different ethnicities, colors, and regions turned to this new religion en masse and adopted it as their belief. The Kurds have taken their place among the societies that adhere to this new religion, defend it, fight for it, and hold tightly to its principles and values. It is known that different schools of Fiqh (Islamic Law) with various views emerged in the early ages of Islam, especially in the second century of the Islamic calendar. Over time, these schools evolved into independent sects. These denominations are divided into four main schools of jurisprudence, namely, Hanafi, Maliki, Shafii, and Hanbali. One of these jurisprudence sects is the Shafii sect, which represents the views of the Ahl al-Ray vs. Ahl al-Hadith schools together and Muhammad b. Idris is the imam.

The Shafii sect has become widespread in the regions where Kurds are densely populated, and due to this prevalence, the name Kurdish is constantly referred to with this sect in classical historical sources. The Shafii sect has also turned into a characteristic symbol for the Kurdish people. Whether in the home of the Kurds or outside of the Kurdish regions, Kurdish scholars have served greatly in the spread of the Shafii sect.

In this study, it is discussed in all aspects why only the Shafii sect has spread among the Sunni sects in the Kurdish regions, what is the role of the Kurdish scholars in the spread of this sect, and what are the underlying factors behind the Kurds' adoption of the Shafii sect.

Key words: Islam, Kurds, Shafii Sect, Kurdish Scholars, Spread of the Sect.

تمهيد

إن الله تعالى قد أرسل رسوله محمدا صلى الله عليه وسلم بدين الإسلام للبشرية جمعاء ، ليكون بذلك دينا لكل شعوب الأرض على اختلاف قومياتهم ، وألوانهم ، وأجناسهم . والكرد من تلك القوميات التي دخلت في دين الإسلام ، وذلك سنة ٨١ هـ ، على يد الصحابي الجليل عياض بن غنم (ت ٥٠٢هـ) ، في عهد الخليفة الراشدي الثاني عمر بن الخطاب (ت ٣٢هـ) رضي الله عنه .

والمعروف عن الكردي المسلم أنه محبٌ لدينه الإسلام ، متمسك بعقيدته ، ومدافع عنها بالغالي والنفيس . لقد شارك الكرد في بناء الحضارة الإسلامية في كافة ميادينها الحضارية والثقافية، والعسكرية ، والعلمية . وكان لهم دور عظيم في بناء الفكر الإسلامي إلى جانب بقية شعوب المنطقة من: عرب ، وترك ، وفرنس وغيرهم . لقد برز من بين ظهراني هذا الشعب العلماء ، والفلاسفة ، والمشايخ، والأطباء ، والقادة العسكريون ، ممن يفتخر بهم تاريخ الإسلام المجيد . والكرد في معظمهم ينتمون إلى مذهب أهل السنة والجماعة ، ويتمذهبون بمذهب الإمام الشافعي رحمه تعالى ، ثالث المذاهب الإسلامية السنية .

انتشر الإسلام خارج الجزيرة العربية ، وانتشر معه الصحابة في أصقاع الأرض حاملين فقههم للإسلام، وفهمهم للدين الجديد ، حيث أسسوا وبنوا مدارس فقهية لهم في الحجاز والشام والعراق ومصر ، وانتقل علمهم إلى التابعين من بعدهم . حتى جاء القرن الرابع الهجري حيث نشأت المدارس الفقهية التي نعرفها وهي : الحنفية ، والشافعية ، والمالكية ، والحنبلية . وانتشر كل مذهب في بقاع معينة من بلاد الإسلام . والمذهب الشافعي واحد من هذه المذاهب ، وهو يُنسب إلى الإمام محمد بن إدريس الشافعي (ت ٢٠٤هـ) ، الذي ولد في غزة بفلسطين . بعدها انتقل إلى مكة ليدرس على الإمام مالك ، ثم سافر إلى اليمن وبعدها إلى العراق ، وأخيرا استقر بمصر .

اتبع الكرد المذهب الشافعي، وقاموا بخدمته ، ونشره داخل ربوعهم وخارجها . وبرز منهم العديد من العلماء الشافعيين ، كالفقيه الشافعي الكردي يوسف بن أحمد الشهير بابن كج . وشيخ الإسلام أبو الحسن علي بن أحمد بن يوسف الهكاري . لقد كان للعلماء الكرد الشافعيين دور فعال في تثبيت مسائل المذهب، وتدقيقها ، وتمحيصها ، وتدريسها على مدار قرون عديدة . حتى أصبح اسم الكرد مقترنا بالمذهب الشافعي في كثير من المصادر والأبحاث . في بحثنا هذا سنتطرق إلى هذه الحقيقة ، ألا وهي علاقة الكرد بالمذهب الشافعي، ودورهم في نشره وتثبيته والإعلاء من شأنه في ربوعهم وخارجها ، كمصر ، والشام، والعراق، والأسباب والدوافع الكامنة خلف انتشار المذهب الشافعي رضي الله تعالى .

